



**NÛBIHAR
AKADEMÎ**

Kovara Akademîk a Xebatên Kurdî ya Navneteweyî
International Peer-reviewed Journal of Kurdish Studies

Cild 2 Jimar 7 Sal 4 - 2017

Volume 2 Issue 7 Year 4 - 2017



Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti.

Büyük Reşitpaşa Cad. Yümnî İş Merkezi No: 22/29

Vezneciler – Fatih / İSTANBUL

Tel & Faks: 0212 519 00 09

www.nubiharakademi.com | email: nubiharakademi@gmail.com

Li Ser Navê Pak Ajansê Xwediyê Kovarê û Bepirsê Karên Nivîsê
On Behalf of Pak Agency the Owner of Journal and Responsible Editor
Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti. adına Sahibi ve Yazışları Müdürü
Süleyman Çevik

EDÎTORÊ JIMARÊ / ISSUE EDITOR

Adak, Abdurrahman / Assoc. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*

ALİKARÊ EDÎTOR / ASSISTANT EDITOR

Aykaç, Yakup / *Mardin Artuklu University, Turkey*

DESTEYA EDÎTORİYÊ / EDITORIAL BOARD

Acar, Hayrullah / Assoc. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*

Adak, Abdurrahman / Assoc. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*

Aydın, Tahirhan / Assoc. Prof., *Indiana University, USA*

Baluken, Yusuf / Dr., *Independent Scholar, Turkey*

Beltekin, Nurettin / Asst. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*

Bor, İbrahim / Assoc. Prof., *Indiana University, USA*

Ergün, Zülküf / Dr., *Mardin Artuklu University, Turkey*

Tek, Ayhan / Asst. Prof., *Mus Alparslan University, Turkey*

Türel, Vehbi / Assoc. Prof., *Bingöl University, Turkey*

DESTEYA ŞÊWRÊ / ADVISORY BOARD

Akın, Salih / Assoc. Prof., *Rouen University, France*

Bozarşan, Hamit / Prof., *École des Hautes Études en Sciences Sociales, France*

Bruinessen, Martin Van / Prof., *National University of Singapore, Singapore*

Jalil, Jalile / Prof., *Instituta Kurdzanîyê, Wien, Austria*

Kreyenbroek, Philip G. / Prof., *Georg-August University, Germany*

Musa, Abdulwahab Khalid / Assoc. Prof., *Zakho University, Kurdistan-Iraq*

Vali, Abbas / Prof., *Boğaziçi University, Turkey*

Yeğen, Mesut / Prof., *İstanbul Şehir University, Turkey*

ÇAP / PRINTED BY

Alioğlu Matbaacılık Bas. Yay. ve Kağ. San. Tic. Ltd. Şti. Orta Mah.

Fatin Rüştü Sk. No: 1-3 / A Bayrampaşa / İstanbul

MİZANPAJ & PAGE DESIGN

Şemal Medya (semalmedya@gmail.com)

Kovara Nûbihar Akademîyê ji aliyê van îndeksan ve tê naskirin:

The Journal of Nûbihar Akademî is accepted by these indexes:



Nûbihar Akademî kovareke bihekem, akademîk û navneteweyî ye. Di demsalên bihar û payîzê de salê du caran tê weşandin. / Nûbihar Akademî is an international peer-reviewed academic journal. It is published biannually in spring and autumn.

Yayın Türü: Yerel Süreli Yayın.

ISSN: 2147-883X

HEKEMÊN VÊ JIMARÊ/REVIWERS OF THIS ISSUE

- Acar**, Hayrullah / Assoc. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*
Adak, Abdurrahman / Assoc. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*
Aydın, Tahirhan / Assoc. Prof., *Prof., Indiana University, USA*
Beltekin, Nurettin / Asst. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*
Bor, İbrahim / Assoc. Prof., *Indiana University, USA*
Bozarıslan, Hamit / Prof., *École des Hautes Études en Sciences Sociales, France*
Coşkun, Vahap / Prof., *Dicle University, Turkey*
Çakmak, Mürşet / Asst. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*
Kardaş, Canser / Asst. Prof., *Mus Alparslan University, Turkey*
Keskin, Necat / Asst. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*
Özmen, Abdurrahim / Assoc. Prof., *Dicle University, Turkey*
Şanlı, Süleyman / Asst. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*

NAVEROK / CONTENTS

JI EDÎTOR/EDITORIAL..... 07-10

Şerê li Hember Daişê, Tîrkiye û Pêşeroja Kurdistanê Iraqê

The War Against ISIL, Turkey and Future of Iraqi Kurdistan

ABDULLAH KIRAN.....11-41

Nationalistic Senses and Kurdish Politics in the Last Century

Hestên Netewî û Siyasetê Kurdan di Sedesala Dawî de

NECAT KESKÎN43-64

Li Gorî Pîvanên Cunningsworth Nirxandinek li Ser Hînkê

An Evaluation of Hînkê Based on Criteria by Cunningsworth

ŞEHMUZ KURT65-77

Heyranok ji Hêla Ziman, Şêwaz û Naverokê ve:

Nimûneya Herêma Wanê

Heyranok According to Language, Style and Context:

Example of Van District

MEHMET YILDIRIMÇAKAR.....79-91

WERGEREK / A TRANSLATION

Binyada Ergatîvîteyê di Kurdî de

THEODORA BYNON.....95-113

DOKUMENTEK / A DOCUMENT

Çend Dokument ji Serdema Mîrektiya Melkîşî

A Few Documents from the Period of the Malkishi Emirate

YUSUF BALUKEN 117-128

Ji Edîtor

Ji Nûbihar Akademîyê merhaba.

Em gelekî kêfxweş û serbilind in ku bi jimareke nû ya kovara Nûbihar Akademîyê dîsa li pêşberî we lêkolînerên hêja ne. Nûbihar Akademîyê, heta niha weşangeriya xwe ya akademîk zêdetir di çarçoveya mijarên spesîfîk ên wek devok, nivîskar, helbestvan, çand, dîrok, destnivîs û belgenamêyên xwecihî de domandiyê. Herçiqas em wek lêkolînerên niştêcîh ên Kurdolojiyê hewl didin ku di hilberînên xwe de van mijarên xwecihî û îhmalkirî derxin pêş, lêbelê digel vê jî carinan rûdanên rojane yên siyasî ewqas şênber dibin ku mirov nikare wan piştguh bike û bêgav dimîne ku asoyê ji mîkroyê ber bi makroyê ve berfireh bike. Çawa di vê jimarê de dê bê dîtî, Nûbihar Akademî di rewşên bi vî rengî de bi her du perspektîfan gotaran diweşîne.

Di vê jimarê de wek formata standart a kovarê dîsa çar gotar, wergerek û belgenamêyek cih digirin. Ji aliyê zimanên ku hatine bikaranîn ve sê gotar, werger u dokument bi Kurdiya Kurmancî u gotarek jî bi Îngilîzî hatine amadekirin. Ji aliyê disîplînan ve du gotar di qada siyaseta navneteweyî, gotarek di qada pwerwerde, gotarek di qada edebiyata Kurdî ya gelêrî, werger di qada ziman, belgenome jî di qada tarîxa Kurdan de ye.

Gotara **Abdullah Kiran** a bi sernavê “Tirkiye, Şerê li Hember DAÎŞê û Pêşeroja Kurdan” bi Kurdiya Kurmancî ye û di qada zanista siyaseta de ye. Kiran di gotarê de li ser serdema dawî ya siyaseta Tirkiyeyê û Kurdistana Başûr ku ji 2003yan dest pê dîke û heta bi referandûma Kurdistanê dom dîke radiweste. Kiran di çarçoveya faktorên wek girêka Kerkûkê, bihara Ereban, enerjî û DAÎŞê de li ser siyaseta Tirkiyeyê ya serdema navborî û pirsra sexwebûna Kurdistanê analîzên berfireh dîke.

Gotara **Necat Keskin** ya bi sernavê “The Kurdish Nationalistic Senses and Kurdish Politics in the Last Century” bi Îngilîzî hatiye nivîsîn û qada wê jî zanista siyaseta ye. Keskin di gotara xwe de pêşî balê dikişîne ser peymanên navneteweyî yên ku piştî belavbûna Osmaniyan hatine lidarxistin û Kurd li derve hiştine, piştî rewşa îro ya Kurdan ku piştî sed salî dîsa dîzayneke nû li Rojhilata Navîn tê kirin bi wê serdemê re berawird dîke. Keskin di çarçoveya teoriya Anderson ya bi navê “cemaetên xeyalî” û rûdanên siyaseta rojane de gihîştîyê wê encamê ku hê jî di nav Kurdan de fikra neteweyî zelal nebûye.

Gotara **Şehmuz Kurt** a bi sernavê “Li Gorî Pîvanên Cunningsworth Nirxandinek li Ser *Hînkerê*” bi Kurdiya Kurmancî ye û di qada perwerdeyê de ye. Kurt di gotara xwe de li gorî krîterên Alan Cunningsworth ku yek ji pêşengên girîng ên qada nirxandin û hilbijartina pirtûkên hînkirina zimanan tê qebûlkin, nirxandinekê li ser seta hînkirina zimanê Kurdî ya ku navê wê “Hînker” e dike. Kurt destnîşan dike ku “Hînker” di naveroka zimanî, çar şîyanwerî û rola mamosteyan de xwediyê hin kêmasiyan jî be, di nirxên civakî û metodolojîyê de serkeftî ye.

Gotara **Mehmet Yıldırımçakar** a bi sernavê “Heyranok ji Hêla Ziman, Şêwaz û Naverokê ve: Nimûneya Herêma Wanê” bi Kurdiya Kurmancî ye û di qada edebiyata Kurdî ya gelêrî de ye. Yıldırımçakar di gotara xwe de di çarçoveya herêma Wanê de li ser cureya heyranokê radiweste û li gorî rêbazên zanistên çand, folklor û edebiyatê li ser ziman, şêwaz û naveroka heyranokên devera Wanê tesbît û analîzên girîng dike.

Di beşa wergerê ya vê jimarê de gotara **Theodora Bynon** a bi sernavê “The Ergative Construction in Kurdish” ku di sala 1979an de li Zanîngeha Londonê di kovara *Bulletin of the School of Oriental and African Studies* de (Cambridge University Press, j. 42) hatiye weşandin, ji aliyê **Resul Geyik** ve bi sernavê “Binyada Ergatîviyê di Kurdî de” bo Kurdiya Kurmancî hatiye wergerandin.

Herî dawî di beşa dokumentê ya vê jimarê de dokumentasyoneke ku **Yusuf Baluken** bi sernavê “Çend Dokument ji Serdema Mîrekiya Melkişî” amade kiriye cih digire. Baluken di dokumentasyonê de nivîstekên Medreseya Yelman Beg, du tirbên malbata Melkişîyan û çend diraven ku li Çemişgezekê ji aliyê Melkişîyan ve hatine çapkirin pêşkêş dike. Şayanê behs e ku mîrekiya Melkişîyan di sedsala XIV'em de ava bûye û li derdora Çemişgezek, Mazgirt, Pertek û Saxmana Dêrsimê desthilatdarî kiriye.

Heta jimareke dî ya Nûbihar Akademîyê her di nav di xweşiyê de bimînin.

Doç. Dr. Abdurrahman ADAK

Edîtorê Jimarê

Editorial

Greetings from Nûbihar Akademî,

We are very pleased and proud to be able to present to you, distinguished readers, a new issue of Nûbihar Akademî. Nûbihar Akademî has published on most specific issues such as dialect, author, poet, culture, history, manuscript and specific documents. Although we as academics of Kurdish studies try to focus on and reveal neglected and specific topics, in contrast to this reality, the concrete political developments around the globe do not let us ignore them, which accordingly shifts the micro perspective towards the macro. As you would see in the current issue, Nûbihar Akademî will occasionally publish articles from both perspectives.

As a standard form in the journal, four articles, one translation and a document make the current issue. In terms of the languages used, three articles and a document are in Kurdish-Kurmanji and an article is in English. In terms of disciplines, two articles are about international policy, one about education, another about literature of Kurdish folklore, the translation is about language and the document is about the history of the Kurds.

The article of **Abdullah Kiran** titled “Turkey, its war against ISIS and the future of the Kurds” is in Kurdish-Kurmanji and about political science. Kiran focuses on the recent period of Turkey’s policy and the Southern Kurdistan covering the period from 2003 up to the referendum on the independence of Kurdistan. Kiran in the framework of the Kirkuk conflict, the Arab Spring, energy and ISIS offers comprehensive analyses on the policy in Turkey and the period mentioned and the independence of Kurdistan.

The article of **Necat Keskin** with the title of “The Kurdish Nationalistic Senses and Kurdish Politics in the Last Century” is in English and falls within the discipline of Political Science. Keskin highlights international messages after the collapse of the Ottoman Empire and its excluding Kurds outside of it and then focuses on the current situation of the Kurds in the new design of the Middle East with a comparison of the present and the past. Keskin, drawing on Anderson’s “imagined communities” and the current developments, argues that the idea of nationalism is still not well-formed among the Kurds.

The article of **Şehmus Kurt** titled “Li Gorî Pîvanên Cunningsworth Nirxandinek li Ser *Hînkê*” is in Kurdish-Kurmanji and it is on language teaching. Kurt, in his article, assesses the Kurdish language teaching course book “Hînkê” in accordance with assessment criteria developed by Alan Cunningsworth, one of the leading experts in evaluation and selection of the books used in language teaching. Kurt points out that though Hînkê might have some deficiencies such as the content of the language, four skills and the role of the teachers, it is successful in terms methodology and covering social values.

In his article Kurdish-Kurmanji “Heyranok ji Hêla Ziman, Şewaz û Naverokê ve: Nimûneya Herêma Wanê,” **Mehmet Yıldırımçakar** writes on Kurdish folk literature. Yıldırımçakar highlights the significance of the genre *heyranok* and determine the topic with scientific methods of culture, folklore and literature based on the language, style and the content of the *heyranoks* from the Van region with significant analyses.

In the translation section of this issue, an article by **Theodora Bynon** titled “The Ergative Construction in Kurdish,” published in 1979 in the University of London in the journal of *Bulletin of the School of Oriental and African Studies* de (Cambridge University Press, j. 42) was translated into Kurdish-Kurmanji by **Resul Geyik** with the title of “Binyada Ergatîvîyê di Kurdi de”

In the final section, **Yusuf Baluken** authors a document titled “Çend Dokument ji Serdema Mîrektîya Melkîşî.” Baluken presents the writings of Yelman Beg Madrasah, two tombs of Melkîşîyan family and a few coins that were issued in Çemişgezek. It is worth to mention that Melkîşîyan Seigniory was established in the XIV century around Çemişgezek, Pertek and and Saxmana Dêrsimê.

With our best wishes until another issue of Nûbihar Akademî.

Assoc. Prof. Abdurrahman ADAK
Issue Editor

Şerê li Hember Daîşê, Tirkiye û Pêşeroja Kurdistanê Iraqê

The War Against ISIL, Turkey and Future of Iraqi Kurdistan

Abdullah KIRAN*

PUXTE:

Siyaseta Tirkiyê ya li hemberî herêma Kurdistanê Iraqê di nav deh- panzdeh salên dawî de çend caran guherî. Hukûmeta AK Partiyê di sala 2007an de dev ji helwesta kevin a dewleta Tirkiyê berda û hêdî hêdî siyaseteke hê nerm û himêzkar şopand. Di çarçova siyaseta nû de, Tirkiyê di warî aborî û siyasî de têkiliyên gellek xurt bi hukûmeta Kurdistanê Iraqê re danî. Di Îlona 2012an de Hukûmeta Kurdistanê bi awayekî fermî beşdarî Kongreya AK Partiyê bû. Di sala 2013an de, Serokwezîr Erdogan li Diyarbekir pêşwazî li Serokê Kurdistanê Mesut Barzanî kir û di heman salê de petrola Kurdistanê li ser Tirkiyê, gihîşt bazarên dinyayê. Tirkiye û desthilatiya Kurd ewqas nêzîkî hevdu bûn ku, vê têkilya wan a germ, desthilatiya navendî ya Iraqê û Amerîka xembar kir. Di Hezîrana 2017an de, gava ku gava ku desthilatiya Kurd biryara referandûma serxwebûnê stand, Tirkiye bi hişkî li hember derket û xwest ku referandûm ji bo çend salan bê bipaşxistin. Piştî ku referandûm di 25ê Îlonê de pêk hat, Tirkiye û Îranê sînoren xwe yê ezmanî li ber herêma Kurdistanê girtin. Di 16ê Razberê de hêzên Iraqê û Heşdî Şabî ketin Kerkûkê û bi ketina Kerkûkê re, serxwebûna aborî ya desthilatiya Kurd ket xeterê û Tirkiyê dest pê kir, cardin têkiliyên xwe yên bi hukûmeta navendî ya Iraqê re xurt kir. Bi vî awayî têkiliyên herdu aliyên ket serdemeke nû.

Bêjeyên sereke: Tirkiye, Kurd, DAÎŞ, Iraq, Kurdistanê Iraqê.

ABSTRACT:

Turkey's policy towards Kurdistan region of Iraq has been changed a few times within the last ten-fifteen years.

* Prof. Dr., Zanîngeha Muş Alparslanê, Fakulteya Îqtîsadê, Beşa Têkiliyên Navneteweyî, Muş, Tirkiye / Muş Alparslan University, Faculty of Economics, Department of International Relations, Muş, Turkey. e-mail: 29abdullah@gmail.com

In 2007, the government of AK Party (Justice and Development Party) has shifted previous attitudes of Turkish state towards the Iraqi Kurds and step by step began to pursue a moderate and inclusive policy regarding the Iraqi Kurds. Within the frame of a new approach, Turkey has built tight economic and political relations with Kurdistan Regional Government. In September 2012, the Kurdistan Regional Government has been officially invited by AK Party to attend its congress. In 2013 the Prime Minister Erdoğan, welcomed the President Barzani at Diyarbakir very warmly and Kurdish petrol began to be exported to the international markets at the same year via Turkey. The close relations between Turkey and Iraqi Kurdistan concerned both Iraqi Central Government and even USA. In June 2017, because of the fact that Kurdish authority decided to arrange an independence referendum, Turkey fiercely opposed that decision and asked Kurds to postpone it for a few years. When the independence referendum took place on its scheduled time, namely on 25 September, Turkey and Iran closed their air spaces to Kurdistan region. At 16 October of 2017, the Iraqi forces and Popular Mobilization Force (Haşdi Şabi) entered Kirkuk city and with the fall of Kirkuk, the economic independence of Kurdish administration fell into danger. After that happened, Turkey began to strengthen her relations with Iraqi Central Government. Thus a new era began in the relations of Turkey and Iraqi Kurds.

Keywords: Turkey, Kurds, ISIL, Iraq, Iraqi Kurdistan.

1. DESTPÊK

Siyaseta Tirkîyê ya li hemberî Kurdîstana Başûr, li gor demê û serweriya aktorên siyasî yê herêmê guherînan nîşan dide. Vê siyaseta ku bi pirranî ne statik e û li gorî konjenktorê diguhure, dikare di nav xwe de bi vî awayî bê dabeşkirin: 1) Serdema 1920-1926an. Di vê serdemê de Tirkîye Başûrê Kurdîstanê di nav sînorên xwe yê Mîsak-î Millî de dibîne û dixwaze ku ev der bi ser axa wê ve bê berdane. 2) Serdema 1926-1986an. Divê serdemê de Tirkîye dixwaze ku herêmê bi Iraqê ve entengre bike û ji bo dewisandina doza netewî ya gelê Kurd, car bi car bi dizî û car bi car jî bi eşkereyî alikariya dewleta Iraqê dike. 3) Serdema 1990-2003an (Kiran, 2001). Di vê demê de Tirkîye car bi car doza li ser axa wê vegerandina Wîlayeta Mûsulê, ango Kurdîstana Başûr dike û carinan jî bi qertê Tirkmenan, dixwazepêşî li otonomiyek Kurdan ya berfireh bigire. 4) Serdema çaran ji 2003an vir ve tê. Di vê gotarê de emê bi giranî li ser serdema paşî rawestîn¹.

1 Ji bo nîrxandîneke li ser siyaseta Tirkîyê ya navbera salên 1920-2000î, bnr: Abdullah Kiran, "Tirkîye'nin Kuzey Irak Politikasi" Birikim, Sayı: 148, Agustos 2001.

2. SIYASETA TIRKIYÊ YA PIŞTÎ 2003AN Û GIRÊKA KERKÛKÊ

Ji roja ku Iraq ava bûye heta sala 2003an, dewleta Tirkiyê di siyaseta xwe ya derve de, hergav ne be jî bi giranî li hemberî Kurdan bi dewleta Iraqê re tev geriya. Piştî dagirkirina Iraqê ya ji alî Amerîka ve û ji desthilatiyê dûrkirina Seddam Huseyîn, Tirkiye neçar ma ku pozisyona xwe ya beramberî Kurdan raçav bike û çaxê ku otonomi hat rojevê, ji bo Kurdan li dijî otonomiyeke berfireh derket (Dobbins, Jones, Runkle, Mohandas 2009), di şûna otonomiyê de sîstema ku ji alî Paul Bremer (Amerîka) hat pêşniyazkirin û Iraq bi awayê 18 wîlayetan dabeş dikir çêtir dît. Çimkî otonomiyeke berfireh dikaribû neteweperweriya Kurdî hêzdar bike, han û peyxam bide tevgerên Kurdan yên li perçeyên din jî. Loma Tirkiyê ji bo pêşlêgirtina belavbûna neteweperweriya Kurdî, Tirkmenên Iraqê jî li hember Kurdan bikar dianî û ji bo ku Kurd nikaribin Kerkûkê bi awayekî fermî bixin nav axa xwe, çî ji destê wê dihat dikir.

Li gor rêbazavahiya (qanûnî esasî) Iraqê ya ku di 15 meha Çiriya Pêşîn ya sala 2015an de bi referandûmê hat pejirandin, ewê her sê wîlayetên Kurdan wek herêmekê bihata naskirin û ji alî Hukûmeta Kurdistanê ya Herêmî (Kurdistan Regional Government) ve bihatana rêvebirin. Di xala 113an ya Rêbazavahiyê de dihat diyarkirin ku ewê Hukûmeta Kurdistanê ya Herêmî (HKH) ji ewlekariya xwe ya navxweyî berpirsiyar be û pêşmerge bi awayekî fermî hêza parastinî ya herêmê be (Katzman & Humud, 2016). Dîsa li gor xala 140an a Rêbazavahiya Iraqê, ewê di dawiya sala 2007an de ji bo Kerkûkê referandûm bihata çêkirin û di encama vê referandûmê de biryar bihata dayin, bê gelo ewê Kerkûk bi hukûmeta navendî ya Iraqê ve bimîne an ku bi ser Kurdistanê ve bê girêdan. Hingê Tirkiye bi tûndî li hember referandûmê derdiket û diyar dikir ku bi hezaran Kurd li Kerkûkê hatine cîwarkirin û xwedêgiravî demografiya bajarê Kerkûk ji alî Kurdan ve hatiye guhartin (Turkish Weekly, 2007). Heta dawiya sala 2007an jî, Tirkiyê HKHê ji êrişên PKKê berpirsiyar digirt û bi ambargoyên aborî gef li Başûrê Kurdistanê dixwarin.

Hingê Tirkiyê herî zêde di mesela Kerkûkê de serêşan çêdikir û nedixwest ku Kerkûk bi ser Kurdistanê ve bê berdan. Li gor Tirkiyê Kerkûk ne bajarekî Kurdan bû, ev bajêr bi dîrok û nasnameya xwe Tirkmen bû. Belê çawa ku nivîskarê ansîklopediya pêşî ya bi zimanê Tirkî Şemseddîn Samî jî di kitêba xwe ya bi navê Kamusu'l – A'lâm de dianî ziman, Kerkûk bi awayê dîrokî bajarekî Kurdan bû. Şemseddîn Samî weha dinivîsî: *“Ji çaran sisê yê bajarê Kerkûkê Kurd, ji çaran yek jî Tirkmen, Ereb û yên mayî ne. Li bajêr 760 Cihû û 460 Xirîstiyânên Keldanî niştecih in (Bozarslan, 2001.)”*

Di dema Osmaniyan de, Kerkûk navenda rêvebiriya wîlayeta Şehrezorê bû. Di sala 1879an de Kerkûk bi ser wîlayeta Mûsulê ve hat girêdan û bû senceqeke (baja-

rokek) vî bajarî. Di sala 1918an de gava ku Îngilîzan Mûsûl dagir kir, hingê wan li Erbilê parêzgehek (walîtiyek) nû saz kir. Li gor nirxandina Îngilîzan, di sala 1921an de, ji şênîyên herêma Kerkûkê, 75 000 Kurd, 35 000 Tirkmen, 10 000 Ereb, 1400 Cihû û 600 Keldanî bûn. Di sala 1925an de lijneyeke Koma Netewan (League of Nation) jî ji bo çareserkirina pirsra Mûsûlê hatibû herêmê û li ser avahiya demografîk lêkolîn pêk anîbûn. Li gor agahiyên vê lijneyê jî, ji % 63ê yê nufûsa Kerkûkê Kurd, ji % 19 Tirkmen û ji % 18 jî Ereb bûn (Talabany, 2007).

Ji Kerkûkê qewirandin û paqijîya etnîkî ya li hemberî gelê Kurd, di sala 1963an de bi awayekî sistematîk dest pê kir. Di Tîrmeha sala 1963an de, Alî Salih el Sadî li ser navê rejîma Baasê, li derûdora Kerkûkê 13 gundên Kurdan bi tevahî hilweşandin û li navçeya Dûbzê ya ku li ser bajêr e, 34 gundên Kurdan vala kir û Ereb di cihê wan de bicih kirin. Bêguman ev destpêk bû. Piştî ku rejîma Baasê cihê xwe baş bi keys kir û serwerî bi tevahî kir destê xwe, ji Kerkûkê ajotina Kurdan bêrawest dom kir. Di nabeira salên 1963 û 1988an de, 779 gundên Kurdan yê li derûdora Kerkûkê hatin hilweşandin. Ji bo ku pêşî li vegara Kurdan were girtin zevî û baxçe hatin şewitandin, pez û dewarên wan hatin talankirin, bîrên avan hatin korkirin û goristanên Kurdan hatin xerakirin. Di encama vê tevgera paqijîya etnîkî de, 37,726 malbatên Kurd ji gundên xwe hatin derxistin. Eger serê her malbatê 4-5 nefer jî bê hesibandin, hingê di dora 200 000 kesî de Kurd ji cih û warê xwe hatin kirin. Rejîma Baasê, heta destpêka şerê Îran û Iraqê jî têkilî Tirkmenên Kerkûkê nedibû, belê di dema şer de, gundên Tirkmenên Şîî jî li Kerkûkê hatin xerakirin (Talabany, 2007).

Bêguman dewleta Iraqê tenê Kurdên ku li gundan dijiyan ji cihê wan dernexist, Kurdên bajarî jî armanca (hedefa) wê bûn. Karkerên ku di şirketên petrolê de dixebitin, karmand û mamosteyên Kurd jî ji hovîtiyê para xwe standin. Rejîma Baasê navê hemû kuçe û dibistanên bajêr guhart û zivirand Erebî. Kurdên ku ji bajêr derdiketin, tenê karibûn millkên xwe bifiroşin Erebî û kesên ku ne Ereb bûn, ji bo wan destûr nebû ku li bajêr milk bikin. Ji bo Erebî bi sedan, bi hezaran şengehên nû (residential area, cihê rûniştinê) hatin vekirin. Paqijîya etnîkî piştî Şerê Kuveytê yê sala 1991an jî berdewam kir. Di sala 1997an de hukûmeta Iraqê, Kela Kerkûkê ya nav bajêr, bi dêr û mizgeftên wê ve hilweşand. Li gor Komîteya Şopandina Mafên Mirovî (Human Rights Watch), hukûmeta Iraqê di navbera salên 1991 û 2003an de, ji 120 000î heta 200 000 kesî ji Kerkûkê derxist (Human Rights Watch, 2003).

Tirkîyê bi tu awayî van hovîtiyên ku li dijî gelê Kurd dihatin kirin wek meseleyeke bînpêkirina mafên mirovî jî nedidît. Valakirin û bi demografiya Kerkûkê leyistin, ne xema Tirkîyê bû, belê çaxê ku piştî 2003an fersend û mefera Kurdan ya zivirîna mala xwe hat rojevê, hingê Tirkîyê jî xerakirina demografiya Kerkûkê

qal kir. Tirkîyê nedixwest ku Kerkûk bi ser herêma Kurdistanê ve bê berdand, çimkî gava ku Kerkûk ket destê Kurdan, hingê wan di riya bidestxistina serxwebûna aborî de gava herî girîng davet û serketineke mezin bi dest dixist.

Siyaseta Tirkîyê ya li hember Kurdîstana Başûr, piştî ku hukûmeta AK Partiyê hat ser kar, di nav salan de hêdî hêdî guherî, belê di pirsê berdana Kerkûkê ya bi ser Kurdistanê ve guherîneke bingeîn pêk nehat. Piştî ku di Hezîrana 2014an de DAÎŞê Mûsul dagir kir û Kerkûk ket destê Kurdan, hingê rewşeke nîpûnû derket holê. Beriya ku em li ser vê rewşa nû rawestin, me divê ku em ji guherîna siyaseta Tirkîyê qal bikin.

3. AK PARTÎ Û GUHERÎNA SIYASETA TIRKÎYÊ

Bêguman ev guherîn yekderb çênebû, çimkî hukûmeta AK Partiyê jî, bi taybetî di siyaseta derve de zû bi zû dev ji refleksên dewletî yên ku ji dema Kemalîstan mabûn bernedida. Wezîrê Karên Derve yê Kevin ê Tirkîyê Yaşar Yakiş, di hevpeyivîneke xwe ya du di Tirmeha 2013an de, ji rojnameya Tarafê bi Tugba Tekerek re kir, vê guherîna siyasetê weha tîne ziman. “13 sal berê hê me teze partiya xwe ava dikir. Wezîrê Parastinê yê Hukûmeta Koalîsyonê, ji bo Kurdên Bakûrê Iraqê beyanatek dabû û gotibû, *‘ew dixwazin otonomiye ilan bikin, ka bila bikin emê bibînin.’* Hingê min jî ew rojnameya ku ev beyanat tê de çap bûye hilda û ez çûm odeya Birêz Abdullah Gul û min jê re got: *‘Dibe ku em di pêş de hukûmetê ava bikin. Hingê divê em ji beyanên bi vî cûreyî, heta ji dest tê xwe dûr bixin, çimkî sînorek hêza Tirkîyê ya li ser bûyerên Iraqê heye. Li Iraqê çi bibe, ewê Iraqî biryara vê yekê bidin. Eger Iraqî biryara li Bakûr avakirina otonomiyekê bidin ewê çêbibe. Pêwîst e ku Tirkîye bi wê herêma Kurdan re têkiliyên dostanî deyne. Heta ew der dikare di pêş de bibe dewletek serbixwe jî.’* Wî got, *‘Baş e di nav bûyerên ku evqas bi lez û bez rû didin de, em dikarin vê zavoqê (vîrajê) bizivirin? Min got, ‘em nikarin, lê divê helwesta me weha be.’* Piştê hilbijartin çêbû. Birêz Gul bû serokwezîr û ez jî bûm Wezîrê Karên Derve. Wî ji min re got: *‘Yaşar, niha tu Wezîrê Karên Derve yî, ma tu dikarî wê vîrajê bizivirî?’* Min got: *‘Niha Amerîkayî herêmê dagir dikan, zivirîna vîrajê dijwar e, belê ez li pişt gotinên xwe me. Di sala 2000an de min ev şîretên ha li Birêz Gul kiribû, belê iro em di têkiliyên dostane yên bi herêma Kurd re bi pêşiya Amerîka ketine û ew (Amerîkayî) standine pêşberî xwe. Dostaniya me ya bi Kurdan re ewqas nêzik bûye. Niha ez ji bo bakûrê Sûriyê jî heman tiştan dibêjim: Ewî Sûriyeyî biryar bidin, bê ka ewê li Sûriyê çi bibe. Divê em bi Kurdên wê derê re jî baş derbas bikin (Tekerek, 2013).’*”

Ev guherîna siyasetê tafilê pêk nehat, çaxê ku dor hat ser mafên Kurdan û destketiyên wan, Tirkîyê her gav çivan da xwe, çivçivand. Bi ser ku hukûmeta

navendî ya Iraqê di pirsra PKKê de zêde paxav bi siyaseta Tirkîyê nişan nedida jî, dîsa Tirkîyê hergav dixwest ku li hember Kurdan destê Bexdayê xurt be. Helbet Tirkîyê xema Kurdan nedixwar, belê rewşa Sûniyên Iraqê ne bi dilê wê bû. Di Çiriya Paşîn a sala 2011an de, gava ku Amerîka bi tevahî ji Iraqê vekîşîye, hingê hukûmeta navendî helwesta xwe ya li dijî Sûnnîyan hê tûjtir kir. Çaxê ku biryara girtina Cîgirê Serokkomar Tarîk Haşîm hat derxistin û ew reviya Kurdistanê, hingê Tirkîyê biryar da ku wî wek penaber qebûl bike. Piştî ku ew hat Tirkîyê, rayedarên siyasî eleqayek mezin jê re nişan dan û ji bo parastina wî çî ji destê wan hat kirin. Gava ku Înterpolê ji bo girtina wî “bultenek sor” deranî ji Tirkîyê ew teslîm nekir û cîgirê serokwezîr Beşîr Atalay di beyaneke xwe de got ku “*Em welatek mêvanperwer in. Em rûdanan bi hassasiyet dişopînin. Haşîmî niha mêvanê me ye û emê li mêvanê xwe xwedî derkevin* (Sabah, 2012).” *Di Tîrmeha 2012an de Tirkîyê mafê penaberî ji bo Haşîmî nas kir* (Yezdani, 2012).

Di Îlona sala 2012an de, Serokwezîrê Tirkîyê Recep Tayyip Erdoğan, bi armanca ku beşdarî kongereya giştî ya AK Partiyê bibe, Serokwezîrê Iraqê Nûrî El Malîkî ezimand Stenbolê. Di heman salê de têkiliyên Tirkîyê û Iraqê ber bi nebaşîyê ve diçûn û bi vê bangê Erdogan dixwest ku navbera herdu welatan baş bike. Belê banga ku li Malîkî hat kirin, bi bahaneya ku hin planên wî yên din hene, ji alî Iraqê ve nehat erêkirin. Bexda ji ezimandina Tirkîyê re bêgane ma, belê Hukûmeta Kurdistanê Iraqê bi dilgermî beşdarî li kongreya AK Partiyê kir, Serok Barzanî di roja 31ê Îlonê de, li Enqerê, di Kongreya AK Partiyê de peyivî. Barzanî di axaftina xwe de li ser têkiliya herdu alîyan rawest û diyar kir ku ewê di pirsra çareserkirina mesela Kurdî de bi her awayî ji Tirkîyê re bibin alîkar. Nêzîkbûna di navbera Erbil û Enqerê de, Bexdayê ji Tirkîyê hê bêtir dûr dikir û di têkiliyên herdu alîyan de terk û derzên nû pêk dianî.

4. BIHARA EREBAN Û ÎRANÊ TIRKIYE NÊZÎKÎ KURDAN KIR

Di nêzîkbûna Tirkîyê û Kurdistanê Başûr de du dînamêkên herêmî rolekî bingehîn dileyiztin:

- 1) Bandora Îranê ya li ser hukûmeta navendî ya Iraqê.
- 2) Geşedanên ku bi Bihara Ereban re li tevahiya Rojhilata Navîn rû didan û pêl bi pêl belav dibûn.

Bi taybetî piştî sala 2007an, Kurdan dixwest ku giraniya Îranê ya li ser Iraqê bi awayekî bînin keysê, da ku têkilî û hevkarîya herdu alîyan, desketiyên wan nekin xeterê. Hingê hevkarî û hevalbendîya Îran û Iraqê li ser xetê mezhebî bejin diavêt. Piştî sala 2003an desthilatîya siyasî ya Iraqê ji destê Sunnîyan derketibû û

Şiiyên Iraqê cihê wan standibûn. Bi vê kel û hersê, Sunniyên Iraqê ji referandûma Rêbazavahiyê (qanûnî esasî) re jî paxav nişan nedabûn (Katzman & Humud, 2016). Çawa ku di dema Saddam û demên beriya wî de Sûniyên Iraqê nedixwestin desthilatiya siyasî bi Şiiyan re parî bikin, wusa jî niha Şiiyan, Sûnî ji karên rêvebirîya welat dût dikirin û di buroksayiya dewletê de cih nedidan wan. Ji ber ku Îran raste rast li pişt Şiiyan disekinî, tu fersenda ku ne Sûnî û ne jî Kurd bi hêza xwe ya nav welat bikaribin li hember spartinên Bexdayê rawestin nemabû. Di heman demê de, di navbera Sûniyên Iraqê û Kurdan de jî hevkarîyek tunebû û ji xwe hêzên Sûnî jî di nav xwe de tarûmar bûn.

Di vê rewşa Iraqê ya aloz de, li ber Kurdan riyek hebû: An ewê radestî Îranê û Şiiyan bibûna an jî ewê Kurdan serî li hêzeke herêmî bidana û bi hevkarîya wê hêzê, li hember hevalbendiya Îranê û Şiiyên Iraqê yeksaniyek çêkirina. Di vê rewşê de, xên ji Tirkiyê tu dewletek din ya cîran a ku ewê bikaribin pê re danûstandinekê çêkin tunebû. Li rojhilatê wan Îran, li rojavayê wan Sûriye, li başûrê wan Şiiyên Iraqê û li bakûrê wan Tirkiye hebû. Ne tenê Iraq, hê ji beriya Iraqê ve Suriye jî hevalbendê Îranê bû. Loma tenê riya Tirkiyê li pêş Kurdan nîvenîv vekiribû. Eger Kurdan bi stratejiyek rast bikaribûna vî deriyê ha vekin, hingê dikarbûn hilmekê bîstandina. Heke na karê wan gellek dijwar bû. Riya pêşveberina têkiliyên siyasî, bi xurtkirina têkiliyên aborî ve girêdayî bû. Di heman demê de Kurdistan ji nû ve dihat avakirin, bi hezaran şirketên avawerî li Erbîlê kon vedabûn û di nav wan de gellek şirketên Tirkiyê jî hebûn. Hukûmeta Kurdistanê, gellek projeyên mezin yê avawerî dan şirketên Tirkiyê, ku di nav wan de karên avakirina balafirgehên Erbîl û Silêmaniyê jî hebû. Di nêzîkbûna Kurdan û Tirkiyê de Amerîka bi xwe jî, ji sala 2003an vir ve hewl dida (Cagatay & Tyler, 2012).

Îcar hêmana duwemîn Bihara Ereban bû. Bi rûdana Bihara Ereban re hemû dînamîkên Rojhilata Navîn serobino bûn. Bi taybetî Sûriyê bandoreke mezin li ser Tirkiyê nişan dida, çimkî herdu welat hemsênor bûn û dirêjahiya sînorê navbera wan ji 900 km yî zêdetir bû. Li herêmê Tirkiyê hê ji destpêkê ve helwestek siyasî ya ku dijberî rejîma Bişar Esad e pejirandibû. Herweha Tirkiyê didît ku Îran, li gel Iraqê raste rast piştevaniya Suriyê dike. Hevalbendiya Îran, Iraq û Sûriyê li ser bîngeheke mezhebi bejin diavêt. Bi vî awayî Îranê dixwest ku xeteke mezhebi ava bike û ji Xelîca Faris heta Deryaya Spî, bi awayê hîvîkekê, ku jê re Hîvîka Şii dibêjin bike jîyanê. Hesabê Îranê yê avakirina Hîvîka Şii hesabek stratejîk bû û ji zû ve dajot. Li Rojhilata Navîn, çavkaniyên petrolê yê herî dewlemend li “Hêvîka Şii” cih digirtin (Galbraith, 2006). Hingê Enqerê xwest ku li hember vê rasttenga (mîhver) Şii ji bo xwe hevalbendan peyde bike. Kurdistanê Başûr û Sûniyên Iraqê, divê rewşa tevlihev de ji bo Enqerê hevalbendên xweheyî xuya dikirin.

Sedemek din ji rewşa PKKê bû. Çimkî Tirkîyê bawerî pê dianî ku hem Suriye û hem jî Îran ji binî ve PKKê diparêzin. Bi nêzîkbûna Hukûmeta Kurdîstana Iraqê (HKI) re, Tirkîyê hevî dikir ku ewê Kurdên Başûr jî, li hember Qendilê hê bi pîvan tev bigerin.

Nêzîkbûna Tirkîyê û HKIê bandoreke neyênî li ser tîkiliyên Enqere û Bexdayê jî nîşan dida. Ji ber ku Bexdayê nedixwest Tirkîye, bêyî ku bi wan bişêwire û haya wan jê hebe bi Kurdan re danûstandineke sererast deyne. Li gor Iraqê, Tirkîyê bi van kirinên xwe xesar dida serwerî û desthilatiya Iraqê. Beriya ku bi Kurdan re bide û bistîne, diviya pêşî bi hukûmeta navendî ya Iraqê bişêwiriya.

5. TÊKILIYÊN DI WARÊ ENERJİYÊ DE

Tirkîyê heta demê nêzîk jî hukûmeta Bexdayê li ser pirsên enerjîyê ji bo xwe muxateb didît. Normên huqûqa navnetewî jî ev yek rast û pêwîst nîşan didan. Wezîrê Enerjîyê yê Tirkîyê Taner Yıldız jî diyar dikir ku ewê Tirkîye li gor peymanên navnetewî tev bigere û bêyî ku erêkirina Bexdayê bistîne, bi Erbîlê re tu peymanek encamgir destnîşan neke. Eger bi Erbîlê re li ser xeteke enerjîye lihevhatinek pêk were jî, ewê bi erêkirina Iraqê çêbibe (Natali, 2012).

Di Gulana 2013an de Serokwezîrê Tirkîyê Recep Tayyip Erdogan diyar kir ku ewê Tirkîye, li gel Exxon- Mobilê, bi HKIê re peymanên cûrbicûr ên li ser petrolê çêke (Okumuş, 2014). Piştî vê yekê, li gor huqûqa navnetewî li riyên ji Kurdistanê anîn û kirrîna petrole hat gerrîn. Li pêş danûstandineke bi vî awayî du asteng hebûn: 1) Di pîrsa berhênerî (production, uretim), parîkirin û firotana petrolê de, di navbera hukûmeta navendî û desthilatiya Kurdîstana Iraqê lihevkirinek tunebû. 2) Diviya li gor huqûqa navnetewî ev danûstandin rêbazwar (meşru- legitimate) be.

Di Çiriya Paşîn a sala 2013an de Tirkîyê û HKIê peymanek di warê enerjîyê de destnîşan kirin. Bi vê peymanê armanc ew bû ku petrola Kurdistanê pêşî bigihîje Bêndera Ceyhanê û ji wir li bazarên cîhanê belav bibe. Belê hukûmeta Bexdayê yekderb li hember vê peymanê derket, diyar kir ku firotana petrolê tenê dikare bi erêkirina wan pêk were û karek weha binpêkirina Rêbazavahiya (constitution, Qanûna Esasî) Iraqê jî bi xwe re tîne, loma ne rêbazwarî (meşru, legitimate) ye. DYAyê helwesta hukûmeta Iraqê rast dît û piştgirîya Bexdayê kir (Serdaroglu, 2015). Li ser vê yekê Tirkîyê diyar kir ku ewê petrola Kurdistanê li Ceyhanê bê kewarkirin (depokirin) û piştî ku hukûmeta navendî ya Iraqê destûr da, wê gavê derfiroşiya (ih-racat) wê dest pê bike. Çaxê zordaniya (pressure) navnetewî li ser Tirkîyê zêde bû, ku bi giranî ji alî Amerîka ve dihat, hingê Wezareta Enerjîyê ya Tirkîyê, heta ji dest hat li ser vê mijarê beyanat neda. Herçiqas Bexdayê got ku ewê vê pîrsê bibe pêşberî Dadgeha Navnetewî ya Navberkarî ya Parîsê (International Court of Arbitration in Paris) jî, Tirkîyê ji binî ve xwest ku dilê wê bistîne (Jones, 2014).

Bêguman pirseke girîng ji karê ragihandina petrole bû, bê ka ewê bi kîjan riyê an bi kîjan lûleyên xetî petrola Kurdistanê bihata Tirkiyê. Gelo ewê lûleyên xetî yên Kurdistanê bi serê xwe ji nû ve bihatana kişandin an ku ewê bi lûleya xetî ya Kerkûk-Ceyhanê ve bihatana danîn? Lûleya Xetî ya Kerkûk-Ceyhanê ya ku dirêjahiya wê 970 km ye, di dema rejîma Baasê de, di sala 1977an de hatibû avakirin². Li gor peymanana navbera herdu welatan, ne Tirkiye û ne jî Iraq, bêyî ku destûra aliyê din hebe nikare ji vê lûleya xetî îstifade bike. Çimkî hê berê, Tirkiyê xwestibû ku lûleya xetî ya Bakû-Ceyhanê di nav sînoren xwe de, bi lûleya Kerkûk-Ceyhanê ve girêde, belê hukûmeta Iraqê destûr nedabû vê yekê (Okumuş, 2014). Eger Tirkiyê bikaribûya Iraqê razî bike û bi armanca transferî ji lûleya Kerkûk-Ceyhanê îstifade bikira, hingê ewê bi vê yeke jî hatinek bi dest bixista. Tam di vê dema ku li riyên anîna petrola Kurdistanê dihat gerîn, Wezîrê Enerjiyê yê Hukûmeta Kurdistanê Aştî Hawramî diyar kir ku ewê Hukûmeta Kurdistanê lûleyek petrolê ya nû ava bike û kapasîta wê jî rojê milyon varîlek be. Hawramî got ku ewê çêkirina lûleya petrole ya nû bi qasî 18 mehan an herî zêde 2 salan bajo û di çaryeka pêşî ya sala 2014an de amade be (Aljazeera Turk, 2013).

Piştî ku Amerîkayê jî piştgiriya Bexdayê kir, neçar hukûmeta Kurdistanê Iraqê li riyên bi Bexdayê re li hevdu hatinê geriya û bi vî awayî di 2ê Çileyê Pêşî yê heman salê (2014) de Erbil û Bexdayê li ser mercên firotana petrole li hev kirin. Li gor vê peymanê, ewê HKIê bikaribûya rojê 300.000 varîl petrol bifirota, ji %17ê yê hatinê di destê xwe de bihêştta û hatiniya mayî bisparta SOMOya Iraqê³. Petrola ku ji Kurdistanê Iraqê li bazarên dinyayê belav dibû, bi giranî bala kiryarên wek Îtalya, Fransa, Yûnanîstan û Îsrailê dikişand. Li gor peymanana destnîşankirî, ewê pereyên ku ji firotana petrolê hatine bi destxistin, li Halkbanka Tirkiyê biciviyana, ku ev jî ne bi dilê Amerîka bû.⁴

Di navbera mehên Gulanê û serê Tebaxa 2015an de, Îsrailê 19 milyon varîl ji petrola Kurdistanê kirrî, ku bi buhayê milyar dolarekî dikir. Îsrailê hema bêje ji çaran sisiyê petrola ku ji Kurdistanê dighîşt Bêndera Ceyhanê dikirî. Di heman demê de, ji %17yê petrola Kurdistanê hatiye Îtalyayê, ji %8ê wê Yûnanîstanê û ji %9ê wê jî Tirkiyê kirriye. Bi ser ku hinekan digot Îsrail bi erzanî petrola Kurdistanê dikire jî,

-
- 2 Herçiqas bi awayê Lûleya Kerkuk- Ceyhanê tê binavkirin jî, ya rast du lûle hene. Lûleya pêşî di sala 1977an de ya din jî di sala 1987an de hat vekirin.
 - 3 Lihevkirina HKIê û Bexdayê, tam li ser çî bingehê pêk hat baş nayê zanîn. Li gor ku Amberîn Zaman dinivîse, di Çileyê Pêşî yê sala 2014an de, bi handana DYAyê HKIê û Bexdayê li ser vê bingehê li hev kirin: Ji bo ku Kurd para xwe ya ji butçeye wergirin ewê rojê 550 000 varîl petrole bifiroşin şirketa netewî ya Iraqê SOMOyê. Belê piştê ev Peyman neket jiyane.
 - 4 Balkêş e, piştî destnîşankirina vê peymanê, hem muxalefata Tirkiyê û hem jî PKK bi hev re li hember derketibûn.

HKIê ev yeka ha red kir. Li gor hin nêrînan jî Îsraîl bi armanca ku ji Kurdistanê re bibe alîkar petrol dikirî (Sheppard, Reed & Raval, 2015). Bêguman firotana petrolê ya Îsraîlê Bexdayê jî acis dike, çimkî wek gellek dewletên Ereban, Iraq jî bi awayekî fermî Îsraîlê nas nake. Ji xwe eger bi Iraqê be, ewê Kurd ne petrola xwe bifiroşin û ne jî tiştêkî din bikin. Bi ser ku li gor Rêbazavahiyê Iraqê, ewê ji sedan %17ê butçeya netewî ya Iraqê ji Kurdistanê re bihata terxankirin jî, hukûmeta navendî tu car vî şertê ha sererast pêk neanî. Ji Sibata 2014an heta meha pêşî ya 2016an jî Bexdayê ji bo Kurdistanê dravdanî (payment, odeme) nekiribû û di vê demê de ji Kurdistanê re 18 milyar dolar deyndar bû (Zaman, Ocak 2016).

Bêguman aboriya Kurdistanê tenê ji astengên Bexdayê û li bazarên navnetewî erzanbûna buhayê petrole nakşîne. Pirsar penaberan jî wek barê ser bar, rewşa Kurdistanê hê xerabtir dike. Îro 1.8 milyon penaberên ku ji destê DAÎŞê ji Iraq û Sûriyeyê reviyane, li Kurdistanê stîrî ne. Nûnera Washîntonê ya HKIê Bayan Samî Rahman, gava ku qala van penaberan dike balê dikişîne ser vê xalê, *“Li Urdun û Lubnanê jî nîfûsek mezin ya penaberan heye. Belê ew wekî me bi DAÎŞê re ne di nav şer de ne.”* (Zaman, Ocak 2016).

Tirkiye ne tenê petrola Kurdistanê, herweha ji bo kîrîn û ragihandina bazarên cîhanê ya gaza sirûştî ya Kurdistanê jî hewldana xwe dajo. Bi taybetî piştî ku di 24ê Çiriya Paşîn a sala 2015an de belafira şerî ya Rûsyayê ji alî hêzên ezmanî yên Tirkîyê ve hat xistin, mesela girêdaniya Tirkîyê ya bi gaza sirûştî ya Rûsyayê ve, hê bêtir hat rojevê. Genel Enerjî ya Tirkîyê, bi armanca ku bi HKIê re xebatên xwe yên li ser pêşvebirina zeviyên gaza sirûştî hê zêdetir bike, dest bi hewldanên nû kir. Hevalbendiya Tirkîyê û HKIê ya di warê enerjîyê de, bibê nebê avakirina lûleyên xetî yên nû û embarên kewarkirinî (depolama) jî tîne rojevê. Genel Enerjî hêvî dike ku di nav du- sê salan de bingeha ragihandina gaza sirûştî ya Kurdistanê bi tevahî ava bike. Armanca ew e ku salê 20 milyar m³ gaza sirûştî ji zeviyên Kurdistanê yên ku bi qasî 300 kmyî dûr in bîne Tirkîyê. Rezervên gaza sirûştî ya ku heta niha li Kurdistanê hatine dîtin bi qasî 11 tirilyon kûbîk fit e. Tirkiye salê 50 milyar m³ gaza sirûştî dimezixîne û ji sedan %55ê vê gazê ji Rûsyayê tê (Hurriyet Daily News, April 2016). Îcar ev hevkarîya aborî, bibê nebê herdu welatan nêzîkî hevdu dike.

6. BARZANÎ Û ERDOGAN LI DIYARBEKIRÊ RÛPELEKE NÛ VEKIRIN

Pêşveçûna demajoya aştîyê têkiliyên Tirkîyê û Kurdistanê Başûr gihand radeyeke nû. Serokwezîr Erdogan, di 16ê Berfanbara 2013an de, Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî, li Diyarbekirê kir mêvan. Wê rojê li Diyarbekir, li ser hin pankartan ji bo Barzanî, *“Tu bi xêr hatî mala xwe”* û *“Bijî Serok Barzanî”* hatibû nivîsandin. Mesûd Barzanî di hatina xwe de hozanê gele Kurd ê navdar **Şivan Perwer** jî bi xwe re

anîbû. Şivan Perwer piştî 37 salên surgûn û koçeriyê, bi rûmet û serbilindî dizivirî welatê xwe. Serokwezîr Erdogan jî wek jesteke baş û xweş hunermendê navdar Îbrahîm Tatlıses bi xwe re anîbû Diyarbekirê. Barzanî û Şivan Perwer di ketina xwe ya bajêr de ji alî Wezîrê Dewletê Mehdî Eker ve hatibûn pêşwazîkirin. Bi hezaran Diyarbekirî jî, bi ala rengîn çûbûn pêşiya Barzanî. Diyarbekirê heta niha ji gellek rojên dîrokî re mazûvanî kiribû, belê ev roj rojeke cihê û dîrokî bû. Di wê roja dîrokî de Şivan Perwer şabûna xwe bi van gotinên ha dianî ziman, *“Bila dilê me hemûyan şad be. Bi armanca ku em bibin pardarê vê şahiyê em hatin. Gellek tiştên ku emê bipeyivin hene, belê emê piştîre bipeyivin. Em hatin welatê xwe. Tiştên xweş çêdibin. Ez gellek spas dikim”* (Hurriyet, Kasım 2013).

Serok Barzanî li Diyarbekir ji alî protokola dewletê ya herî bilind ve hatibû pêşwazîkirin. Wezîrê Karê Derve Ahmet Davutoglu, çûna xwe ya Amerîka taloq kiribû û ew jî hatibû Diyarbekir. Wê rojê Wezîrê Navxweyî Muammer Guler, Wezîrê Perwerdehiya Netewî Nabî Avcı, Wezîrê Ked, Çandinî û Heywankarî Mehdî Eker, Wezîra Malbatî û Siyasetên Civakî Fatma Şahin, cîgirê serokwezîr Bülent Arınç, Beşîr Atalay û Bekîr Bozdağ jî li Diyarbekir amade bûn. Ji heyeta BDPê Serokê Şaredariya Bajarê Mezin Osman Baydemir û mebûsên BDPê Sirri Sakik, Altan Tan, Esat Canan û mebûsa serbixwe Leyla Zana li balafirgeha Diyarbekir bi mebûs û wezîrên AK Partiyê re pêşwazî li Serokwezîr Erdogan kirin (Hurriyet, Kasım 2013).

Di dema şer û pevçûnê de gava ku Serokwezîr Erdogan an wezîrên dewletê dihatin Diyarbekir, şaredariya bajêr, bi armanca protestoyî gilêşên (çop) bajêr jî ji ser kûçe û kolanan nedicivandin. Li derên navendî yê bajêr qûç û lodên gilêşan çêdibûn, belê vê carê bajêr wek bûkekê hatibû xemilandin. Gava ku ji ber tengijîna trafikê çûna wesayitan hatibû ber sekinandinê, welatîyekî li ereba polis siwar bûbû, ji bo ku rê were vekirin bi Tirkî û Kurdî anons kiribû.

Erdogan di axaftina xwe ya Diyarbekir de, li ser cara pêşî hatina Mele Mustafa Barzanî ya Tirkîyê sekinî. Bê ka çawa 81 sal berê, di sala 1932an de, gava ku gund û bajarên Kurdan hatibûn bombaran kirin, ew ji Iraqê reviyabû û ji ser Şemzînanê ve ketibû Tirkîyê. Di vê hatina xwe de Mele Mistefa Barzanî tirsîyabû ku Tirkîye wan di dar de (îdam) bike, belê muameleyek gellek baş û mirovî bi wan re hatibû kirin. Erdogan bi jêgireke (referans) ji Qadî Mihemed, ji dîndarî, dilsozî û durustîya Mele Mistefa Barzanî qal kiribû û jê re siyanet girtibû. Serokwezîrê Tirkîyê axaftina xwe weha domandibû, *“Ez îro jî kurê Mele Mistefa, dostê xwe yê hêja Mesût Barzanî li Diyarbekir dikim mêvan. Tu jî wek bavê xwe û apên xwe, bi xêr hatî axa birayên xwe û welatê wan Tirkîyê; tu bi xêr hatî bajarê me Diyarbekir. Ez bi hezkirin silav li we û di şexsê we de, li birayên xwe yê li herêma Kurdistanê ya bakûrê Iraqê dikim”* (Mynet, 2013).

Pêşveçûna têkiliyên Tirkîyê û Kurdîstana Başûr, di helwesta Tirkîyê ya li hember avakirina dewleta Kurdî nermbûneke berbiçav çêkiribû û tirsî Tirkîyê ya dîrokî şikandibû an jî gellek qels kiribû. Hê gava ku demajoya aştiyê li dar bû, rojnameya Frankfurter Allgemeine Zeitung, ji Serokwezîrê Tirkîyê Ahmet Davutoglu pirseke weha kiribû: “Li Kurdîstana Iraqê ji bo dewleta serbixwe şivakek vedibe. Gelo ev yek ji bo Tirkîyê xeterekê bi xwe re tîne?” Ahmet Davutoglu ev pirsî ha weha bersivandibû: “Kurdîstana serbixwe ne ji bo Tirkîyê, belê ji bo îstikrara herêmê dikare xeterekê bi xwe re bîne. Gava ku sînor biguherin, wê pevçûn û gengeşiyên nav dewletan zêde bibin. Çêtir e ku sînor wek xwe bimînin” (Îlke Haber, 2015).

7. PIRSA SEXWEBÛNÊ Û SÊ DÎNAMÎKÊN BINGEHÎN

Di nav astengên li pêş serxwebûna Kurdîstanê de, mesela aborî jî cihêkî girîng digire. Têkiliya Kurdan a fermî ya bi Bexdayê re, çareserkirina pirsên aborî hê bêtir tevlihev dike. Berî her tiştî, eger ku Kurdîstan serbixwe bûya, hingê Kurdan dikaribûn ji Netewên Yekbûyî alîkarî bixwestana, ji saziyên wek IMF û Banka Dinyayê deyn bîstandina, heta bono û tehwîlên xwe derxistana. Belê Kurd jî vê yekê jî bêpar in; çimkî dewleteke wan a serbixwe tune.

Serokê Kurdîstanê Mesûd Barzanî bi salan e ku doza Kurdîstaneke azad û serbixwe dike. Belê di pirsî serxwebûnê de sê dînamîkên bingehîn dertên holê. 1) Dînamîkên navxweyî, 2) Dînamîkên herêmî, 3) Dînamîkên navnetewî. Bêguman ev hemû hêman û dînamîkên ha bandora xwe li ser hev nişan didin û carna dikevin nav hevdû jî.

7.1. Dînamîkên Navxweyî

Raya giştî ya gelê Kurd, partiyên siyasî, civaka bajarwer (sivîl society), hêza rêxistinî, bireweriya netewî (şûra netewî) û hêmanên aborî dînamîkên navxweyî pêk tînin. Çaxê ku ahengeke netewî pêk hat, hingê bi çêkirina referandûmekê dînamîkên navxweyî dikarin ji bo serxwebûnê bîn amadekirin. Bi ya min dînamîkên navxweyî, di riya bîdestxistina serxwebûnê de rolekî bingehîn dileyîzin. Terk û derzên dînamîkên navxweyî di riya avakirina dewleteke serbixwe de, destê hêza serxwebûnxwaz qels dikin. Gava ku hin partiyên Kurdan di vê yekê de dudilî man an şewişîn, hingê kar bêtir zehmet dibe. Çimkî yekîtiya navxweyî û siyaseteke bi biryardarî, ji bo amadekirina dînamîkên din jî pêwîst e. Îcar çaxê ku em ji nêzîk ve li dînamîkên navxweyî dinerin, dîmenê xuyayî biryardariyeke yekpare nişan nade. Çimkî car bi car hin partiyên Kurdan li hember serxwebûnê dertên û ev yek destê Kurdan bi her awayî qels dike. Mesela serokê Tevgera Goranê Noşîrvan Mistefa, heta niha ji bo serxwebûna Kurdîstanê peyameke xurt neda û di hin beyanên xwe de li hemberî serxwebûnê helwest girt. Noşîrvan Mistefa cara paşî di 27ê Tîrmeha 2016an de jî got ku: “Gava ku parlamento girtî be û di

hukûmetê de derz hebin em nikarin referandûm û serxwebûnê bipeyivin. Gel vê yeka ha qebûl nake” (Rudaw, 07.2016).

Helwesta YNKê û Goranê ya li hember serxwebûnê, ji alî siyasetmedarên Iraqê ve jî wek helwesteke li dijî serxwebûnê tê nîşandan. Serokwezîrê Iraqê yê kevin Nûrî el Malikî, ji ajansa fermî ya Îranê re diyar kir ku: *“Tu armancek YNKê û Goranê ya serxwebûnê û ji Iraqê veqetandina Kurdîstanê tune. Ev herdu partî jî tenê dilê Partiya Demokrat a Kurdîstanê (PDKê) xweş digirin û dizanin ku ev mesele heta dawiyê naçe*” (Amed Today, 2016).

Li gel YNK û Goranê, car bi car PKK jî beyanên li dijî serxwebûna Kurdîstanê dide. Hevserokê KCKê Cemîl Bayik, di hevpeyvîna xwe ya ku bi rojnameya Îngilîz The Guardianê re çêdike, li hemberî parvebûna Iraqê disekine û weha dibêje: *“Eger Irak parve bibe wê şer hê giran bibe û gefên komên biçûk ên wek DAÎŞê zêdetir bibe. Belê gava ku li hemberî DAÎŞê bûn yek, hingê ewê cihêtiyên navbera wan di pêşerojê de bi riyên diyalogê çareser bibin*” (Hawramy, 2014). Bi vê helwesta xwe Bayik, doza Kurdan a avakirina dewleteke serbixwe bi qasî şerê li hemberî DAÎŞê jî stratejîk nabîne. Ya rast tene du-sê sal e ku DAÎŞ heye, belê Kurd sed sale ku doza dewletbûnê dikin. Endamê Komîta Rêvebirî ya KCKê Dûran Kalkan jî demekê berê diyar kir ku ew li hember serxwebûna Kurdîstanê ne û li dijî parvekirina Iraqê ne. Kalkan di heman peyama xwe de got ku: *“Em li Iraqê li hember navendibûnê û perçekirinê biçûk in jî, em vê yekê rast nabînin. Em serxwetiya (autonomy) demokratîk ji bo gelan bi kêr dibînin*” (Kalkan, 05,2016).

Bibê nebê mirov difikire, bê gelo rêvebirên PKKê nizanin ku serxwetî (otonomî) bi huqûqa navxweyî ya dewletan pêk tê? Eger hêza gelekî hebe û mercên navnetewî jî kêm zêde amade bin, hingê ew gel dikare raste rast serxwebûna xwe îlan bike, belê herçî serxwetî bi guhartin û pergaldana huqûqa navxweyî pêk tê (Kiran, 2016). Bi ser de îro hem li Iraq û hem jî li Sûriyê serxwebûna Kurdan, ji anîna demokrasiye ya bo van welatan hê rihettir û hê hêsantir e. Tê bêjî van beyanên berpirsiyarên PKKê têr nakin, car bi car hemserokê PYDê Salih Muslim jî li hember dewleta Kurdî dertê û “şîret” li Kurên Başûr dike, da ku serî li ber serweriya Bexdayê deynin (Basnews, 06, 2016). Ya rast ravekirina (îzaha) vê belengaziya siyasî jî gellek zehmet e.

Gava ku partiyên Kurdan bi xwe mesela serxwebûnê wek pirseke netewî nebînin û daxwaza serxwebûnê bikin qurbana siyaseta navxweyî, hingê Kurd nikarin di mesela azadî û serxwebûnê de piştgiriya dinyayê jî bistînin.

7.2. Dînamîkên Herêmî

Dewletên cîran û dewletên derdora wan dînamîkên herêmî pêk tînin. Dewletên cîran berî çend salan Îran, Irak, Sûriye û Tirkiye bûn. Îro jî li ser kaxiz dîsa ew xuya dikin; belê em dizanin ku ji her çar dewletan bandorek zêde ya Irak û Suriyê nema-

ye. Loma gava ku ji dînamîkên herêmî tê qalkirin, ji cîranên nêzik û hemsînor Îran û Tirkiye tèn bîra mirov. Di pîrsa serxwebûnê de hewlwesta van herdu aktorên sereke girîng e. Ji herdu dewletan, herçî Îran e helwesta wê kêma zêde tê zanîn. Ji roja rojîn ve Îran dewleteke Kurdan ya serbixwe ji bo hebûn û yekîtiya xwe wek gefekê dibîne û bi tu awayî naxwaze ku qebûl bike. Piştî hilweşîna rejîma Baasê û Saddam Huseyîn Iraq û piştî Bihara Ereban ji Sûriye, hema bejê bi tevahî ketin bin destê Îranê. Bi taybetî di siyaseta xwe ya derve de, Bexda û Şam îro bûne wek du Satrabên (walîtiyên) dema Împaratoriya Persan (Kiran, 07.2014). Ji destpêka belavbûna Îslamê ve, hema bêje ji hezar salan vir ve ye, ev cara yekem e ku Bexda û Şam bi vî cûreyî dikevin bin bandora Îranê⁵. Rastî eve ku îro Îranê, 500 sal piştî Qanûnî Sultan Silêman cardin Bexda kiriye destê xwe. Loma herçiqas Iraq û Sûriye ji pertav ve (ji hêzê) ketibin jî, di pîrsa serxwebûna Kurdistanê de, Îran li ser navê wan tev digere. “Erê” an “Na” ya Îranê li ser navê Sûriye û Iraqê ye jî.

Herçî Tirkiye ye, di pîrsa serxwebûna Kurdistanê de heta dema nêzik ew jî kêma zêde wekî Îranê difikirî û îlankirina dewleta serbixwe wek xetere sor a siyaseta xwe ya derve didît. Mesela di 16ê Gulana 2001an de, di rojnameya Hurriyetê de, nivîsek di sermanşetê de çap bû, ku li binî destnîşana(îmza) serokwezîrê wê demê Bulent Ecevît hebû. Heman nivîsa ku li serê “bi dizî” û “zûbizû”(acil) hatibû nivîsîn; Wezareta Derve, MÎT û Sekreteriya MGKê tê de, ji heşt avahiyên dewletê yên stratejîk re hatibû şandin û di nivîsê de hatibû diyarkirin ku “*li Bakûrê Iraqê îlankirina dewleta Kurdî ji bo me casus belli ye*” (sedemê şer e). Di danezanê de weha dihat nivîsandin: “Li Bakûrê Iraqê ji bo me senaryoya ku ewê bi tu awayî neyê qebûlkin, îlankirina dewleteke Kurdî ya serbixwe ye. Deklarasyoneke bi vî cûreyî ji alî me ve sedemê têkilbûnê(mudaxalê) hatiye hesabandin” (Hurriyet, 05, 2001). Di nav salan de beyanên bi vî cûreyî, bi sedan caran di rojnameyan de cih girtin.

Îro eger ji herdu cîranan, ji Îran û Tirkiyê yekê piştgirîya avakirina dewleta Kurdî ya serbixwe bikira û DYAyê jî ji vê rewşê re “lamba kesk” pêxista, hingê karê

5 Xelîfe Ebu Cafer el- Mansur, di sala 762an de, navenda xelîfetiya Îslamî ji Şamê bar kir Bexdayê û ji wê rojê heta dema Saddam jî bajarê Bexdayê wek navendeke Sûnnî ma. Bi têkilbûna Îranê, di dîrokê de çend caran Bexda ket destê Misilmanên Şîî, belê hergav jî Tirk û Kurd li hember vê yekê sekinîn û bi şer û pevçûn bajêr ji destê Şîiyan hat derxistin. Di dîrokê de cara de pêşî Bexda di sala 954an de ket destê Şîiyan Buweyhî û bi qasî sed salan di destê wan de ma. Sed sal bi şûn de Sultanê Selçûkî Tugrûl Beg, di sala 1055an de Bexda ji wan stand. Di sala 1258an de Mogolan Bexda dagir kir, belê dîsa bi saya Kurd û Tirkan, li Misilmanên Sûnnî hat zivirandin. Di sala 1508an de vê carê Safeviyên Îranî Bexda dagir kirin, belê di sala 1534an de Qanûnî Sultan Silêman, bajar ji destê wan stand. Şaîr Fûzûlî, ji alî Qanûnî ve girtina Bexdayê bi van rêzên xwe tîne ziman: “Girdi burcu evliyâya pâdişah-i nâmdâr”(Kete birca ewliyayan padîşahê navdar). (Dûrî, Îslam Ansiklopedisi, Diyanet Yayinlari).

îlankirina dewletê hêsan dibû (Zaman, 2015). Dîsa jî rewş çî dibe bila bibe helwesta herdu welatan ne yek e. Di nav salan de guherînek dîtbar (berbiçav-concert) di helwesta Tirkiyê de çêbû. Eger demajoya aştiyê li Tirkiyê şikest nexwara, îro wê nêrîna Tirkiyê hê gellek çêtir bûya.

Helwesta Tirkiyê ya li hemberî Kurdistanê serbixwe bi taybetî di çaxê demajoya aştiyê de guherîneke xuyayî nîşan da. Cîgirê Serokê Giştî û Berdevkê AK Partiyê Huseyin Çelik, di Hezîrana 2014an de li ser pira serxwebûna Kurdistanê beyaneke bi vî cûreyî da: “*Mixabin ji ber siyasetên şaş, îro Irak di nav xwe de wek sê perçeyan xuya dike. Em tu car naxwazin, belê gava ku Iraq bi awayê resmî parve bibe, wek hemû gelên Iraqê mafê Kurdên Bakûrê Iraqê jî heye ku di derbarê pêşeroja xwe ya siyasî de biryar bidin.*” (Çelik, 2014).”

Tê zanîn ku li Tirkiyê, di nav partiyên siyasî de ya ku herî zêde “dijberî Kurdan” xuya dike û siyaseteke Tirkpersetî dimeşîne MHP (Partiya Tevgera Neteweparêz) ye. Bi demajoya aştiyê re di helwesta MHPê (Partiya Tevgera Neteweparêz) de jî nermbûnek berbiçav xuya dike. Beriya ku demajoya aştiyê şikest bixwe û kar cardin têkilî hevdu bibin, Nûnerserokê Koma MHPê Yusuf Halaçoğlu di hevpeyvîna xwe ya bi radyoya DWê re weha dibêje: “*Li bakûrê Iraqê dewleteke ku bi awayê fiilî likar e heye. Li wir mercên dewletê pêk hatine. Loma em wek partî bi serê xwe yekîtiya axa Iraqê biparêzin jî bi tena serê xwe wateyekê îfade nake. Di encamê de, di pîrsa naskirin an jî nasnekirina serxwebûnê de hukûmet xwedan desthilatî ye. Helwesta wan a li ser vê yekê jî kifş e.*” Halaçoğlu di heman hevpeyvînê de diyar dike ku ewê îlankirina dewleta Kurdî li Tirkiyê înfialekê çeneke (Duran, 2014).

Demajoya aştiyê partiyeke wekî MHPê jî sist kiribû û anîbû radeya qebûlkirina dewleta Kurdî. Piştî ku dawî li demajoya aştiyê hat, helwesta gelê Tirk a li hember avakirina dewleta Kurdî ya serbixwe ber bi nebaşiyê ve guherî. Şirketa Lêkolînî û Şewirmendî Optimar, li 26 bajarên Tirkiyê, li ser 2037 kesên anketek çêkir, ku pîrseke wê jî li ser serxwebûna Kurdistanê ye. Şirketê vê pîrse jî beşdarên ankete dike: “*Irak û Sûriye parve bibin û Kurdistanê serbixwe ava bibe (Kurd serxwebûna xwe îlan bikin), divê Tirkiye li hember vê rûdanê çî bike?*” Ji % 37,6ê beşdaran dibêjin, “*divê bi riyên dîplomatîk bê tevgerkirin û ev biryar neyê qebûlkirin,*” ji %33,1 “*eger pêwîst be divê mudaxaleyeke leşkerî bê kirin û ev biryar neyê cih,*” ji 13,1, “*avahiyên navnetewî çawa tev bigerin divê Tirkiye jî wusa bike,*” ji % 7,9 “*divê Kurdistanê serbixwe bê naskirin û destekkirin*” dibêjin. Serokê Lijneya Rêvebirî ya Optîmarê Hilmî Daşdemîr diyar dike wan çar çaran ev anket çêkiriye (Bitlisname, 2016).

Ji dewletên herêmê, ya ku herî zêde li dijî avakirina dewleta Kurdî ye û her gav bi tûndî li hember vê yekê dertê Îran e. Çaxê ku Wezîrê Edaletê yê Îsraîlê Ayelet Şaked di beyaneke xwe de got: “*Divê di navbera Tirkiyê û Îranê de Kurdistanê ava*

bibe” vê yekê Îranê gellek acis kir. Alî Ekber Velayetî yê ku 16 salan Wezîrê Karê Derve yê Îranê bû, bi vî awayî bersîva Ayelet Şaked da: “*Rejîma siyonîst dixwaze li herê mê Îsraila dududyen, Îsraila sisiyan ava bike.*” Velayetî axaftina xwe bi vî awayî berdewam kir: “*Dijminên Îslamê bi awayekî xwezayî gotinên weha dikin. Em bawer in ku ewê Tîrkiye jî destûr nede vê yekê. Ewê rejîma Siyonîst tu car negihîje vê armanca xwe*” (Viagazette, 2016).

Bi ser ku tîkiliyên Îran û Îsrailê beriya Şoreşa Îslamî gellek baş bûn, piştî şoreşê Ayetullah Xumeynî Îsrail wek dijminê Îslamê îlan kir. Moshe Arens yê ku demekê Wezîrê Karên Derve yê Îsrailê bû li ser tîkiliyên herdu welatan weha gotibû “tîkiliyeke me ya tekûz bi Şahê Îranê re hebû, belê di şevê de xera bû” (Gresh, 1998). Li gor Humeynî Amerîka “**Şeytanê mezin**” Îsrail jî “**Şeytanê biçûk**” bû (Galbrith, 2006). Kifş e ku di dijminatîya Îranê ya li hemberî Îsrailê de, helwesta Îsrailê ya li hember doza gelê Kurd jî rolekî girîng dileyize.

Ji wezaretê Karên Derve yê Îranê, Husên Emîr Ebdulahiyan jî diyar kir ku “*Îran bi her awayî li hember perçebûna Iraqê ye*” (Îlke Haber, 2016). Li gor Ajansa Nûçeyî ya Fars, Berdevkê Wezîrê Karên Derve Huseyîn Cabirî Ensarî, li ser hevdiñtinên Mesrûr Barzanî yên di derbarê Kurdîstana serbixwe de weha dibêje: “*Serxwebûn û yekîtiya axa Iraqê hem ji bo berjewendiyên gelê Iraqê û hem jî ji bo berjewendiyên herê mê û dinyayê garantiyek e*” (Cumhuriyet, 2016).

7.3. Dînamîkên Navnetewî

Di huqûqa navnetewî de karê naskirina dewleteke serbixwe tiştê herî zor, aloz û zehmet e. Çimkî di naskirinê de, siyaseta, huqûqa navxweyî û huqûqa navnetewî tîkilhev in û bi hev re dimeşin. Gava ku kar hat ser naskirin an nasnekirina dewletekê, pirrê caran ne pîvan û krîterên rêbazî û huqûqî, bele pîvan û krîterên siyasî derdikevin pêş, Naskirina dewleteke nû, wê dewletê wek endamêkî civata navnetewî qebûlkirinê bi xwe re tine. Di dîrokê de nimûneya herî pêşî ya naskirina dewletekê, ji alî Îspanyayê ve naskirina Hollandaya Yekbûyî ye. Gava ku Hollandaya Yekbûyî di sala 1581an de serxwebûna xwe îlan kir, nêzikî sed sal bi şûn de, di sala 1648an de Îspanyayê serxwebûna wê qebûl kir. Di warê naskirinê de nimûneya herî navdar, devjenîya Fransa û Îngilîstanê ya li ser naskirina Amerîka bû. Wê gavê Brîtanyayê digot ku “heta ku ji alî dewleta ku li ser axê serwer e neyê naskirin,” tu dewletek nikare bi riya şer, pevçûn, serhildan an şoreşê bê avakirin. Belê Fransa li dijî vê ramanê bû û li gor Fransayê tiştê herî esasî çalakbûnî û tîra xwe kirinî (effectiveness) bû. Di naskirina dewletan de, helwesta Fransayê di sedasa 19an de wek prensîbek navnetewî hat qebûlkirin (Malanczuk, 1997:82).

Gava ku ji naskirina dewletekê tê qalkirin, li ser du cûreyên naskirinê tê rawestîn: naskirina de jure û naskirina de defacto. Belê pirrê caran ev herdu tîgih tên

tevlîhevkerin an bi şaşî tîn bikaranîn. Çimkî de jure naskirin tê wateya naskirina hukûmeteke de jure. Ji ber ku peyvên de jure û de facto, salixê hukûmatê didin, karê naskirinê nahewînin. Carna tê gotin ku dewletek tenê dikare bi awayê de jure bê naskirin, belê çend nimûne hene û nîşanî me didin ku dewlet dikarin bi awayê de facto jî bîn naskirin. Mesela Endonezya, di navbera salên 1945 -49 an de, hê gava ku şerê xwe yê serxwebûnî li hember Hollandayê dida, ji alî çend dewletan ve hat naskirin. Dîsa nimûne hene ku dewlet carna bi awayekî de facto serweriya hin dewletan ya li ser hin welatan qebûl dikin. Gava ku di sala 1940an de Yekîtiya Sovyetê, Estonya, Letonya û Latviya bi ser axa xwe ve berda, hingê Brîtanyayê ev yek bi awayê de facto qebûl kir. Cihêtiya herî girîng a navbera naskirina de jure û de facto de ev e: Eger dewletek bi awayê dejure nehatibe naskirin, hingê pirsên wê yên huqûqî yên bi dewletên din re nikare bê çaresekirin. Çimkî bi awayê de facto naskirina wê têra ve yeke nake (Malanczuk, 1997:88).

Di pirsê serxwebûna Kurdistanê de helwesta civata navnetewî û bi taybetî dewletên ku di Konseya Ewlekarî ya Netewên Yekbûyî de cih digirin (DYA, Çîn, Rûsya, Fransa û Îngilistan), gellek girîng e. Çimkî îro gava ku dewletekê serxwebûna xwe îlan kir û xwest ku bibe endamê Netewên Yekbûyî, pêşî divê endamên herdemî yên Konseya Elekarî wê dewletê pêşniyazî Meclîsa Giştî bikin û Meclîs daxwaza endambûna wê bibe dengdanê (UN Charter). Di hevpeyvîneke xwe ya bi televizyona Al Jazeera re, Mesûd Barzanî li ser helwesta Amerîka û Ewrûpa ya di derbarê serxwebûnê de weha dipeyive, *“Ew rewşa Kurdan û rastiyan fêm dikin. Belkî di derbarê dema referandûmê de cihê bifikirin û fikrên xwe binin ziman, belê tu aliyek ne li dijî serxwebûna gelê Kurd e”* (Barzani, 04, 2016).

Herçiqas dewletên mezin di pirsê serxwebûna Kurdistanê de, zêde rengê xwe kifş nekin û Amerîka vê yekê ji bo îro zû bibîne jî, dewletên Ewrûpa yên demokrat, bi taybetî welatên Skandînavya û Îsraîl di her fersendê de piştgirîya xwe ya ji bo dewleta Kurdî ya serbixwe tînin ziman. Serokwezîrê Îsraîlê Benjamin Netanyahu di sala 2014an de got ku *“Kurd miletek şervan in û mafê wan heye ku xwedî serxwebûna siyasî bin”* (Bitlisname, 02, 2016). Serokê Îsraîlê Simon Peres jî di Hezîrana 2014an de ji serokê Amerîkayê Barak Obama xwest ku piştgiriyê bidin Kurdistanê demokrat û serbixwe. Sefîrê Îsraîlê yê Li Waşîntonê Ron Dermer, di beyaneke xwe ya ji televizyona Kurdistan24ê re diyar kir ku Tel Avîv gelê Kurd li Rojhilata Navîn ji bo xwe dost dibîne û daxwaza Kurdan ya dewleta serbixwe diparêze (Ekurd, 05, 2016).

Di bihara 2015an de, serokê Kurdistanê derket gerra Ewrûpa û li rawesta xwe ya pêşî Macarîstanê, bi serokwezîr Viktor Orban re civînek pêk anî. Piştî civînê, gava ku herdu serok derketin pêş kameryan, Victor Orban li ser pirsê peyamnêrê

Rûdawê weha got: “*Macarîstan wê alîkariya her gelên ku dixwazin serbixwebûna xwe bi dest bixin bibe. Li ser vê bingehê emê herêma Kurdistanê jî biparêzin. Bi ser ku Kurdistan niha serbixwe nîne jî, di şerê li hemberî terorê de nûnertiya cîhanê dike*” (Îlke Haber, 05, 2015).

Gelo ewê helwesta dewletên Ereb ya li hemberî Kurdistaneke serbixwe çawa be? Ewê hemû bi hev re tevger bikin an ku ewê helwesta her yekê ji wan cihê be? Mirov dikare weha jî bipirse: Gelo ewê Yekîtiya Ereban di pirsra Kurdistanê serbixwe de xwedî biryar be an ku wê her dewlet li gor rewşa xwe biryar bide? Ez bawer im ewê di vê pirsê de her dewleta Ereb bi serê xwe, li gor rastiya xwe siyasetekê kifş bike. Ji xwe Pirraniya dewletên Ereba Mexreb, bi pirsra Kurdistanê re zêde têkildar nînin (Dunn, 2015). Beriya Bihara Ereban, car bi car serokê dewleta Lîbyayê Muammer Qadafi, piştgiriya xwe ji bo dewleta Kurdî dianî ziman, belê piştî ku ew ji desthilatiyê hat xwarê, Lîbya di nav xwe de tarûmar bû niha tenê bi derdê xwe re bilî ye.

Îcar îro di reşa heyî de, di nav dewletên Ereban de jî, wê bi taybetî giraniya çend heban hebe: Misir û Suûdî Erebiştan. Herçiqas Serokê Misirê Abdulfetah el Sîsî, li hember Kurdistaneke serbixwe be jî (Sisi, 07, 2014) piştî Bihara Ereban, ji ber serêşanên navxweyî zêde giraniyê Misirê nema. Belê herçî Suûdî Erebiştan e, her ku diçe li herêmê giraniya wê zêde dibe û îro di nav dewletên Ereban de, tenê ew li hember siyaseta Îranê ya mezhebî tekoşinene bêeman dimeşîne. Di serî de Suûdî Erebiştanê û Kuveyt, ji bo hemû dewletên Xelîca Faris, tiştê herî girîng pêşî li belavbûna Îranê girtin e (Dunn, 2015). Eger dewleta Kurdî ya serbixwe, rê li ber belavbûna Îranê bigire û siyaseta Îranê ya mezhebî qels bike, hingê ewê Suûdî Erebiştan piştgiriya dewleta Kurdî bike. Hin kes dibêjin ku ewê Suûdî Erebiştan ji ber ku desthilatiya Îranê ya li ser Iraqê zêde nebe, ji Kurdistanê serbixwe re nebêje “erê” (Uslu, 2013). Belê ev nêrin bi tevahî pûç û şaş e. Çimkî tenê Kurdistaneke serbixwe dikare pêşî li siyaseta mezhebî ya Îranê bigire û bi her awayî destê wê qels bike.

Di encamê de civata navnetewî belkî piçekê bi giranî tev digere, bele em dibînin ku hêdî hêdî rastiya gelê Kurd dinase û her ku diçe bi çavekî hê çêtir li Kurdan dinêre. Li gor raporeke ku di Temûza 2014an de ji alî Rûdawê tê weşandin, Amerîka, Îngilîstan, Fransa, Îtalya, Tirkîye, Urdun, Kuveyt û Emîrata Yekbûyî ya Ereban, li îlankirina Kurdistaneke serbixwe germ dinerin. Herçiqas bi aşkerayî ney-ne ziman jî, Yekîtiya Ewrûpa jî ne li dijî Kurdistaneke serbixwe ye. Di lêpirsîneke gelwarî (opinion poll) de, ji Kurdên Başûr tê pirsîn, bê ka gelo di pirsra serxwebûna Kurdistanê de baweriya wan herî zêde bi kîjan dewletê tê? Encam bi vî awayî ne: Ji %56,3 Îsrail, ji %8,2 Tirkîye û ji % 4 Amerîka (Bengio, 2014). Balkêş e ku vê demê baweriya Kurdan, ji Amerîkayê bêtir bi Tirkîyê tê.

8. DAÎŞ: GEF Û FERSENDÊN LI PÊŞ KURDISTANA IRAQÊ

Di 6ê Hezîrana 2014an de hêzên DAÎŞê, li nêzikî Mûsulê bi hêzên ewlekarî yên Iraqê re ketin nav şer û li başûrê bajêr, bi lebateke xwekujî li navenda îstixbaratê ya el-Qahîre xistin. Di 7ê Hezîranê de, herêma Yermûkê tê de, li hin taxên bajêr elektrîk hat birrîn. Di 8ê Hezîranê de, li bakûrê rojhilatê bajêr şer geş bû. Di 9ê Hezîranê de nexweşxane û avahiya hukûmetê ya Nînovayê ket destê DAÎŞê, Waliyê Nînovayê Ûsemma Nûceyfi banga seferberiyê li gel kir. Di 10ê Hezîranê de balafirgeha Mûsulê ket destê DAÎŞê û bi alîkariya Artêşa Neqşibendî ya Mûsulê, seranserê bajêr ket destê DAÎŞê. Serokwezîrê Iraqê Nûrî el Malikî ji parlamentoyê xwest ku rewşa awarte bê îlankirin (Hurriyet, 07, 2014). Di 11ê Hezîranê de ji Mûsulê 500 hezar kes reviyên, ji nav wan 300 hezar kes hatin herêma Kurdistanê. Hingê hukûmeta Kurdistanê 30 hezar pêşmergeyî şand ser sînorê Mûsulê û 20 hezar pêşmerge jî li herêma Kerkûk û Germiyanê hatin bicihkirin. Bajarê Tikrîtê, ku wek welatê Saddam Huseyîn jî tê naskirin ket destê DAÎŞê û DAÎŞ nêzikî bajarê Samarayê bû, ku tenê 110 km ji Bexdayê dûr bû. Di heman rojê de DAÎŞê li Mûsulê girt ser konsoloxaneya Tirkiyê û 49 xebatkarên konsoloxanê rehin girt. Di 12ê Hezîranê de pêşmergehên Kurd tevahiya Kerkûkê kirin destê xwe (Aljazeera Tur, 07, 2014).

Çavê her kesî li ser bû, bê ka gelo ewê piştî Mûsulê DAÎŞ berê xwe bi kîjan aliyê ve bike û vê carê kuderê bistîne. Li ber DAÎŞê du rê hebûn:

- 1) Bi ser Bexdayê ve girtin û dawî li desthilatiya hukûmeta Malikî anîn.
- 2) Ber bi Kurdistanê ve firehbûn.

Gava ku rewşa artêşa Iraqê û pêşmerge dihat rûbirûkirin, hingê kesî texmîn nedikir ku ewê DAÎŞ berê xwe bi aliyê Kurdistanê ve bike û li gel artêşa Iraqê pêşmerge jî ji xwe re bike dijmin.

Hê mehek di ser dagirkirina Mûsulê re derbas nebûbû, DAÎŞê berê xwe bi aliyê Kurdistanê ve kir û di sisiyê Tebaxa 2014an de vê carê Şengalê dagir kir. Hêzên pêşmerge yên ku Şengalê diparastin bi şûn ve vekîşîn, herêma Şengalê ket destê DAÎŞê, bi deh hezaran Kurdên Êzîdî hatin kuştin û dîl girtin. Piştê Şengalê DAÎŞê berê xwe da Mexmûrê, li ser Erbil û Kerkûkê gefeke mezin pêk anî. Di serî de Kurd, hemû dinya li ber vê hêz û hovîtiya DAÎŞê şaş û mat mabûn. Gelo çima û bi çi awayî pêşmerge sengerên xwe berdabû û ji ber DAÎŞê reviyabû? Bi ya min çend sedemên girîng ên vê yeke hebûn:

- 1) Pêşmerge bi tu awayî hêvî û goman nedikir ku ewê DAÎŞê êrişê bîne ser axa Kurdistanê.
- 2) Pêşmerge bi giranî di warê êrşkirinê û bi şûn de vekîşînê de xwedî tecrûbe bû, di pîrsa parastina derekê de ne ewqas pîspor bû.

3) Hema bêje 15 sal bû ji şer û rastiya şerê gem dûr bû; wek hêzeke ku her gav di nav şer de ye têra xwe neçeliqandî û amade bû.

4) Di qada fermandarî de bêpergalî û kêmasiya motîvasyonî hebû.

5) DAÎŞa ku ji sêyeka axa Iraqê û ji sêyeka axa Sûriyeyê kiribû destê xwe, bi qasî dewleteke mezin xwedî çek û muhîmat bû; bi çekên herî modern û pêşketî rapêçayî bû.

6) Hukûmeta Malikî tam 8 meh bû ku ji butçeyê para Kurdistanê nedida û ji ber ambargoya Bexdayê hukûmeta Kurdistanê nikaribû ji bo pêşmerge çekên modern û pêşketî bikire an bi dest bixe (Kiran, 2016).

Gelo êrişa DAÎŞê ya li ser Kurdistanê, ji bo Dewleta Îslamî biryarek rast û stratejîk bû, an ku DAÎŞê şaşiyek mezin a stratejîk kiribû? Gava ku DAÎŞê, hem li Iraq û hem jî li Sûriyeyê şengehên ku nifûsa Sunnî li ser rûniştibûn, bi pirranî kiribû destê xwe, li ber wê du rê diman:

1) Piştî Mûsulê ber bi Bexdayê ve firehbûn.

2) Ber bi Kurdistanê ve firehbûn û radeskirina çavkaniyên enerjîyê.

Çawa ku me berê jî bal kişand ser, DAÎŞê biryara xwe li ser firehbûna ber bi Kurdistanê ve da. Gelo çima ne Bexda, belê Kurdistan? Li vir jî sê sedemên bingehîn dertên pêşberî me:

1) Ji ber tunebûna dewlata Kurdî, axa Kurdan, wek axeke bêxwedî (no man land) tê hesibandin û her kî bistîne jê re dimîne.

2) Li ser axa Kurdan, neqebekê li Deryaya Spî vekirin.

3) Ji ber neteweperestiya Ereban, girtina Bexdayê armançek bingehîn ê dema nêzîk nehesibandin.

Van hersê sedemên bingehîn berê DAÎŞê bi ser Kurdistanê ve kir. Çimkî herçiqas rêxistineke teror û hovîtiyê be jî, staratejiyek siyasî ya DAÎŞê hebû. DAÎŞ bi rê, rêgeh û refleksên îdeolojiya Baasê tevger dike. Zimanê Baasê yê “çepgir” û “sosyalîst,” bi îdeolojiya DAÎŞê re cihê xwe ji “**cîhada Îslamî**” û “**pergala Şerîetî**” re hêştîye (Kiran, 2016). Baasê her cûre tovbirî (jenosîd, soykirim) û hovîtiya xwe bi nasnama xwe ya çepgirî û Sosyalîstî dinixamt, DAÎŞ jî heman rêgehê (metodê) bi şarik û xêliya Îslamî dike. Îro ji her 40 fermandêrên leşkerî yê DAÎŞê, 25 kesên wan berê di artêşa Saddam de serbaz (subay) bûn (Munir, 2016). Teror, kuştin, hovîtî, tovbirî (genoside) û bi şikenceyên nedîtî kuştina mirovan, ji hesabê siyasî yê DAÎŞê re xizmet dikin. Bi gotina kurt DAÎŞê ev hovîtî tenê ji bo “kêfê” nedikir. Her cûre hovîtî bi armanca siyasî dihat kirin. Herçiqas DAÎŞê siyaseta cîhada herheyî (ebedî, berdewamî) dabe ber xwe jî, hedefên wê yê dema nêzîk, dema navîn û dema dirêj hebûn. Armanç, ango hedefên DAÎŞê:

Hedefê dema nêzîk ev bû: Li axa Iraq û Sûriyê ya ku bi pirranî Sûnnî niştêcih in, pêşî dewleteke Îslamî ya Sûnnî avakirin.

Hedefê dema navîn: Ber bi dewletên Îslamî yê din ve firehbûn û hemûyan di bin banê Xelîfetiye de civandin.

Hedefê dema dûr: Ji **Darûl Îslamê** ber bi **darûl harbê** ve firehbûn. Di dema dûr de ewê pêşî cihên wek Endulusê yê ku demekê Misilman bûne bihatana girtin û li ser wê bingehê fireh bibûna (Kiran, 2016).

Eger DAÎŞê berê xwe bi alî Kurdistanê ve nekira û rast bi ser Bexdayê ve biçûya û piştî ku Bexda sitand, ne ber bi aliyê axa Ereben Şîî û ne jî bi aliyê axa Kurdan ve li firehbûnê negeriyaba, wê gavê dinya ewqas jê re nedibû dijmin. Ji ber ku Bexda jî berê ve wek bajarek Sûnniyan dihat hesabandin, dibû ku rastî berrabûneke (reaktion) xurt nehata. Heta DAÎŞê di rewşeke weha de ne tevahiya bajarê Bexdayê, belê nivê wê yê ku bi pirranî Sûnnî lê niştêcih in bîstada, hingê ewê kirina wê jî alî dewletên wek Tîrkiye û Sûûdî Erebişatanê ve jî rast bihata dîtin. Li herêma, ji ber ku Sûriye têk çûye, wê gotina wê “pere” nekira, belê herçî Îran e, wê bi hemû hêza xwe li ber dagirkirineke bi vî awayî rawesta.

Gava ku DAÎŞê êrîş anî ser Kurdistanê, hingê hewcedariya Kurdan zûbizû (acil) bi alîkariya çek û muhîmata leşkerî hebû. Di vê dema hawarê de, dewletên cîran dikaribûn xwe bigihandina Kurdistanê. Îranê yekser heman şeva ku êrîş pêk hatiye du balafirên bi çek û muhîmat barkirî rêkirin Kurdistanê. Di serî de Kurd, çavê her kesî lê bû Tîrkiye jî were hawara Kurdan, belê Tîrkiye di vê demê de bêdeng ma. (Bi ya min ev ne bêdengîyeke bêrî bû, Tîrkiye dixwest bizane bê ka gelo ewê Amerîka Kurdan biparêze an na). Heta di serî de hat gotin ku Tîrkiye tu alîkarî bi Kurdan re nekiriye, belê piştê Mesût Barzanî, di beyaneke ku da Sky News a Erebi de li ser vê yekê peyivî û weha got, “*Alîkariya çekî ya pêşî jî alî Îranê hat. Me jî Tîrkiye jî hêvî dikir. Tîrkiye piştê alîkarî şand, belê jî ber konjonkora xwe ya navxweyî jî me xwest ku em eşkere nekin. Wê gavê diçûn hilbijartinên serokkomarî û di destê DAÎŞê de rehîneyên wan hebûn.*” (Sky News, 10, 2014). Barzanî di heman hevpeyvînê de diyar dike ku çavê wan li alîkariyeke hê xurt bûye, çimkî Tîrkiye dikaribû hê zûtir tev bigeriye û hê bêtir çek bida.

Mesût Barzanî di heman hevpeyvînê de li ser helwesta Tîrkiye ya li hember Kurdistanê jî radiweste û weha dibêje, “*Ez Tîrkiye wek dost dibînim. Ez bawer nakim ku ewê Tîrkiye li hember pêşveçûna Kurdistanê bisekine. Pirsê serxwebûnê tiştêkî din e. Ya rast, ez nizanim bê ka ewê helwesta dawî ya Tîrkiye û welatên din li ser serxwebûnê çî be.*” (Sky News, 10, 2014).

9. ENCAM

Di Tebaxa 2015an de, bi pêşkişiya DYAYê (Dewletên Yekbûyî yên Amerîka) koalîsyonek li dijî DAÎŞê hat avakirin, ku di destpêkê de 15 dewletan tê de cih standin. Li gel dewletên wek Amerîka, Îngilîztan, Fransa û Kanada, ji herêmê jî dewletên wek Erebstana Suudî, Urdun û Yekîtiya Mîrekiyên Ereb di nav hêza hevvelbend de cih girtin. Armanc sereke ya van hêzên hevpeyman ew bû ku DAÎŞê li herêmê bêbandor bikin û herweha hemû axa ku bi darê zorê bi dest xistiye jê bistînin. Bi vî awayî hem li Sûriyê û hem jî li Iraqê, li hember DAÎŞê êrîşên ezmanî û reşahiye hatin li dar xistin. Li Iraqê hêzên pêşmerge, li Sûriyê jî YPGê bi alîkariya hêzên hevpeyman li hember DAÎŞê serketinên mezin bi dest xistin. DAÎŞ pêşî jî Mûsulê, dû re jî Rakkayê hat derxistin.

Piştî derketina DAÎŞê û qelsbûna desthilatiya Bexdayê, axa ku di bin destê Kurdan de bû ji %40 zêde bû û Kurdan hema bêje hemû axa xwe ya ku bi Bexdayê re li ser devjenî dikir û diviya pêşeroja wê bi referandûmê kifş bibe, azad kiribû. Bêguman bi Kerkûkê re, bîrên petrolê û hin navçeyên ku Kurd û Ereb bi hev re dijiyan jî ketibûn destê Kurdan (Cockburn, 03, 03, 2016). Bi taybetî, bi zivirîna Kerkûkê re Kurdan azadiya xwe ya aborî kiribûn destê xwe û ji bo parastina azadiya siyasî destê wan hê xurttir bûbû. Piştigirya navnetewî ya ji bo Kurdan, piştî êrîşên DAÎŞê hê xurttir û geştir bûbû. Êrîşa DAÎŞê ya li ser Mûsulê guherînek çêbar (nitel degişim) afirandibû. Nêçîrvan Barzanî vê guherîne jî kovara *The Economist* re bi vî awayî dîanî ziman: *“Hûn nikarin cardin bizivirin heman avahî û heman sistemê, çimkî Iraqê wêşên xwe yên serweriyê hunda kirine. Netewa Iraqê tune. Belê ewê serxwebûnê raberî me nekin, divê em bi xwe bistînin”* (*The Economist*, 2015).

Di 7ê Hezîrana 2017an de, hemû partiyên Kurdan di bin serokatiya Mesûd Barzanî de civînekê pêk anîn û di heman civînê de biryara çêkirina referandûma serxwebûnê hat dayin. Ya rast Biryara referandûmê hê di sala 2014an de ji aliyê parlamentoya Kurdistanê ve hatibû girtin, belê ji ber êrîşên DAÎŞê, desthilatiya Kurd neçar mabû ku vê demajoyê bi paş bixe (*Newsweek*, 07. 11. 2017).

Biryara çûyina referandûmê, hem ji alî dewletên cîran ve û hem jî alî Amreîka û dewletên rojava ve rast û li cih nehat dîtin. DYAYê xwest ku Kurd dîroka referandûmê bi qasî çend salan bi paş bixin. Tirkiye jî pêşî li hember dema referandûmê derket û wê jî xwest ku referandûm bê paşxistin. Belê piştê, her ku Tirkiye û Îran nêzîkî hevdu bûn, helwesta Tirkiyê ya li hember referandûmê hişkîr bû. Demekê bi şûn de herdu dewletan jî gef li desthilatiya Kurd xwarin û diyar kirin ku ewê tedbirên stûr li hember vê biryarê bistînin. Gava ku demajoya aştiyê li rê bû helwesta Tirkiyê ya li hember Hukûmeta Herêma Kurdistanê gellek nerm bû. Belê biryara çûyina referandûmê, Tirkiyê li siyaseta wê ya kevin zivirandibû. Erdogan,

di sala 2012an de, çend meh beriya ku demajoya aştiyê dest pê bike, piştî Lotkeya Ewlekarî di televizyonekê de weha gotibû, “*Emê li bakûrê Sûriyeyê, tu car destûr nedin avabûneke ku ewê Efrîn û Qamişlo bigire nav xwe. Avabûneke ku li bakûr çêbibe ji bo me avabûneke terorî ye. Mudaxelekirina wê derê mafek me yî herî xwezayî ye. Ev dikare planek wusa be ku avabûna bakûrê Iraqê bigihîne Derya Spi*” (Hurriyet, 25, 07, 2012).

Piştî ku di sala 2015an de demajoya aştiyê têk çû, helwesta Tirkiyê ya li hember hewldana Kurdsitana Başûr ya dewletbûnê jî yekcar hişktir bû û her ku çû, Tirkiyê rûdanên Sûriyê û Iraqê bi hevdû re, wek meseleyekê nîrxand. Erdogan, di 7ê Sibata 2016an de, gava ku ji gerra xwe ya Şîlî, Perû, Ekvator û Senegalê dizivirî welat, di balafirê de li ser rewşa Sûriyeyê weha gotibû, “*Şaşiya ku me li Iraqê kir, em naxwazin li Sûriyeyê dubare bikin. Ez alîgirê tezkera 1ê Adarê bûm⁶, yên ku li dij bûn bi aşkerayî negotin. Eger tezkera 1ê Adarê di dema pêşî de qebûl bibûya û Tirkiye li Iraqê bûya, hingê rewşa Iraqê weha nedibû*” (Munyar, 2016).

Bi ser hemû gefên ku dewletên cîran li desthilatiya Kurd xwarin, referandûma serxwebûnê di roja 25ê Îlonê de, bi awayê ku hatibû plankirin pêk hat. Çi Kurd, çi Turkmen û çi jî Asûrî be, ji %72yê hilibijêran, roja 25ê Îlonê çûn ser sindoqan û di encamê de, ji % 93an ji serxwebûna Kurdistanê re gotin “erê.” Li dereke wek Kerkûkê, ku ji %40-45ê şênîyên wê Ereb, Tirkmen û Asûrî bûn, dengên “erê” ji % 80 derketin, ku ev rêje ji bo Kerkûkê gellek bilind bû. Bi ser ku Tirkiyê digot, ewê li Kerkûkê Tirkmen, Ereb û Asûrî neçin ser sindoqan û rêjeya beşdariyê gellek kêmtir be jî, ev bendemanî (beklenti) pêk nehat. Helwesta hilibijêrên Kerkûkê gellek kes şaş û mat hêştibû.

Piştî referandûmê Tirkiyê xwest ku desthilatiya Kurd tafilê encamên referandûmê betal bike, belê tiştek weha bi awayê huquqî ne derdest (mumkun) bû. Bi taybetî li Kerkûkê jî pêkanîna referandûmê dewletên cîran gellek acis dikir. Loma çend roj piştî referandûmê, Tirkiyê û Îranê, li ser daxwaza hukûmeta navendî ya Iraqê, hewa xwe ya ezmanî li ber Kurdan girtin, seferên firokeyan ên ji bo Hewlêr û Silêmaniyê hatin betalkirin.

Tam bist roj di ser referandûmê re derbas bûbû ku, di roja 16.10.2017an de, hêzên Heşdî Şabî û Iraqê bi hev re êriş anîn ser Kerkûkê. Bajarê Kerkûkê yê ku ji

6 Erdogan qala koalîsyona ku li hember rejîma Saddam hatibû avakirin dike. Di koalîsyona ku di sala 2003an de bi pêşkişîya DYAyê li hember Iraqê hatibû avakirin de 30 dewletî cih girtibû. 250 000 hêzên leşkerî yên Amerîkî, 45000 leşkerên Brîtanayî û 2000 jî leşkerên Avustralyayî, wek hêza reşahiyê beşdarî operasyonê bûbûn. Tirkiyê bi tezkera 1ê Adarê rê neda ku leşkerên koalîsyonê ji ser axa wê êrişî Iraqê bikin. Hingê Rûsya, Çîn û gellek dewletên din jî operasyon şermezar kiribûn (Sandholtz, 2008).

sala 2014an vir ve di destê Kurdan de bû, bi hevkarîya pêşmergeyên YNKê, di yek seveke de ket destê Iraqê (ya rast Îranê). Tu nebêje YNKê, çend roj berê bi Îranê re peymanek veşartî çêkiribû û li gor vê peymanê ewê ji bajêr vekîşîya û Heşdî Şabî biketa Kerkûkê. Bi gotina Mesût Barzanî, “*xencereke bi jahr ji paş ve, li piştê Kurdan hatibû xistin*”. Belê di vê bêbextiya li hemberî Kurdan de, qusûr kêmahîya desthilatiya Kurd jî ne hindik bû. Bi ser ku Kurd, 26 sal bû xwedan desthilatiyeke herêmi bûn û ji 2005an vir ve jî dewleteke feder bûn, hê jî di nav xwe de hêzeke pêşmerge ya hevpar û netewî ava nekirûbûn. Loma gava ku fermanarên bazkekî pêşmerge bi Îranê re bi dizî li hev kiribûn, Kerkûk û hema bêje ji %40ê axa wan, di seveke de ji dest çûbû.

Bêguman di serî de dewletên cîran, haya Amerîka jî ji planê radestkirina Kerkûkê hebû û hin dewletên cîran jî ji destpêkê ve di nav vî karê ha de bûn. Bi ser de, eger referandûm nehata çêkirin jî, piştî rizgarkirina Musûlê, ewê Iraqê bi pêşkişîya hêzên Heşdî Şabî ve êrîş biyaniya ser bîrên petrolê yê Kerkûkê. Sîrf ji ber vê yekê, Iraqê operasyona Havîceyê (navçeyek Kerkûkê) hêştibû paşiyê, da ku ji wir êrîş bine ser Kerkûkê. Mixabin, bi “def û zirne” îlankirina referandûma serxwebûnê, fersend û behaneyek baş dabû destê xêrnexwazan. Eger Kurdan, tam di dema ku Mûsul ketibû destê DAÎŞê û hêzên vê rêxistina terorî nêzîkî Bexdayê bûbûn, bêyî ku biçin referandûmê tafîlê serxwebûna xwe îlan kiribûna, hingê dibû ku dinyayê ew binasa û wek dewleteke serbixwe bihatana qebûlkirin. Eger dinyayê ew nas nekira jî, qet nebe sê-çar salan bi awayî de facto serbixwe dima û destê wê hê xurttir dibû. Belê desthilatiya Kurd hingê ev yek exlaqî nedît û Amerîka jî misêva ji wan re digot ku “rawestî, piştî têkçûna DAÎŞê referandûmekê çekin, dû re hêdî hêdî hûnê serbixwe bibin.”

Bêguman ji destçûyîna Kerkûkê, ji bo hemû Kurdên cihanê têkçûnek nedîtî bû û li seranserê dinyayê Kurd hêvîşiketî bûbûn. Eger Kurdan li hember dagirkirina Kerkûkê berxwedanek rêbazwar (meşru) li dar xistibûya, dibû ku di serî de Amerîka, helwesta dewletên rojava jî biguheriya. Çimkî di sala 2014an de, heta ku çar meh di ser êrîşa DAÎŞê ya li ser Kobaniyê derbas bûbû û ji %95ê bajêr ketibû destê êrîşkaran jî dinya bêdeng mabû. Îcar piştê Amerîka û dinya li hawara Kurdan hatibû û cara pêşî li Kobaniyê DAÎŞ şikestibû û ji bajêrê ku dagir kiriye vekîşiyabû. Belê li Kerkûkê desthilatiya Kurd, ji tîrsa ku dikare rê ber şerê birakujiyê veke, bi şûn ve vekîşiyabû.

Di encamê de, referandûma serxwebûnê helwesta Kurdan ya azadîxwaz nişani tevahiya dinyayê da, belê hundakirina Kerkûkê û derên din, bazk û milên Kurdan şikand û ew kirin rewşeke bêkeys. Ji îro bi şûn de, eger Kurd zûka bikaribin xwe li ser hev bicivin û nakokiyên xwe yê navxweyî bidin aliyekî, bi taybetî hêzên

xwe yên pêşmerge di bin femandariya navendekê de binin ser hev, bi awayekî çalak parlamentoya xwe bixebitînin, bi derûcîranan û bi nemaze bi dinya hemdem re têkiliyên dîplomatîk ên xurt deynin, ewê bikaribin tiştên ku hunda kirine cardin bi dest bixin. Îcar herçiqas Kerkûk bi darê zorê ji Kurdan hatibe standin jî, li gor xala 140an a rêbazavahiya Iraqê, divê li Kerkûkê referandûmek bê çekirin û gelê Kerkûkê biryara xwe bide, bê ka ewê bi Iraqê re bimîne an jî beşdarî herêma Kurdistanê bibe. Piştî ku Kerkûk ket destê Iraqê jî, Wezaretê Amerîka ya Karên Derve bi beyanekê kifş kir û got ku “heta li Kerkûkê, li gor rêbazavahiyê çareseriyek neyê dîtîn, ewê mesela Kerkûkê çareserkirî nehesibînin.”

10. ÇAVKANÎ

ABD ile Gizli Menbiç Anlaşması (2016, 06.07.). Milliyet.

A Complicated Alliance with Turkey. (2016, 25 August). The Newyork Times.

After Turkey’s Syria Incursions, Questions Grow Over Exit Strategy. (2016, September 1.) voanews.com.

AK Partili Çelik: Kurdistan’ı Tanırız Demedim. (2014, 30 Haziran). Haberler.com.

Akyol, T. (2016, 01.09.). Fırat Kalkanı. Hurriyet.

Atalay’dan Haşimi Açıklaması. (2012, 10.05.) Sabah. <http://www.sabah.com.tr/gundem/2012/05/10/atalaydan-hasimi-aciklamasi>

Arango, T. (2016, Sept.1.). Kurds Fear the Us Will Again Betray Them in Syria. The New York Times.

Bagımsız Kurdistan’a Macaristan’dan destek. (2015, 11.05.). İlke Haber. <http://www.ilkehaber.com/haber/bagimsiz-kurdistana-macaristandan-destek-32601.htm>

Bagımsız Kurt Devletini Taniyacagını Açıklayan İlk Ülke. (2016, 07.02.). Bitlisname. <http://www.bitlisname.com/2016/02/07/bagimsiz-kurt-devletini-taniyacagini-aciklayan-ilk-ulke/>

Barkey, H. J. (25 August, 2016). Washington Tightrope Act in Syria. Foreign Affairs.

Barzani ve Perver Diyarbakir’da. (16 Kasım 2013). Hurriyet.

Barzani: ABD ve Avrupa bagımsız Kurdistan’a karşı değil. (2016, 16.04.). Ufkumuz. <http://www.ufkumuz.com/barzani-abd-ve-avrupa-bagimsiz-kurdistana-karsi-degil-49015h.htm>

Bengio, O. (2016, August 14.) Meet the kurds, a historcally oppressed people who will get their own state. Tablet.

Bozarslan, M. E. (2001). “Tarihteki İlk Türkçe Ansiklopedi’de Kurdistan ve Kurdler”, Deng Yayınları, İstanbul, r. 151.

Cockburn, P. (2016, March). “End Times for the Caliphate?” London Review of Books, Vol.38, No:5, 3.

- Cokckburn, P. (2016, 24 August). Turkey's foray into Syria to take on Isis is a gamble in a very dangerous game. Independent.
- Cokckburn, P. (2016, 03.September.) Syrian Kurds vow to fight to the death to stop Turkey 'invading' their territory. Independent.
- Çağatay Soner and Tylyer, Evans. (2012, October). Turkey's Changing Relation With Iraq, Kurdistan Up, Baghdad Down. Policy Focus, r. 1.
- Çalışlar, O. (2016, 05.03.). PYD siyaseti değişmez mi? Hürriyet. http://sosyal.hurriyet.com.tr/yazar/oral-calislars_550/pyd-siyaseti-degisemez-mi_40063911.
- Darbe girişimi - Erdoğan'dan ABD'ye Gülen çağrısı: İade edin. (2016, 16 Temmuz). BBC Türkçe.
- Davutoglu: Bağımsız Kurdistan bölge için tehlike. (2015, 14.01.) İlke Haber.
- Dobbins, James, Jones, Seth G., Runkle, Benjamin, Mohandas, Siddharth. (2009). Occupying Iraq a history of the coalition provisional authority, Rand Corporation.
- Dunn, Michael C. (2015). The Arab World and the Kurds. <http://www1.american.edu/cgp/pdf/dunn.pdf>, Erşim:10.11.2015
- Duran, A. E. (.2014, 04.07.). "Türkiye, 'Kürdistan'a hazır mı? Deutsche Welle Türkçe.
- Duran Kalkan: İran'ın parçalanmasına karşıyız. (2016, 10.05.). Bashaber. <http://bas-haber.com/tr/news/14416/duran-kalkan-rakin-parcalanmasina-karsiyiz>
- Ed Dûri, Abdülaziz, "Bağdat" Diyanet İslam Ansiklopedisi, cilt:4, r. 433, Türkiye Diyanet Vakfı İslam Araştırmaları Merkezi.
- Egypt's president Sisi warns Iraqi Kurdistan's secession would splinter Mideast. (2014, July 7.). Ekurddaily. <http://ekurd.net/mismas/articles/misc2014/7/govt2321.htm>
- Eli Ewnî'den Salih Muslim'e: Kanımızı kole olmak için mi doktuk? (2016, 15.06.). Bas-news. <http://basnews.com/index.php/tr/news/kurdistan/281773>
- Erdogan: Mudahale Etme Hakkımız Var. (2012, 25 Temmuz). Hurriyet.
- Erdoğan İlk Kez "Kürdistan" dedi. (2013, 17 Kasım). Mynet. <http://www.mynet.com/haber/guncel/erdogan-ilk-kez-kurdistan-dedi--862637-1>
- Erdoğan'dan ABD'ye 'PYD' tepkisi: Bu nasıl Ortaklık? (2016, 10 Şubat). BBC Türkçe.
- Galbraith, Peter W. (2006). The End Of Irak, How American Incompetence Created a War Without End, Simon & Schuster Paperbacks, New York.
- Genel Energy courts Turkey with Kurdish gas to reduce reliance on Russia. (2016, April 28.). Hurriyet Daily News.
- Goran'dan Barzani'ye: Referandum ve bağımsızlık konuşamayız. (2016, 27.07.). <http://rudaw.net/mobile/turkish/kurdistan/2607201613>
- Gresh, A. (1998), "Turkish- İsrail- Syrian Relations and Their İmpact on the Middle East", *The Middle East Journal*, vol. 52, Number 2, Spring.
- Hawramy, Fazel. (2014, 24.12.). "Exclusive: Senior Kurdish rebel leader warns Iraq must stay united to defeat 'savage' Isis," The Guardian, <https://www.theguardian.com/world/2014/dec/24/pkk-kurdish-leader-cemil-bayik-iraq-syria-isis>

Hurriyet, 2001, 16 Mayıs.

Hurriyet, 2016, 19 Ağustos.

Iraq: Forcible Expulsion of Ethnic Minorities. (2003, Mar.). vol. 15, no. 3(E) (New York: Human Rights Watch,). <https://www.hrw.org/reports/2003/iraq0303/>

İrandan Bagimsız Kurdistan'a ret. (2016, 10 Mayıs). Cumhuriyet.

Israel supports Kurdistan independence, Israeli envoy to U.S. says. (2016, March 5).

Ekurddaily. <http://ekurd.net/israel-supports-kurdistan-independence-2016-03-05>

IŞİD Musul'da kontrolü ele geçirdi. (2014, 10.07.). Hürriyet.

“İran: 2. İsrail, Kürdistan'a izin vermeyiz,” <http://www.viagazete.com/2016/01/28/iran-2-israil-kurdistana-izin-vermeyiz/>

İran Şaşırtmadı: bağımsız Kurdistan'a Karşıyız. (2014, 02.07.). İlke Haber. <http://www.ilkehaber.com/haber/iran-sasirtmadi-bagimsiz-kurdistana-karsiyiz-30001.htm>

Jones, D. (2014, 06.05.). Turkey, Iraqi Kurdistan Seal 50-Year Energy Deal. VOA. <http://www.voanews.com/a/turkey-iraqi-kurdistan-seal-50-year-energy-deal/1930721.html>

Kalin, İ. (2016, 31.08.). Rusya ve ABD'ye gerekli bilgilendirme yapıldı. Suputnik Türkiye.

Katzman, K. & Humud, C. E., (2016, March 9). Iraq: Politics and Governance, Congressional Research Service, , <https://www.fas.org/sgp/crs/mideast/RS21968.pdf>

Katzman K. & Humud, C. E. (2016, March 9.). Iraq: Politics and Governance, Congressional Research Service, <https://www.fas.org/sgp/crs/mideast/RS21968.pdf>

Kıran, A. (2001). Türkiye'nin Kuzey Irak Politikası, Birikim, Ağustos, Sayı: 148.

Kıran, A. (2016). Yeni Bir Ortadoğu ve Kurtler, Nas Yayınları, İstanbul, r.129.

Kıran, A. (2014, 07.07.). Türkiye-Kurdistan İttifakı ve Yeni Ortadoğu. Nêrinaazad. http://www.nerinaazad.com/columnists/abdullah_kiran/turkiye-kurdistan-ittifaki-ve-yeni-ortadogu

K.Irak'tan Türkiye'ye yeni boru hattı. (2013, 31 Ekim). Aljazeera Turk. <http://www.aljazeera.com.tr/haber/kiraktan-turkiyeye-yeni-boru-hatti>

Kronoji: IŞİD'in Musul İşgali. (2014, 12.07.). Aljazeera Turk. <http://www.aljazeera.com.tr/haber/kronoloji-isidin-musul-iskali>

Kurdistan ever closer to independence. (21 February 2015). The Economist.

Magnier, Elijah J., Putin and Erdogan have agreed on a restricted road map in Syria: the Kurds and Nusra will be the main losers. Middle East Politics, <https://elijahjm.wordpress.com/2016/08/30/putin-and-erdogan-have-agreed-on-a-restricted-road-map-in-syria-the-kurds-and-nusra-will-be-the-main-losers/>

Malanczuk, P. (1997). “Akehurtst's Modern Intrudocion to International Law”, Seventh Revised Edition, Routledge, r. 88.

Maliki: YNK ve Goran Bagimsız Kurdistan'a karşı. (15.08.2016). AmedToday. <http://www.amedtoday.org/mobil/haber/9693/maliki-ynk-ve-goran-bagimsiz-kurdistana-karsi.html>

- Mesut Barzani: Türkiye yardım etti, açıklamadık. (2014, 14 Ekim). Hurriyet.
- Adla, M. (2017, 07.11.). War i n Iraq: Masoud Barzanî, ex-Kurdîsh Leader, Says U.S. Knew in Advance About Iraçî Assault on Kirkuk. Newsweek.
- Munir, M. (2016, 4 Agustos). Gebersek de kurtulsak diye yalvaracaklar. T24. <http://t24.com.tr/yazarlar/metin-munir/gebersek-de-kurtulsak-diye-yalvaracaklar,15179>
- Munyar, V. (2016, 7 Şubat). Irak'taki hataya düşmek istemiyoruz. Hurriyet.
- Natali, D. (2012, June 6). Baghdad and Erbil Clash over Oil. al-Monitor. <http://www.al-monitor.com/pulse/originals/2012/almonitor/iraqs-energy-imbroglio.html>.
- Okumuş, O. (2014, 01.08.). Turkey energy deal with KRG lacks transparency. Al- Monitor.
- Ozturk E. (2016, 07.06.). Sınırdaki IŞİD olacağına PYD olsun. Hurriyet.
- Okumuş, O. (2014, 01.08.). Turkey energy deal with KRG lacks transparency. Al- Monitor.
- Ryan, M. (2016, 24 August). In Syrian border battle, Pentagon touts role of fighters from troubled train-and-equip program. The Washington Post.
- Sandholtz, W. (2008). "The Iraq War and Internatinal Law" International Law, Edited by: David Armstrong, Routlege, r. 223.
- Serdaroglu, O. (2015, 31 August). The Turkish-Kurdish energy deal could pave way for Iraq's breakup. Middle East Eye, <http://www.middleeasteye.net/columns/turkish-kurdish-energy-deal-could-pave-way-iraq-s-breakup-617359973>
- Schmitt Eric and Bilefsky Dan. (2016, July 16). Turkey Interrupts US Air Mission Against ISIS at Major Base. The New York Times.
- Sheppard, David, Reed John and Anjli Raval. (2015, August 23). "Israel turns to Kurds for three-quarters of its oil supplies," Financial Times.
- Talabany, N. (2007, Winter). Who Own Kirkuk? The Kurdish Case. Middle East Quarterly, r. 75-78
- Tayiz, K. (2016, 13 Şubat). Türkiye'nin PYD politikası yanlış mi? Akşam.
- Tekerek, T. (2013, 29.07.). Asker Suriye'ye Girerse Donemez. Taraf.
- The Guardian. 2014, 24 December.
- Turkler Bağımsız Kurdistan'a Nasıl Bakıyor? Çarpıcı Sonuçlar. (2016, 03.03.). Bitlisname. <http://www.bitlisname.com/2016/03/03/turkler-bagimsiz-kurdistan-a-nasil-bakiyor-carpici-sonuclar/>
- Turkey expects US to fulfill promise, withdraw PYD from Manbij. (2016, August 15). Daliy Sabah.
- Turkey Ponders Northern Iraq Measures, Talabani 'Regrets' Threats. (2007, April 11). Journal of Turkish Weekly. <http://www.turkishweekly.net/news/44194/turkey-ponders-northern-iraq-measures-talabani-regrets-threats.html>.
- Turkey: Suicide bomber kills more than 50 at wedding. (2016, 22 August). Aljazeera,

<http://www.aljazeera.com/news/2016/08/injured-blast-hits-wedding-hall-gaziantep-160820204150494.html>

Tol, G. (2016, August 26). Is Turkey a US Ally Against ISIS? The New York Times.

UN Charter, Chapter III, Article: 4

Uslu, E. (2013, September 12.). An independent Kurdistan? Not if the US can help it. Almonitor.

Yayla, A. (2016, 12.02.). Türkiye'nin PYD politikası yanlış mi? Yeni Yüzyıl.

Yezdani, İ. (2012, July 31). Turkey Gives al-Hashemi, His Team Residence Permit. Hurriyet Daily News, <http://www.hurriyetdailynews.com/turkey-gives-al-hashemi-his-team-residence-permit.aspx?pageID=238&nID=26723&NewsCatID=359>

Zaman, A. (2016, 20 Ocak). Irak Kürdistanı ekonomik çöküşün eşğinde mi? Al- Monitor.

Zaman, A. (2016, 03.04.). Tam bir açmaz: Türkiye-ABD ilişkileri, IŞİD-YPG-PKK üçgenine sıkıştı. Diken.com.tr.

Zaman, A. (2016, 26.08.). ABD Suriyeli Kürtleri 'Sattı' mı? diken.com.tr.

EXTENDED ABSTRACT

The War Against ISIL, Turkey and Future of Iraqi Kurdistan

Turkey's policy towards Kurdistan region of Iraq has changed through time dependent on political actors of era and regional dynamics. The political shift regarding Iraqi Kurdistan can be divided into a few different periods. The first period is between 1920 and 1926. In this period Mosul province was under the British control since 1918 and Turkey claimed that the Iraqi Kurdistan territory, which is known as Mosul province, belongs to it and should be incorporated its national borders. After Turkey and Great Britain didn't come to an agreement with the Mosul Province, both sides agreed on delegating the issue to the League of Nations. Eventfully the League of Nations decided to leave the region to the newly established Iraqi state, which was under the mandate of Great Britain.

The second period can be evaluated the longest and the most stable one, which is between 1926 and 1986. After the League of Nations solved the Mosul Province issue on behalf of Great Britain, the Iraqi Kurds riot, which began in 1918 against Great Britain, entered a new phase. At the first phase of this upheaval Mustafa Kemal supported the Kurdish riot against Great Britain, but after the decision of League of Nations, Turkey cease to support Kurds. Even after Iraq gained its full independence from Great Britain in 1932, Turkey didn't bring the Mosul Province issue forward and continued to support Iraq's territorial integrity.

The third period, which began after the end of Cold War, is between 1986 and 2003. Following the end of Cold War and collapse of Soviet Union, especially in the Asia and Balkan regions the borders of many states has changed and many new states emerged. In

1980, Iraqi forces attacked Iran and a bloody war occurred between two nations, which have continued for eight years. Towards the end of war, the Iraqi forces lost a considerable ground against Iran. As a result of this, the Kurds got the opportunity to build their own administration. Turkey hesitated that the Iraq could dismember. Thus, Turkey shifted its policy again and claimed that Turkey keeps its historical rights over the Mosul Province in the case of any dismemberment of Iraq. Iran-Iraq war ended with stalemate, but two years after this disaster war, in August 1990, Iraqi forces invaded Kuwait and this invasion created another tension in the Middle East. The international society urgently called Saddam Hussein to pull back its forces from Kuwait and UN, with resolutions 660 (1990), 662 (1990), 664 (1990), called all states to restore peace, security and stability. When Iraq didn't withdraw from Kuwait, UN Security Council called member states to restore peace with resolution 687. Even after Iraqi forces were extirpated from Kuwait, Saddam regime didn't stop to attack Kurds. Thus, the UN with resolution 688 created a safe haven for Kurds in Northern Iraq. Those resolutions provided a great opportunity for Kurds to build their own local administration.

The fourth period starts in 2003 and still goes on. In this article we will mainly focus on the fourth period and try to illuminate Turkey's attitudes towards the Iraqi Kurds. After the second American intervention in Iraq and fall of Saddam Hussein regime, Iraq became a federal state and the Kurds obtained their fundamental rights via constitution, which ratified in 2005. In the 2002 general elections, AK Party (Justice and Development Party) came to power alone and promised to improve human rights issues and accelerate Turkey's EU membership process. In the first years of AK Party reign, there weren't a big shift in Turkey's foreign policy regarding the Iraqi Kurds, but after 2007, AK Party gradually changed its approach towards the Kurdistan Regional Government (KRG). Thus, both sides built very warm relations in many fields.

In September 2012, Mesut Barzani, the President of KRG, was officially invited to AK Party's 4th Ordinary Congress. In 30th September Barzani attend the Congress and even provided with gesture to address the audiences. Mesut Barzani focused on Turkey's regional and international role in his speech and thanked to the Prime Minister Erdoğan about how he courageously dealt with Turkey's tough problems, especially with Kurdish question and improved Turkey's prestige. Turkey and KRG relations continued to improve and in 16th November 2013, Prime Minister Erdoğan invited Mesut Barzani to Diyarbakır. In Diyarbakır meeting, besides many cabinet members and MP's, Turkey's well-known singer İbrahim Tatlıses accompanied Prime Minister Erdoğan. Kurdish worldwide singer Şivan Perwer was also with President Barzani and both singers, had a sing hand by hand with Erdoğan and Barzani all together. That day was an unforgettable one and was a celebration for the people of Diyarbakır. The hope that Turkey is going to solve its Kurdish problem, increased in the feelings of everybody.

Also in 2013, Kurdish petrol began to reach international market for the first time in the history via Turkey. Turkey's direct relations with KRG annoyed Iraq and even disturbed

America. Some US diplomats were claiming that Turkey was deliberately encouraging Kurds to cease from Iraq and become an independent state. In 2014, ISIL occupied Iraq's second largest city Mosul and after a while they became a serious threat to the Kurds and soon attacked Erbil. Iran directly provided arm support for Kurds without any delay, but Turkey was little slows in this issue. The Kurdish administration was disappointed, since they had very warm relations with Turkey rather than Iran.

After the 2015 general elections of Turkey, the peace process, which has been under way since the end of 2012, ruined and unfortunately Turkey entered a difficult stage again. At the June of 2017 when Iraqi Kurds decided to organize an independence referendum, Turkey opposed this decision very fiercely and asked Iraqi Kurds to postpone it for a few years. When the referendum took place on its scheduled time, Turkey and Iran closed their air space to the Kurdistan region and a new era began for both sides on bilateral relations.

Nationalistic Senses and Kurdish Politics in the Last Century*

Hestên Netewî û Siyaseta Kurdan di Sedsala Dawî de

Necat KESKÎN**

ABSTRACT:

The Sykes-Picot Agreement, agreed privately by France and Britain and subsequently extended to include Russia, was eventually revealed or publicized as drawing boundaries in the Middle-East for the 20th century. The land in which Kurds were living was object of this division.

One of the reason why the Kurds did not fight for their own interests was the weakness of nationalistic feelings among them, while the other was lack of concensus among their leaders (*emirs* and *pashas*), which continued even after World War I and leading to the Kurds' exclusion from international agreements. Consequently, four distinct Kurdish societies emerged in four different "nation-states".

* This article is based on a presentaion in Kurdish titled, "Ji sedsal berê heta niha: Hestên netewî û siyaseta Kurdan-From a Century ago to the Present Day: Nationalistic senses and Kurdish Politics", presented in "The Kurdish Case and Sykes-Picot Agreement" conference held in Suleymaniya/KRG/Iraq, on 3-4th, May, 2016. I am very thankful to **John Crofoot**, a dearest friend, for his commenting and editing on the English editon of this article.

** Assistant Professor,
Department of Kurdish
Language and Culture, Mardin
Artuklu University, Turkey / Dr.,
Zanîngeha Mardin Artukluyê,
Enstîtuya Zimanên Zindî, Şaxa
Makezanîsta Ziman û Çanda
Kurdî, Mêrdîn, Turkiye.
e-mail: necatkeskin@gmail.com

Nationalism is bound to the idea of a 'land' at first, and the people living in the same land are emotionally close to each other even though they do not know each other, which is determined as 'imagined community' by Benedict Anderson.

In this article the current situation of the Kurdish politics and their "nationalism" are going to be discussed by comparing them to the situation in which Sykes-Picot agreement occurred with the recent happenings such as "postponing national congress", "liberating Shingal", and "Kobane" fighting.

Keywords: Sykes-Picot, Kurds, nationalism, Kurdistan, Middle East.

PUXTE:

Peymana Sykes-Picot ya veşartî ku Frensî û Ingilîz li ser li hev hatibûn, û dûv re Rûs jî tevî bûbûn bi awayekî li ser parvekirina xaka Rojhilata Navîn derketibû meydanê. Di vir de axa ku Kurd li ser dijîn jî mijara vê parvekirinê bû.

- Jîn (Kurdish Journal-1918) I-II-III-IV-V* (1985) (Transliteration: M.Emin Bozarslan), Uppsala: Deng
- Jwaideh, W. (2004). *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi* (Trs. İ.Çeken-A.Duran), 3. bsk., İstanbul: İletişim
- Kaya, H. (2012). *Doğu’nun Elçisi’nden Yüce Divan’a Şerafettin Elçi*, İstanbul: Fanos yayınları.
- Keskin, N. (2014). A Starting point towards ‘unification’ between Kurds: Peshmerga to Kobani, <http://ekurd.net/mismas/articles/misc2014/10/syriakurd1628.htm> last seen: 15.10.2016.
- (2015). Will Kurds Make it This Time?, <http://ekurd.net/will-kurds-make-it-this-time-2015-08-19>, last seen: 15.10.2016
- Kürdistan I-II* (1991). (Transliteration: M. E. Bozarslan), Uppsala: Deng
- Noel, E.W. C. (2010). *Kürdistan 1919*, (trans. B. Birer), İstanbul: Avesta
- Öcalan, A. (2011). *Democratic Confederalism*, London: Transmedia Publishing Ltd.<http://>

www.freeocalan.org/wp-content/uploads/2012/09/Ocalan-Democratic-Confederalism.pdf 10.02.2016.

(2012). *Kürdistan Devrim Manifestosu, Kürt Sorunu ve Demokratik Ulus Çözümü (Kültürel Soykırım Kıskaçında Kürtleri Savunmak)*, İstanbul: Ararat

Özkırımlı, U. (2009). *Milliyetçilik Kuramları: Eleştirel bir Bakış* (3.bsk), İstanbul: Doğu-Batı Yayınları

Özoglu, H. (2004). *Kurdish Notables and the Ottoman State: Evolving Identities, Competing Loyalties, and Shifting Boundaries*, New York: State University of New York Press

Rehmî, E. (1918). Halê me yê hazir, *Jîn*, hj. 6, rp.17-18.

Rogg, I. & Rimscha, H. (2007). The Kurds as parties to and victims of conflicts in Iraq, *International Review of Red Cross*, v. 89, n.868, pp.823-842.

Romano, D. (2010). *Kürt Dirilişi (Olanak, Mobilizasyon, ve Kimlik)*, (çev. M. Topal & E. Gedik), İstanbul: Vate yayınevi

Rózsa, E. N. (2012). The Arab Spring Its Impact on the Region and on the Middle East Conference, *Policy Brief*, Nos. 9/10. <http://library.fes.de/pdf-files/iez/09609.pdf>

Schmidinger, T. (2014). *Suriye Kürdistanı'nda Savaş ve Devrim* (Trs. S. Altunkılıç), İstanbul: Yordam

Silopî, Z. (Ekrem Cemil Paşa) (1969). *Doza Kürdüstan*, Beyrut: Stewr basım-evi

Temo, M. (2012). Rûpelên Zemina Welatekî bê Welat, In: *Geşepêdanên Rojhelatanavîn, Sûrye û Kurdistanê Rojava* (ed. Seîd Weroj), İstanbul: Doz, rp.31-87.

The Road of the Revolution of Kurdistan (Kürdistan Devriminin Yolu-Manifesto). In: *Kürdistan Sosyalist Hareketi: 60'lardan 200'lere Seçme Metinler* (ed. by E. A. Türkmen & A. Özmen), Ankara: Dipnot, pp. 445-528.

Türkmen, E. A. & Özmen, A. (ed). (2013). *Kürdistan Sosyalist Solu Kitabı (60'lardan 2000'ler Seçme Metinler)*, Ankara: Dipnot

Weiler, G. (1994). What Is the Philosophy of Nationalism?, *Studies in East European Thought*, Vol. 46, No. 1/2, Nationalism and Social Science (Jun., 1994), pp. 119-128.

White, P. J. (2012). *İlkel İsyancılar mı? Devrimci Modernleştiriciler mi? (Türkiye'de Kürt Ulusal Hareketi)*, (çev. M. Topal), İstanbul: Vate Yayınevi

Web:

- http://www.pukmedia.com/EN/KK_Direje.aspx?Jimare=1728315.10.2016

- <http://www.britannica.com/event/Sykes-Picot-Agreement> 30.01.2016

- http://www.jewishvirtuallibrary.org/jsourc/History/sykes_pico.html 30.01.2016.

- <http://www.smithsonianmag.com/history/sykes-picot-agreement-180957217/?no-ist> 30.01.2016

- http://wwi.lib.byu.edu/index.php/Main_Page
- <http://time.com/4003737/kobani-isis-photos/> last seen: 12.10.2016
- <http://www.bbc.com/news/world-middle-east-29688108> lênerîna dawî: 14.02.2016
- http://rudaw.net/kurmanci/onair/tv/episodes/episode/2ali_18112015 last seen: 14.10.2016
- <http://www.rojevakurd.com/serok-barzani-mizginiya-azadkirina-singale-ragihand/> accessed: 14.02.2016
- <http://rudaw.net/kurmanci/Kurdistan/030920138>
- <http://rudaw.net/kurmanci/Kurdistan/1011201311> accessed: 14.02.2016
- <http://rudaw.net/english/Kurdistan/23072013> 23.12.2015
- <http://rudaw.net/turkish/Kurdistan/201020146> last seen: 15.10.2016
- <http://countrystudies.us/syria/23.htm> 08.02.2016
- [http://www.crisisgroup.org/~media/Files/Middle%20East%20North%20Africa/Iraq%20Syria%20Lebanon/Syria/136-syrias-Kurds-a-struggle-within-a-struggle.pdf](http://www.crisisgroup.org/~/media/Files/Middle%20East%20North%20Africa/Iraq%20Syria%20Lebanon/Syria/136-syrias-Kurds-a-struggle-within-a-struggle.pdf) 09.02.2016
- <https://www.evrensel.net/haber/268498/dtkden-14-maddelik-oz-yonetim-deklarasyonu> last seen: 12.10.2016
- <http://aranews.net/2016/07/syrian-kurds-declare-qamishli-capital-new-federal-system/> Last access: 24.10.2016
- <http://kurdishquestion.com/index.php/kurdistan/west-kurdistan/declaration-of-establishment-by-democratic-syria-forces/1179-declaration-of-establishment-by-democratic-syria-forces.html> last access: 26.10.2016
- <http://www.institutkurde.org/en/info/the-kurdish-population-1232551004> last accessed: 10.10.2017

Li Gorî Pîvanên Cunningsworth Nirxandinek li Ser *Hîngerê**

An Evaluation of *Hînger* Based on Criteria by Cunningsworth

Şehmuz KURT**

PUXTE:

Di pêvajoya hînkirina zimanekî de gelek materyalên ji hev cuda tên bikaranîn. Ji wan materyalan û bi îhtimaleke mezin yê herî zêde têne bikar anîn, hînkêrên zimanî ne. Ji ber ku di bazarê de ji yekê zêdetir hînkêrên zimanî hene, êdî nirxandin û hilbijartina wan bûye diyardeyeke aşkere û li ser nirxandin û hilbijartina hînkêran lîteratureke têra xwe mezin û berfirah pêk hatiye. Ligel gelek zanyarên di Jeremy Harmer, Alan Cunningsworth, Alan Tucker wek nûner û pêşengên qada nirxandin û hilbijartina hînkêran tên hesibandin. Di vê gotarê de me li gorî pîvanên Cunningsworth, seteke hînkirina Kurdiya Kurmancî ya bi navê *Hînger* nirxandineke rûxalî û hûrgilî pêk anî. Di encamê de me dît ku wek seta hînkirinê di naveroka zimanî, çar şiyarwerî û rola mamosteyan de kêmasiyên *Hîngerê* hene lê belê ji hinek aliyên wekî naveroka nezimanî û nirxên civakî û metodolojîyê de *Hînger* serkeftî ye.

* Ev gotar ji teza min a mastirê ya bi navê "Nirxandina Pirtûka Hînkirina Kurdî: *Hînger* – Li Gorî Nêrinên Xwendekar û Mamosteyan" hatiye derxistin ku sala 2015an li Zanîngeha Mardîn Artukluyê bi şewirmendiya Doç.Dr. Tahirhan Aydın hatiye pêşkêşkirin.

** **Xwendekarê Doktorayê li Beşa Ziman û Çanda Kurdî, Zanîngeha Dicleyê, Turkiye/** PhD student at Department of Kurdish Language and Culture, Dicle Univ., Turkey.
e-mail: sehmuzkurt@gmail.com

Peyvên sereke: Hînkirina Zimanî, Hînger, hînkêrên zimanî, nirxandina hînkêran, Cunningsworth.

ABSTRACT:

Numerous different materials are used in the process of language teaching. One of those materials, and maybe the most common used is language coursebook. As there are more than one coursebooks in the bazaar, their evaluation and selection has become a phenomenon and a huge literature has emerged. Among others Jeremy Harmer, Alan Cunningsworth, Alan Tucker are the

representatives and pioneers of this field. In this study we have made an external and an internal evaluation of a set of Kurmancî Kurdish coursebooks named *Hînker* based on criteria by Cunningsworth. As results, we found that as a set of language teaching coursebooks, *Hînker* has deficiencies in terms of language content, language skills and teachers' role, however it is sufficient in terms of non-linguistic content such as social values and also in terms of methodology.

Keywords: Language Teaching, Coursebook, language coursebooks, evaluation of language coursebooks, Cunningsworth.

1. DESTPÊK

Di pêvajoya hînkirin û hînbuna zimanî de yek ji materyalên herî zêde tên bikaranîn hînkerên¹ zimanî ne. Sînorê materyalên hînkariyê berfireh e û li gorî zîrekati û tecrûbeya mamosteyan her tişt dikare di pêvajoya hînkariyê de bê bikaranîn. Ji ber ku, di serî de hînker, hemû materyalên hînkariyê xwedî çarçoveyeke zelal in, ew dikarin bi taybetî ji bo mamosteyên nû û bêtecrûbe bibin rêber û pêvajoya hînkariyê hêsantir bikin (Richards, 2011: 251).

Gelek materyalên nivîskî (nivîsar, diyalog, metn û perçeyên xwendinê); bihîstyarî (diyalog û perçeyên bilêvkirinê yên li kaset û CDyan barkirî); û dîtbarî (wêne, karikatûr û xêzên derheqê babetan); bihîstyarî û dîtbarî (film, filmên qarton hwd.) hînkeran pêk tînin, ji ber vê taybetmendiya xwe, bi gotina Alan Cunningsworth, hînker ji bo bîdestxistin û gehîştina armancên xwendekaran pêdivîyeke sereke ne (Cunningsworth, 1995: 7). Hînker ji bo mamosteyan materyala hînkirinê ye û ji bo xwendekaran jî materyala hînbûnê ye. Hêmaneke girîng a pêvajoya hînkirinê û hînbûnê ye. (Awasthi, 2006), "Pirtûkên dersê yek ji hêmanên perwerdeyê yên herî girîng e (Pingel, 2004: 1).

Wextê mijar bibe hînkerên zimanî, divê ew wekî yek pirtûk neyê hesabandin. Gelek setên hînkeran herî kêr ji pirtûkeke xwendekaran û yeka mamosteyan pêk tê" (Cunningsworth, 1995: 25). Lewra bi piranî pirtûkên hînkirina zimanî ji setekê pêk tên ku di nav de ji yekê zêdetir pirtûk (li gorî her astê pirtûkek û pirtûkên rahênan û spartekan, û pirtûka mamosteyan, pirtûkên xwendinê, ferhengok hwd.), kaset û CDyên guhdarîkirin û temaşekirinê, kaxizên fotokopîkirinê, grafîk û poster hene (Masahura û Tomlinson, 2008:17).

1 Di vê nivîsarê de dema me têgeha *pirtûka dersê* bi kar anî armanca me *textbook* e, û bikaranîna *hînkerê* jî cihê *coursebook*'ê digire. Di vê xebata me de gava "hînker" tê nivîsîn mebest bi giştî pirtûkên perwerdeyê ne, û gava "Hînker" tê nivîsîn jî mebesta ew pirtûk e ku di vê nivîsarê de tê nirxandin.

2. ROLA HÎNKERAN

Hînkere cara ewil li Misrê hatine bikaranîn û xwedî dîrokeke 4000 salî ne (Oruç û Yavuz, 2013) û di nav hemû materyalên hînkere û alîkare de xwedî cihê girîng in. Hînkere hem ji bo xwendekaran hem ji bo mamosteyan çavkaniyeke bîngê in. (Özeş, 2012: 1).

Di vê serdema ku teknolojiya ragihandinê û ya dîtbarî ya wekî internet û medyaya sosyal û hwd. de ji hînkere çapkirî (hard copy) bîngê gelek dersan pêk tîne. Ew hem materyalên dersê hem ji kurteya bernameya dersê ne, lewre hemû hînkere li gorî bernameyeke hînkirinê (syllabus) tên amadekirin. Pirtûka dersê, ji aliyê bijartina materyalan ve alîkariya mamosteyan dike. ... Bi rêya materyalên ku di pirtûkê de li pey hev tên pêvajoya perwerdeyê pêngav bi pêngav bi rê ve diçe û bi vî awayî berdewamiya dersê pêk tîne. (Çakmak, 2001: 5-6). Ji ber vê yekê di destê mamosteyan de bernameya dersê nebe ji hînkere bi tena serê xwe çarçoveyên bikêr in (Özeş, 2012: 4). Heta Williams (vgz. Ansary û Babai, 2002) pêngaveke di wêdetir diçe û wiha dibêje; “Tişteki gelekî tinazî ye ku mamosteyên xwedî kêmtirîn qabiliyeta şîrovekirina niyetên pirtûkê yan ji nirxandina naverok û rêbaza wan, bi rastî ji bêtir pala xwe didin pirtûkên dersê.”

Lê ev nayê wê wateyê ku divê hînkere di dersan de her gav serdest bin. Heke hînkere cihê mamosteyan bigirin û hemû hînkirinê bigirin bin kontrola xwe dê hêmanên di ên pêvajoya perwerdeyê pasîvîze bikin. Hasan Ansary û Esmat Babai (2002) di xebata xwe ya ku têde li taybetmendiyên navneteweyî yên hînkerean digerin, tînin ser ziman ku divê mirov barên giran li ser milên hînkerean bar neke, lewre ew çend jêhatî bin ji di dawiyê de yek ji materyalên di destê mamosteyan de ne, bikêriya wan girêdayî jêhatiya mamosteyan e. Ji bo gelek mamosteyan îro ji rol û armancên hînkerean ne zelal in. Ew hînkerean bêtir wek bernameya dersê dibînin, ne wekî alîkarek. (İnal, 2006). Di vî warî de şîroveya Alan Cunningsworth (1995: 7) ji di cih de ye. Lewre ew girîngiya pirtûka hînkirinê dizane û cihê wê yê di dersê û bi giştî di perwerdeyê de, di asteke bilind de datîne lê belê serdestiya wê qebûl nake û ji bo qelîteya hilberên bernameya dersê vî halî tişteki xeternak dibîne:

Divê pirtûkên hînkirinê wek çavkanî bînin dîtîn ji bo gehiştina mebest û armancên ji berê ve li gorî pêdiviyên xwendekaran hatine danîn. Anku ew armancan diyar nekin û bixwe nebin armanc. Lewre karê me hînkirina ziman e, ne hînkirina pirtûkê. ... Têkiliya di navbera mamoste û pirtûka hînkirinê de mijareke girîng e û ya baş ew e ku di navbera wan de hevkarîyeke bi wî şiklî hebe ku her du alî ji li ser heman armancan li hev bînin û ji bo wan bi hev re bixebitin. Divê armancên pirtûkê û yên mamosteyî li hev bînin û her du alî ji bo tesbîtîkirina pêdiviyên xwendekaran bi hev re bixebitin.

3. RÊBAZÊN NIRXANDINA HÎNKERAN

Zanyarên ku li ser nirxandin û bijartina materyalên hînkariyê û bi taybetî jî nirxandin û bijartina hînkeran berhem dane bi piranî li ser sistematîkeke diyarkirî tevgeriyane, anku her yekê ji wan modeleke taybet ya nirxandin û bijartina hînkeran ava kirine. Di vê binbeşê de em ê modelên sereke yê di qadê de pêşkeş bikin. Di nav modelan de pêngavên nirxandina hînkeran û fikrên zanyarên qadê jî bi kurtasî dê bê dayîn. Paşî jî em ê pirtûka hînkirina Kurmancî ya bi navê *Hînker* li gor modela Alan Cunningsworth binirxînin.

Alan Tucker di sala 1975an de, di gotara xwe ya bi navê “Evaluating Beginning Textbooks (Nirxandina Hînkerên Destpêkê)” de modela xwe ya nirxandina hînkerên zimanî pêşkeşî raya giştî kir. Modela Alan Tucker li ser sê hêmanên giştî ava dibe (Tucker, 1975 vgz Ansary û Babai, 2002). Modela Alan Tucker yek ji modelên ewil ên qadê ye, ji ber wê taybetmendiya xwe ji bo gelek zanyarên wekî Penny Ur, Hasan Ansary&Esmat Babai û hwd. bûye modeleke mînak a nirxandin û bijartina materyalên hînkariyê û hînkerên zimanî.

Jeremy Harmer, di pirtûkên xwe yê bi navê “How to teach English” û “The Practice of English Language Teaching” de digel gelek mijarêndî ên derbareyê hînkirina ziman de, li ser meseleya pirtûkên dersê, û nirxandin û bijartina wan jî radiweste û fikrên xwe tîne ser ziman. Modela nirxandinê ya Jo McDonough û Christopher Shaw (1999 vgz. Petter, 2000) di bin banê du hêmanên giştî kom dibe. *Nirxandina derveyî (external evaluation)* û *nirxandina naverokî (internal evaluation)*. Modela John Dougill a nirxandina hînkeran ji çarçoveyê ku bername, unîte, mijarên naverokê û hêmanên dersê dihewîne pêk tê. Di vê modela xwe de Dougill li ser çar xalên girîng disekine (Dougill, 1987 vgz. Arıkan, 2008; Akış, 2006). Tom Hutchinson (1987 vgz. Akış, 2006) dibêje ku her materyaleke hînkariyê, nişaneyêke pêvajoya hînkirina ziman e. Modela wî ji çar pêngavan pêk tê. a) *diyarkirina pîvanan*, b) *analîza objektîv*, c) *analîza sêbjektîv*, d) *rûberûkirin*.

Alexandra Skierso di gotara xwe ya bi navê “*Textbook selection and evaluation*” de ku di sala 1991ê de hatiye çapkirin modela xwe ya nirxandin û bijartina hînkeran pêşkeş kiriye. Modela Skierso (1991 vgz. Akış, 2006) ji sê pêngavan pêk tê, *lênêrîn*, *analîz* û *biryargirtin*.

Neville Grant di pirtûka xwe ya bi navê “*Making the most of your coursebook*” de modela xwe pêşkeş dîke. Di modela wî de sê pêngavên nirxandinê hene; *nirxandina ewil*, *nirxandina bi hûrgilî* û *nirxandina di bikaranînê de*.

Wek têtê dîtin modelên nirxandin û bijartina hînkeran ên li jorê bi kurtî hatine danasîn kê m zêde wekî hev in. Hemû model di nav xwe de nirxandinê pêngav pêngav dîkin. Di her modelê de, çî dirêj çî kurt, listeyêke pîvanan heye û ev pîvan bîngeha nirxandinê pêk tînin.

Zanyarekî dî ê vê qadê Alan Cunningsworth di qada xebatê ya nirxandin û bijartina hînkera de bi du pirtûkan tê nasîn. Pirtûka ewil bi navê “Evaluating and selecting ELT teaching materials” e û di sala 1984an de hatiye çapkirin. Pirtûka duyem jî bi navê “Choosing your coursebook” e û di sala 1995an de hatiye çapkirin. Cunningsworth teorî û modela xwe ya nirxandin û bijartina hînkera di pirtûka xwe ya duyem de pêşkeşî raya giştî kirine.

Di vê pirtûka xwe de Cunningsworth (1995: 1-2) behsa du awayên sereke yên nirxandina hînkera dike: *Awayê ewil nirxandina rûxalî* (impressionistic overview) ye ya ku bi dîtineke lez, tenê bi nêrîna li berg û naveroka hînkere hewl dide ku aliyên wê yên serkeftî û yên lawaz derbixe holê û di derheqê taybetmediyên pirtûkê û potansiyelên wê de bigehe fikrekê. “Ev awayê nirxandinê bi kêrhatî ye lewre bi rêya wê em dikevin nava materyalê.” *Awayê duyem jî nirxandina hûrgilî* (in-depth evaluation) ye ku li analîzeke dirêj û bipîvan a hînkera digere. Mîrov dikare bibêje ku, di serî de modela nirxandinê ya Cunningsworth, hemû modelên ku em ê di bin vî binnavî de bidin nasîn di çarçoveya *nirxandina hûrgilî* de ne. Lewre modelên nirxandinê xwedî pergal û rêzêpîvanan in. Lê ji bo *nirxandina rûxalî* hewceyî bi tu sistematîkan nîne.

Aliyekî modela Cunningsworth ya ku wê ji modelên dî cihê dike, pêngavên pêvajoya nirxandin û bijartinê ne. Li gorî wî pêvajoya bijartinê ji van pêngavan pêk tê: Pêngava ewil *analîz* e, ku bi awayekî bêalî ji pirtûka dersê dane û agahiyan kom dike. Pêngava duyem *şîrovekirina* van agahiyên berhevkerî ye. Li vê derê tecrûbeyên mezin û şiyana profesyonel pêwîst e, lewre tiştên di analîzê de weşartî ne tîndahûrîn û meseleyên wekî girîngiya aliyên cuda yên hînkere tîndahûrîn (Cunningsworth, 1995: 9). Pêngava sêyem *nirxandin* e û ew jî ji qîmetdayîna li pey şîrovekirina daneyan pêk tê. Qîmetdayîneke bi vî awayî bivê neyê yekalî (sûbjektîv) ye, lewre heta radeyekê fikr û pêşaniyên nirxkeran nîşan dide (Cunningsworth, 1995: 9). Pêngava dawî jî *bijartina materyalan* an jî hînkere ye ya ku herî zêde li armancên perwerdeyê û rewşa taybet a dersê tê.

Wek tê dîtin modela Cunningsworth, modeleke pîralî ye. Ji bilî cure, rêber, pêngav û pîvanên nirxandinê, Cunningsworth (1995, 25-108) pêvajoya nirxandinê dabeşî heft qîsman dike û pîvanên xwe yên nirxandinê bi pîranî di bin banê van qîsman de rêz dike.

Seta Hînkere; Cunningsworth di vî qîsmî de li ser du hêmanên seta hînkirinê û lihevhatina wan hûr dibe, lewre li gorî wî hînkere bi tena serê xwe nabin û seta hînkere ji hêmanên wekî *pirtûka xwendekaran*, *pirtûka mamosteyan*, *pirtûka sarketan/rahênanan*, *test*, *materyalên xwendinê*, *materyalên guhdarîkirinê*, *qasetên guhdarîkirinê*, *qasetên bilêvîkirinê*, *vidyo*, *materyalên komputerî (CALL)* pêk tê (Cunningsworth, 1995:28). Lê ne hewce ye, heta ne mimkun e ku ev hêman bi

temamî di her setê de cih bigirin. Lê belê dîsa ji li gorî armancên dersê divê hînger ji aliyê hinek ji van hêmanan ve bê qewîkirin. Digel hebûna van hêmanan lihev-kirina van jî girîng e. Cunningsworth di vî qismî de li ser organîzebûna hîngerê jî disekine. Li gorî wî organîzebûna hîngerê ji pêşkeşî, berdewamiya pêşkeşiyê û dubarekirina pêşkeşiyê pêk tê (Cunningsworth, 1995: 28).

Naveroka zimanî; li gorî Cunningsworth, bingeha naveroka zimanî ji *rêziman*, *bêje û dengzaniyê (phonology)* pêk tê. Divê lê bête gerîn ka di hîngerê de kîjan mijarên rêzimanê hene û heta çî radeyê li pêdiviyên xwendekar tî (Cunningsworth, 1995: 32). Ji bo bêjeyan jî divê di her astê de herî kêr 1000 bêjeyên nû bî hînkirin û li gorî Cunningsworth divê rahênanên bêjeyan xwedî van taybetmendîyan bin: a) tîkiliyên semantikî, b) tîkiliyên rewşî, c) rêzîkên bihevve (collocations), d) tîkiliyên formî (Cunningsworth, 1995: 38). Dîsa Cunningsworth tîne ser ziman ku dengzanî aliyekî girîng e hînkirina zimanekî ye lê piraniya hîngeran guh nadin vê yekê (Cunningsworth, 1995: 41).

Bijartin û senifandin; li vê derê mebest bijartin û senifandina mijarên hîngerê ye, lewre bivê nevē ev her du pêvajoyan di bin bandora nêrîna nivîskarê pirtûkê de ne. Cunningsworth dibêje ku di nirxandin û bijartina hîngeran de divê aliyên ku bandor li nivîskarê hîngerê û bernameya (syllabus) wî kirine, bî diyarkirin. Li gorî wî bi giştî sê cure bername hene. a) *bernameyên bingeher-naverokî*, b) *bernameyên struktural û peywirî*, c) *bernameyên rewşî û bingeher-mijarî* (Cunningsworth, 1995:54-57). Hîngerên zimanî, li ber yek ji van bernameyan tê amadekirin. Di vî qismî de Cunningsworth li ser senifandina mijaran jî sekiniye. Li gorî wî senifandin, organzekirina mijaran a di nava hîngeran jî bernameyê de ye û ji *rêzîkirin* û *unîtekirinê* pêk tê (Cunningsworth, 1995: 59).

Şiyanwerî; pêşveçûna zimanekî ji gelek aliyên ve, pêşveçûna di çar şiyanweriyên zimanî (guhdarîkirin, axaftin, xwendin û nivîsandin) de ye. Divê lê bê gerîn ka hîngerê li ber armancên dersê û asta xwendekaran çend giranî daye şiyanweriyan. Gelek kes jî bo hînbûna zimanekî, hînkirina rêzimanê û bêjeyan têrê dibînin, lê di eslê xwe de divê naverok û mijarên hîngerê digel pêşveçûna di çar şiyanweriyên zimanî de bî hînkirin (Cunningsworth, 1995: 64).

Naverok, mijar û nirxên civakî; ev qîsim bi hêmanên nezimanî (non-linguistic) ên hîngerê ve mijûl e. “Hîngerên zimanî her çend navgînên hêsankirina hînbûna zimanî bin jî, ne tenê bi vî peywirê ve sînorkirî ne, lewre ziman di rewşên rastîn de jî bo armancên rasteqînê tê bikaranîn.” (Cunningsworth, 1995: 86). Ji ber vî yekê jî divê mijarên hînbûnê ji mînakên rasteqînê rojane bî bijartin. Dema vî yekê dike jî di peywenda civakî û çandî de tevbigere û rol û modelên di civakê de cih digirin jî nîşan bide. Bo mînak di metnê û rahênanan de cih bide çînan civakî, zayendên civakî û astengdaran.

Metodolojî; li gorî Cunningsworth, çawa ku her hînker li gorî bernameyekê hatiye amadekirin, herwiha her yek xwedî metodolojiyê hînkirina ziman e jî. Lê ev yek nayê vê manayê ku divê hînker ji bo bikaranîna rêbazekê mamoste û xwendekarên bide zorê. Di vî qismî de armanc haylêbûna rêbaza hînkerê ya hînkirina zimanî, rola ku ew didin xwendekarên û alîkariya wan a hînbûnê ye.

Rola mamosteyan; li gorî Cunningsworth divê hînker ji bo plankirinê, amadekariyê û pêşkeşiya dersê derfetan bide mamosteyan, herwiha ew rola mamosteyan wek hêsaner, rêber û rêveber pênase dike (Cunningsworth, 1995: 111). Cunningsworth digel pîvanên xwe yên giştî, di nava danasîna van her heft qisman de ji bo her yekê pîvanên cuda pêşkeş dike.

4. NIRXANDINA HÎNKERÊ LI GORÎ RÊBAZA CUNNINGSWORTH

Di vî qismê gotarê de em ê li gorî modela Alan Cunningsworth a nirxandina hînkeran hewl bidin ku nirxandinekê li ser *Hînkerê* bikin. Wek li jorin hatibû diyarkirin, Cunningsworth di serî de nirxandina hînkeran dike du beş, anku *nirxandina rûxalî* û *nirxandina hurgilî*. Em jî dê bidin pey Cunningsworth û ewil nirxandina rûxalî bikin û paşî jî derbasî nirxandina hurgilî bibin.

4.1. Nirxandina Rûxalî

Alan Cunningsworth ji bo qismê ewil ê nirxandinê pêşniyaz dike ku bi dîtineke lez li berg û naveroka pirtûkê bê nihêrîn da ku derbarê aliyên serkeftî û lawaz ên dîtbarî ên wekî berg, reng û organîzebûna hînkeran de mirov bibe xwedî fikrek. Seta hînkerê û organîzebûna wê dikevin nava nirxandina rûxalî.

4.1.1. Seta Hînkerê

Hînker (Tan, Önen, Aykoç, Varlı, 2013), ji bo hînkirina Kurdîya Kurmancî hatiye amadekirin. Set ji sê pirtûkan pêk tê, her pirtûk ji bo astekê hatiye amadekirin (Asta Yekemîn, Asta Duyemîn, Asta Sêyemîn). Pirtûka “Asta Yekemîn”, wek di bergê paşiyê de tê gotin ji bo kesên ku qet kurmancî nizanin hatiye amadekirin. Pirtûkên di jî ji bo kurmancîxêvan û kesên ku ji asta ewil derbasbûyîne hatine amadekirin. Pirtûka ewil ji 112 rûpelan, ya duyem ji 128, û ya sêyem jî ji 160 rûpelan pêk tê. Li ser bergê pêşî û yê paşiyê her pirtûkê wêneyek heye. Nav û asta pirtûkê, navên nivîskarên û weşanxaneyê li ser rûyê bergê pêşiyê cih digirin. Li ser rûyê bergê paşiyê jî nav û asta pirtûkê digel agahî û raveyên derbareyê amadekirina pirtûkê, mebestên wê û naveroka wê hatine rêzkirin. Di nava bergê pêşiyê de kûnyeya pirtûkê hatiye rêzkirin. Di rûpelê ewil de dîsa nav, ast, nivîskar û weşanxaneya pirtûkê hatine nivîsîn. Di rûpelên duyem û sêyem de tabloya naverok û plana pirtûkê hatine dayîn. Mijar, rêziman, armanc û peyvên her unîteyê di vê tabloyê de cih digirin

Wek ku li jorîn jî hat behskirin, li gorî Cunningsworth, hînkere bi tena serê xwe nabin û seta hînkere jî hêmanên wekî *pirtûka xwendekaran*, *pirtûka mamosteyan*, *pirtûka spartekan/rahênanan*, *test*, *materyalên xwendinê*, *materyalên guhdarîkirinê*, *qasetên guhdarîkirinê*, *qasetên bilêvkirinê*, *vidyo*, *materyalên komputerî (CALL)* pêk tê (Cunningsworth, 1995:28). Gava em li gorî vê listeya Cunningsworth li *Hînkere* dinihêrin, diyar dibe ku ligel *Hînkere* pirtûka spartekan nîne, li şûna wê di dawîya her unîteyê de beşeke bi navê “Spartek” heye û di wê beşê de derbareyê mijarên di unîteya borî de rahênan hene. Herwiha Hînkere jî materyalên guhdarîkirinê û temaşekirinê bê par e.

4.1.2. Organîzebûna *Hînkere* û Unîteyên Wê

Her pirtûk jî unîteyêke destpêkê, heşt unîteyên xweser û pêvekekê pêk tê. Jima-re, nav û mijarên her unîteyê di destpêka unîteyê de cih digirin.

Di destpêka her unîteyê de armancên unîteyê cih nagirin, lê belê peyv û têgehên di bin navê unîteyan de hene derbareyê naveroka unîteyê de dikarin wek delîl bînin. Hêmanên unîteyan sistematîk nînin. Li gorî mijarên di destpêkê de cih digirin dabeşkirina di nava unîteyan de tê kirin.

4.1.3. Nirxandina Hûrgilî

4.2.1. Naveroka Zimanî

Li gorî Cunningsworth, bingeha naveroka zimanî jî *rêziman*, *bêje û dengzaniyê (phonology)* pêk tê. Di *Hînkere* de piştî pêşkeşiya mijaran, rêzimana di wan mijaran de heye û ew jî tê ravekirin. Bi vî awayî dikare bê gotin ku wek rêbaza pêşkeşiya mijarên rêzimanê rêbazê dedûksiyonê hatiye bikaranîn. Ravekirina mijarên rêzimanê bi piranî di nava tabloyekê de tê kirin. Piştî ravekirinê, bi piranî rahênanên derbareyê mijara navborî cih digire. Bi vî awayî, derfeta dubarekirin û bikaranîna mijara navborî derdikeve holê.

Di her unîteyê de peyvên nû hene, di beşa “spartekan” de di bin navê “Xebata li ser peyvyan” çalaki û rahênanên derbareyê peyvên unîteyê cih digirin. Rahênanên peyvyan bi piranî jî “dagirtina cihên vala” pêk tên. Lê hin caran rahênanên wekî xaçepirs, çeprastkirina wateyan û hwd. jî tên bikaranîn

Dîsa Cunningsworth tîne ser ziman ku dengzanî aliyekî girîng e hînkirina zimanekî ye lê piraniya hînkere guh nadin vê yekê (Cunningsworth, 1995:41). Kirpandin aliyekî bingeîn e dengzaniyê ye û di hînkere zimanekî wekî Kurdî (kurmançî) ye ku xwedî tîpên hilmî û nehilmî, hişk û nerm û hwd. e, divê girîngiyê bidin dengzaniyê û ji bo hînkere û hînbûna wê derfetan saz bikin. Lê tu pirtûkên *Hînkere* di tu astan de çih nadin dengzanî û kirpandinê. Mirov dişêtê vê yekê wek kêmasiyeke sereke ya *Hînkere* bihesibîne.

4.2.2. Bijartin û Senifandin

Li vê derê mebest bijartin û senifandina mijarên hînkere in, anku çî tê hînkirin û bi çî rêzê tê hînkirin (Cunningsworth, 1995:54). Li gorî Cunningsworth bi giştî sê cure bername (syllabus) ên amadekirina hînkere zimanî hene. *a)bernameyên bîngêh-naverokî, b)bernameyên struktural û peywirî, c) bernameyên rewşî û bîngêh-mijarî* (Cunningsworth, 1995:54-57). Her hînkereke zimanî li ber yek ji van bernameyan tê amadekirin. Gava em li Hînkere dinêrin, diyar dibe ku ew li ber Bernameyên Struktur hatiye amadekirin.

4.2.3. Çar Şiyanwerî

Li gorî Cunningsworth pêşveçûna zimanekî ji gelek aliyan ve, pêşveçûna di çar şiyanweriyên zimanî (guhdarîkirin, axaftin, xwendin û nivîsandin) de ye. Divê lê bê gerîn ka hînkere li ber armancên dersê û asta xwendekaran çend giranî daye şiyanweriyan. Gelek kes ji bo hînbûna zimanekî, hînkirina rêzimanê û bêjeyan tere dibînin, lê di eslê xwe de divê naverok û mijarên hînkere digel pêşveçûna di çar huneweriyên zimanî de bîn hînkirin (Cunningsworth, 1995:64). Di *Hînkere* de di navbera çar şiyanweriyên zimanî (axaftin, guhdarîkirin, xwendin û nivîsîn) de hevsengî nîne. Di asta yekemîn de li du cihan çalakiyên xwendinê û li heşt cihan jî çalakiyên nivîsînê û rahênanên derheqê wan de hene. Li tu cihê pirtûkê çalakiyên derheqê şiyanweriyên axaftin û guhdarîkirinê nînin.

Di pirtûka duyem de ji li sê cihan çalakiyên xwendinê û li sêzdeh cihan çalakiyên nivîsînê û rahênanên derbareyê wan cih digirin, dîsa di derbareyê şiyanweriyên axaftin û guhdarîkirinê de tu çalakî nînin.

Di pirtûka sêyem de li çar cihan çalakiyên xwendinê û li şeş cihan jî çalakî û rahênanên derbareyê nivîsînê de hene, lê li tu cihên pirtûkê çalakî û rahênanên derbareyê şiyanweriyên axaftin û guhdarîkirinê de cih nagirin.

4.2.4. Naverok, Mijar û Nirxên Civakî

Li vê derê mebest hêmanên nezimanî yê hînkirina zimanî ne. Li gorî Cunningsworth di hînkere de ziman di rewşên rastîn de û ji bo armancên rasteqîn tê bikaranîn (Cunningsworth, 1995: 86) anku divê mijarên hînkirinê, metn û dîtbariyên derbare wan di peywenda civakî û çandî de bîn hîlbijartin û rol û modelên civakî bîn nimandin. Gava em bi berçavka çanda Kurdî li Hînkere dinirin, di vî warî de helwesteke aşkere derdikeve pêşberî me. Bo mînak navê lehengên metn û rahênanên Hînkere hema bêje hemû bi Kurdî ne (Dîlan, Bahoz, Qenco hwd.), lê belê, bi taybetî ji di pirtûka asta yekemîn de cil û bergên wan (paltoyên çermîn, kirasên milkurt hwd.), kar û pişeyên wan (parêzer, rojnamevan, hunermend hwd.) alav û amanên wan (şofben, tozmij, kompîtur hwd.) modern/Ewrûpayî ne. Heke kesekî biyanî yê ku qet Kurdan nasnake hewl bide ku ji pirtûka

asta yekemîn Kurdiyê hîn bibe, jixwe armanca pirtûka asta yekemîn jî hinkirna Kurdî bo biyanîyan e, dê bibîne ku hemû Kurd li bajar dijîn û jiyaneke gelek modern derbas dikin. Gelo ev yek çend li rastiya Kurdên bakur tê?

Diyar e amadekarên seta *Hînkere* bixwe jî hay ji vê yekê bûne ku di pirtûkên asta duyemîn û ya sêyemîn de hewl dane ku ji çand û kelepura Kurdan zêdetir mînak bidin. Di pirtûka asta sêyemîn de mijarên wekî jiyana gundan, cejnên Newrozê, û Çarşema Sor, dîmenên ji erdnîgarî û xwezaya Kurdistanê bêtir cih digirin.

Gava em ji bo cih û rola zayendên civakî yên li seta *Hînkere* dinihêrin, bi awayekî aşkere diyar dibe ku hevsengiyê zayendên civakî derdikeve pêşberî mirovî. Hema bêje di her pirtûkê de û di her ûnîteyê de wêneyên jin û zilaman hene û hemû jî xwedî kar û barên modern û bajarî ne. Ev yek, zêdetir wekî îdealîzasyonê diyar dibe. Lewre wek li jorîn jî hat diyarkirin, li Bakur, her çend koçî bajarên mezin ên wekî Diyarbekir û Wanê hwd. kiribin jî Kurd xwedî jiyaneke gundewar in.

4.2.5. Metodoloji

Li gorî Cunningsworth divê her hînkere li gorî bernameyekê û metodolojiyê hînkirina zimanî bê amadekirin. Gava em bi vî çavî li *Hînkere* dinihêrin, diyar dibe ku nivîskarên *Hînkere* jî bo hînkirina zimanê Kurdî rêbaza dedûksiyonê (têhîndarî) bikar anîye. Li gorî me rêbaza dedûksiyonê, rêbazeke serkeftî ya hînkirina zimanî ye, û di pêvajoya hînkirina zimanî de gelek zêde tê bikaranîn.

4.2.6. Rola Mamosteyan

Li gorî Cunningsworth di pêvajoya hînkirina zimanî de mamoste hêsanker, rêber û rêveber in (Cunningsworth, 1995: 111). Lewre divê hînkereke zimanî bi temamî nekeve cihê mamosteyan, jixwe hînkere yek ji materyalên hînkirina zimanî ne di destê mamosteyan de, ne ku cîgirê wan. Ji ber ku ligel seta *Hînkere*, pirtûka mamosteyan nîne, em nikarin peyda bikin ka gelo *Hînkere* di pêvajoya hînkirina Kurdî û bikaranîna wê pirtûkê de çi rol daye mamosteyan. Di *Hînkere* de mijarên rêzimanê û mijarên dî bi awayekî berfireh hatine pêşkeşkirin, di her ûnîteyê têra xwe rahênan hene û di dawiya her pirtûkê de jî bersivdanka wan rahênan heye. Dema mirov li van agahiyan dinêre, dikare bibêje ku xwendekar dikarin xwe bi xwe vê seta *Hînkere* bi kar binin. Her çend ev yeke wekî serfiraziyeke *Hînkere* bê dîtî jî, bi ya min ji ber ku ew hewl bide bi temamî xwe li şûna mamosteyan bi cih bike, *Hînkere* jî aliyê pîvanên rola mamosteyan yên Cunningsworth, seteke lawaz ya hînkirina zimanî ye.

5. ENCAM

Seta *Hînkere* ya ku bûye mijara wê gotarê di qada hînkirina zaravayê Kurmancî de pêşengek e. Beriya seta *Hînkere* hinek pirtûkên waneyên rêziman Kurmancî û

hînkirina alfabe yê derketibûn bazarê, lê belê pirtûka ku cara ewil bi îdiaya hînkereke zimanî (language coursbook) derketiye *Hînkere* e, jixwe nivîskar û amadekarên *Hînkere* vê yekê di danasîna setê de ya li ser bergê paşiyê diyar dikin.

Dema me li gorî pîvanên Alan Cunningsworth li ser Hînkere nirxandineke rûxalî û nirxandineke hûrgilî pêk anî, di encamê de me dît ku wek seta hînkirine di naveroka zimanî, çar şîyanwerî û rola mamosteyan de kêmasiyên *Hînkere* hene lê belê ji hinek aliyên wekî naveroka nezimanî û nirxên civakî û metodolîyê de Hînkere serkeftî ye. Herwisa rola mamosteyan zêde ne diyar e.

Em hêvî dikin ku ev xebata me ya ku li ser seteke hînkirina Kurdî hatiye amadekirin ji bo amadekarên hînkere dî ên zimanê Kurdî bibe rêvekerê û ji aliyê teorî û pratîka amadekirina hînkere de rêya wan veke. Herwiha bibe sedemê hînkere û setên hînkere ên baştir.

6. ÇAVKANÎ

- Akış, S. (2006). *A Comparative Study of Coursebook Evaluation and Selection Principles of EFL Teachers at State and Private Schools*, (Teza lîsansa bilind a çapnebûyî), Ankara: Hacettepe University. Institute of Social Sciences.
- Ansary, H., Babaii, E. (2002). "Universal Characteristics of EFL/ESL Textbooks: A Step Towards Systematic Textbook Evaluation". *The Internet TESL Journal*, Vol. VIII, No. 2, (ketina malperê 10.12.2014). <http://iteslj.org/Articles/Ansary-Textbooks/>
- Arıkan, G. (2008). *Textbook Evaluation in Foreign Language Teaching: Time For English, Grade 4 Teachers' And Students' Views*, (Teza lîsansa bilind a çapnebûyî), Adana: Tukurava University. Institute of Social Sciences.
- Awasthi, J. R. (2006) "Textbook and its evaluation" *Journal of NELTA*, V.11, I.1-2.
- İnal, B. (2006). "Coursebook Selection Process and Some of the Most Important Criteria to be Taken into Consideration in Foreign Language Teaching", *Journal of Arts and Sciences*, I.5, (ketina malperê 30.12.2014). <http://jas.cankaya.edu.tr/gecmisYayinlar/yayinlar/jas5/03-bulent.pdf>
- Cunningsworth, A. (1995). *Choosing your Coursebook*, Oxford: Macmillan Heinman.
- Çakmak, M. (2001). "Yabancı Dil Öğretimi", *Konuları Ders Kitabı İncelem Klavuzu/Yabancı Dil 4-8*, (ed.) Leyla Küçükahmet. Ankara: Nobel Yayın Dağıtım.
- Harmer, J. (2001). *The Practice of English Language Teaching*. (3rd Edition).
- İlköğretim Okulları Ders Kitaplarının Değerlendirmesi. (2008) Ankara: MEB.
- Kurt, Ş. (2015). *Nirxandina Hînkirina Pirtûka Kurdî: Hînkere, Li Gorî Nêrinên Xwendekar û Mamosteyan*. (Teza lîsansa bilind a çapnebûyî). Mardin: Zanîngeha Artukluyê. Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê.
- Masahura, H., Tomlinson, B. (2008). "Materials for General English", *English Language Le-*

arning Materials, (ed.) Brian Tomlinson. New York: Continuum.

Oruç, N., Yavuz, B. (2013). “Yabancı Dil Öğretiminde Ders Kitabı Seçimi”. *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, c.6. s.27.

Özeş, D. (2012). *Textbook Evaluation in Foreign Language Teaching: Spot on, Grade 8 from Student's and Teacher's Perspectives*. (Teza lisansa bilind a çapnebûyî). Bursa: Uludağ Üniversitesi. Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Petter, Wolfgang. (2000). *A Coursebook Evaluation*. (ketina malperê 20.12.2014). <http://www.birmingham.ac.uk/Documents/college-artslaw/cels/essays/sylabusandmaterials/petter3.pdf>

Pingel, F. (2004). *Ders Kitaplarını Araştırma ve Düzeltme Rehberi –Unesco*. İstanbul: Tarih Vakfı Yayınları.

Richards, J.C. (2001). *Curriculum Development in Language Teaching*, Cambridge: Cambridge University Press.

EXTENDED ABSTRACT

Numerous different materials are used in the process of language teaching. The border of educational materials is broad and anything can be used in the educational process according to practice and experience of the teachers. Since all the learning materials, coursebook especially, have a clear framework, they can be useful for teachers and instructors. One of those educational materials, and maybe the most common used is language coursebook. As there are more than one coursebooks in the bazaar, their evaluation and selection has become a phenomenon and a huge literature has emerged. Among others Jeremy Harmer, Alan Cunningsworth and Alan Tucker are the representatives and pioneers of this field. In this study we have made an external and an internal evaluation of a set of Kurmançî Kurdish coursebooks named *Hinker* based on criteria by Alan Cunningsworth, a prominent scholar of the field of coursebook evaluation and selection. He is well known by his book called “Choosing your coursebook”. In this book he explains and practices his own coursebook evaluation and selection methods, which are summed up under two main headings: *impressionistic overview* and *in-depth evaluation*. In impressionistic overview, one tries to form an opinion about the coursebook by looking at the cover and content of the coursebook, while in in-depth evaluation one examines and analyzes the coursebook in a deeper way in term of language content, language skills, teachers' role, non-linguistic content such as social values and also in terms of methodology. In this study we follow Cunningsworth's method and practice them on *Hinker*, a coursebook prepared to teach Kurmanjî dialect of Kurdish language. When we look at the coursebook cover and content list to conduct an impressionistic overview we have found that *Hinker* is a set of three books, each prepared for a level. On the back cover of first book, prepared for the Level-1, was written that it

was prepared for those who are not native speakers of Kurdish. The other two books were prepared for Kurdish speakers. As for in-depth evaluation we have tried to examine the set of Hînkere in terms of language content, ordering and sequencing, methodology, non-linguistic content, language skills, social values and teachers' role. The language content, which is generally grammar and related topics are presented by deduction method. The grammar subjects are given within a table. And there are exercises for subjects at the end of each unit. The set of Hînkere does not contain a teachers' book, that is why we cannot deduct the role of teachers while using Hînkere for teaching Kurdish. However the accessible and understandable presentation of the subjects and also the redundancy and variety of the exercises makes the Hînkere almost a self-study set of learning language, which can be an advantage in terms of methodology whereas a deficiency in terms of teachers' role.

As results of the study we found that as the set of language teaching coursebooks, *Hînkere* has deficiencies in terms of language content, language skills and teachers' role, however it is sufficient in terms of non-linguistic content such as social values and also in terms of methodology.

Heyranok ji Hêla Ziman, Şêwaz û Naverokê ve: Nimûneya Herêma Wanê*

Heyranok According to Language, Style and Context: Example of Van District

Mehmet YILDIRIMÇAKAR**

PUXTE:

“Heyranok” yek ji cureyên edebiyata Kurdî ya gelêrî ye. Di nav keresteyên edebiyata Kurdî ya gelêrî de heyranok li gorî ziman, şêwaz û naveroka xwe hêjayî gelek vekolîn û analîzan e. Xebata me li ser heyranokên li herêma Wanê hatine berhevkerin hûr dibe û hewl dide ku van heyranokan analîz bike. Me di serî de pênaseya heyranokê kir û di pey re li gorî herêmên cîyawaz navên ku ji bo heyranokê têne bikaranîn tesbît kirin. Paşê, heyranok di çarçoveyê zanistî de, li gorî rê û rêbazên zanista çand, folklor û edebiyatê ji hêla ziman, şêwaz, naverokê ve hatin analîzkirin. Di encamê de hat dîtin ku heyranok kurtehelbestên lîrik in û ji bo heyranê têne gotin. Heyranok berhemeke anonîm e. Mijara heyranokan evîn û evîndarî ye. Heyranok bi zimanekî sade hatine honandin.

Bêjeyên sereke: Heyranok, folklor, helbesta Kurdî ya gelerî, evîn.

ABSTRACT:

“Heyranok” is a type of Kurdish Folk Literature. In Kurdish Folk Literature, Heyranok worths to be studied and analyzed with its language, form and context. Our work focuses on the heyranoks collected from Van District and tries to analyze these heyranoks according to some aspects. We first introduced heyranoks and then determined various names used for heyranoks in different regions. Then heyranoks were analyzed in a scientific frame

* Ev gotar ji teza masterê derçûye ku bi navê “Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de Mînaka Herêma Wanê” pêşkêşî Zanîngeha Mûş Alparslanê, Enstîtûya Zanistên Cîvakî, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî bûye.

** Xwendekarê Doktorayê li Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, Zanîngeha Bîngol-Mûşê, Turkiye/ PhD student at Department of Kurdish Language and Literature, Bîngol-Mûş Univ., Turkey.
e-mail: mehmetyildirimcakar@gmail.com

according to methods of cultural studies, folklore and literature and in accordance with language, style and context. As a result we found out that heyranoks are short lyric poems and are said for admiring. Heyranok is an anonymous type. The topic of heyranoks is love. Heyranoks are built with a simple language.

Keywords: Heyranok, folklore, Kurdish anonym folk poetry, love.

1. DESTPÊK

Folklor, zanîna gel e û di heman demê de navê zanista ku bi “zanîna gel” ve mijûl dibe ye (Dorson,2016). Edebiyata gelêrî jî binbeşeke folklorê ye. Berhemên edebiyata gelêrî di nava jiyana rojane de, bi awayekî devkî, têne ristin û ji nifşan derbasî nifşan dibin. Helbesta gelêrî jî binbeşeke edebiyata gelêrî ye ku heyranok jî wek cureyekê dikeve nav vê binbeşê.

Xebata me xebateke sehayî ye. Me li Herêma Wanê, li qadên cuda û ji kesên cuda, rûbirû heyranok berhev kirin, derbasî ser kaxizê kirin. Ji bilî van heyranokên li qadê hatine berhevkirin, me ji gelek pirtûk, tez û gotarên li ser heyranokan hatine nivîsîn jî îstîfade kirin. Hema bêje li gorî lêgerîna lîteratûrê çî xebata ku têkiliya wê bi heyranokan re heye, me lê nihêrî.

Danasîn û analîzkirina heyranokan du hîmên bingeşîn in ku xebata me pala xwe dayê. Armanca me ev e ku empênaseyên ji bo heyranokan hatine kirin bi gelek hêlan ve veçirin, ferq û hevpariya wan pênaseyan diyar bikin. Li gorî herêmên cuda navên ku ji bo heyranokê têne bikaranîn destnîşan bikin. Herwiha di çarçoveya rê û rêbazên zanista çand, folklor û edebiyatê de ji hêla ziman, şewaz û naverokê ve analîz bikin.

2. HEYRANOK WEKE NAV Û TÊGEH

Li ser têgeha heyranokê pênaseyên curbicur hatine kirin. Di nav van pênaseyan de gelek xalên hevpar û yên cuda hene. Em dê li jêr wan pênaseyan veçirin û binirxînin.

Xalid Sadînî heyranok ji hêla naverok û şiklê ve daye nasîn. Li gor Sadînî: Heyranok, kurtehelbestên lîrik in. Li ser eşqê, evînê, pesnê yaran, delalî û spehîtiya wan e ku keç û kurên Kurdan ji bo hevdu çêkirine. Jê re payîzok û panok jî tê gotin (Sadînî, 2011: 9). Her çiqas li gor Sadînî ji heyranokan re payîzok jî tê gotin, ev agahî ne rast e. Wekî ku Kardaş jî diyar kiriye:

Payîzok (Pîrepayîzok) stranên ku di dema vegera ji zozanan ango di demsala payîzê de têne gotinin. Ji bêjeya payîzê hatiye pê. Cureyeke ku tê de huzn, bêhêvîti, xemgîniya veqetîna ji zozanan tê ziman (2017: 136).

Ehmed Ebdullah Zero pirtûkek bi navê Strana Lîrîkî Heyranok nivîsiye. Ji navê pirtûkê jî diyar e ku Zero heyranokê weke straneke lîrîkî îfade dike. Zero di vê pirtûkê de heyranok ji hêla etîmolojiya peyvê ve pênase kiriye:

Ev peyvewek xwiyaye kurtkirin e ji peyva heyran ku pişkek mezin û belav e di strana Kurdî da. Her wisa bi paşpirta “ok” kurt kiriye û hatiye biçûkkirin ji bo egerê xoşkok-kirina babetê û kurtiya rêz û beytên wê (Ji Zero vgz. Sadîni, 2011: 13).

Heyranok berhemên rojane yê edebî/wêjeyî ne û piraniya wan jî hevdeng in. Dema ku keç û xortên Kurdan civiyane û hatine cem hev, wek dîlan, serîlêdanan de an jî dema karên rojane yê wek; dew û meşk kiyandinê, savar kutanê, hirî şuştinê û hwd. bi piranî jî dema ku ji bo bêrîvaniyê çûne zozanan bo şahiyê ji hevdu re gotine û hestên xwe parve kirine. Ji aliyê keç û xortan ve carna li hember hev carna jî bi tena serê xwe têne gotin. Dema ji aliyê naverok û şêweyê ve bê vekolîn tê dîtîn ku berhemên wêjeyî ne û naveroka wan evîna keç û xortan e. Heyranok bi taybetî di dema ciwaniyê de hatine çêkirin. Hinek bi hestên platonîk, hinek jî bi hestên eşkere hatine gotin. Heyranok bi piranî bi newayekê hatine honandin (Yıldırımçakar, 2015: 39).

Mijara heyranokan eşq, kul û êşa ji ber eşqê, negihêştin e. Di navbera keç û xortekî an jî di navbera çend keçîk û çend xortan de li hemberê hevdu tê gotin. Komek rewşa xwe tîne ziman û koma din jî bersivê dide wan. Bi piranî dema çûyîna zozanan di rê de tê gotin (Kardaş, 2017: 130).

Li gorî Hamelink: Heyranok rîtm in, ne stran in. Cureyên xweşik hene, yê cidî hene, yê polîtîk hene û yê erotîk hene. Heyranok li ser wan kesên ciwan in ku ji hev hez dikin û eşq û evîna xwe nîşanî hevdu didin. Ango heyranok di derbarê eşqa keç û xortan de ne (2013: 413).

Kaplan jî heyranokan wekî stranan pênase dike. Ew wiha dibêje: Heyranok, heyranbûnê îfade dike. Ev strana evîndar û dildaran e. Keç û kurên evîndar davêjin ber hevdu. Hemû naveroka heyranokê li dora evînê dizivire. Straneke sivik û xweş e. Ji bendên cuda û serbixwe pêktên. Sernavê heyranokan tune ye. Bi awayekî serbest û bivekêş hatine honandin. Heyranok bi gaziya “kurko dîno”, an jî “keçkê dînê”, dest pê dikin. Li Kurdistanê heyranok gelek berbelav in (2015a: 164).

Ji bo heyranokan navên curbicur têne bikaranîn û ev nav li gorî herêman diguherin. Li başûrê Wanê Qelqelî û Serayê jê re dibêjin “qaydê qîzikan”. Li Botan, Behdînan û Miksê peyva “heyranok tê bikaranîn” û li Gevê dibêjinê “mîqam”.

Li navçeya Urmîyê nava’êşîrên Şîkak û Herkiyan, ji van stranan re “lawjê keçîk û kurikan” dibêjin, li navçeya Makûyê nava’êşîra Celaliyan jî ji wan re dibêjin “kilamên qîz û xortan” (Surûş, 2016: 13).

Heyranok, çarînên evînê ne, bi piranî ji hêla jinan ve hatine honandin. Derbirina eşq, hezkirin, pejirandin û heyranbûna jinekê an mêrekî, bi piranî di dema ciwaniyê de, ya li hember hevdu ye. Em dema ji hêla naverokî û şiklî ve lê binêrin, em dê bibînin ku berhemên edebî ne. Rêbazeke vegotinê ya lirîk derdikeve pêş. Ev yek jî heyranokê dike berhemeke edebî. Hin mînakên heyranokan yên ku derveyî ristina vekêşê ne, ew jî xwediyê newayeke xurt in. Divê em ji bîr nekin ku heyranok berhemên devkî ne ku ew bi newayekê têne gotin (Kutlar, 2010: 33).

Heyranok ji peyva ‘heyranê çêbûye. Ji bo bi hêsayî bêne jiberkîrin, keçîk û kurîk, bi zimanekî xurt lê xwerû û sivîk, distirînin. Heyranok, zimanê evîn û evîndariyê ne, di navbera du dildar, evîndar û aşîqan de hatine gotin. Di demên berê de, evîndaran xem û kovan û gazindên xwe bi rêya heyranokan ji hev re gotine. Em dikarin bibêjin ku heyranok gilî û gazindên evînê ne. Gilî û gazindên keç û kurên evîndar in, ku nikaribûn bigehîne miraza dilê xwe (Surûş, 2016: 11).

Heyranok berhemên anonîm in. Ango di heyranokan de mexles tune ye û yên ew heyranok ristine ne diyar in. Lê dema min berhevkarîya heyranokan dikir, ji min re digotin: Ev heyranoka han dilê filan kesî ketibû qîza/kurê filan kesî ev heyranok ji bo wî çêkiribû (Koşmaz, 2013). Lê bi borîna demê re heyranok bi awayekî devkî û siruştî ji nîşên berê derbasî nîşên nû dibin û dibine malê civakê.

Heyranok di koşk û dîwanan, civatên keç û xortan de têne gotin û bi peyvên wek “kuro dîno”, “kuro gede”, “keçkê dînê” û hwd. dest pê dikin. Ji bo kes nizanibe ka ev heyranok ji bo kê hatiye gotin, dilê wî ketiye kî, bi vî awayî dest pê dikin.

Surûş, gotinên heyranok pê dest pê dikin wiha rêz kiriye: Delalê, delalo, delalîkê, delalîko, delal heyran, lawîk heyran, keçîkê dînê, kurîko dîno, keçîkê canê, kurîko cano, kuro gede, êtîm gede, lolo delal, lêlê delal, heylo delal, heylê delal, keçîk dibêje/kurîk dibêje, lawîko delal, lawîko dîno, kuro lawîko û hwd. (2016: 13).

Beşîr Botanî dibêje, heyranok, berhemên jinan in û bi piranî ji aliyê keçîkan ve hatine gotin. Ev cure rasterast bi jiyana jinan a civakî re têkilîdar e. Jinik û keçîk bi gotina heyranokan hestên xwe, şabûnên xwe, di heman demê de kul û derdên xwe îfade kirine. (1995: 12).

Heyranok, di nav keçîk û lawîkekî de duwet e. Têkiliyeke rasterast di navbera heyranok û jiyana koçberiyê de heye, gava koçer diçin zomayên xwe, van stranan distirên (Turgut, 2010: 128).

Heyranokên weke duwet keç û xort davêjine ber hev jî hene. Gilî û gazindên xwe bi hêla van heyranokan bi hev re par ve dikin. Em dê li jêr mînakê ji van heyranokan yên ku me li qadê berhevkiribûn pêşkêş bikin.

Keçik:

Tu kurapê mîn î kero
 Malê heft qîrala, danzde dûwala xu da sero
 Te ne 'z xastim ne 'z revandim
 Te dame yekî xelkê xerîb, li heft bavê me jî dero

Kurik:

Tu qîzapa min kotîyê
 Berê berda min gotîyê
 Te yê digot ez ê nakim xubxutîyê (Çalış, 2013).

Heyran, heyranok tê wateya stranên bi taybetî li ser evînê. Ev cudahiya di navbera lirîk û vegotinê de, li gelek deveran di cî de ye, lê ev girîng e ku divê em ji bîr nekin, ev ne teqez e; gelek rewşên mîsoger nînin hene. Weke mînak; straneke ji hêla dengbêjekî ve tê gotin dikare gelek cure hêmanên vegotinê bihewîne (Allisson, 2010: 44).

Di Hawarê de bi navê “heyran”, helbesteke ji çar bendan pêk tê heye. Bi rastî ev ne helbesteke çarbendî ye, ev ji çar heyranokan pêk tê, heyranokên ku kur û keç diavêjinberhev. Keçik benda yekem û ya sêyem dibêje û kurik di benda duyem û dawîn de bersiva keçikê dide. Li gorî jêrenotê em dizanin ku ev li herêma Botan hatiye berhevkirin. Keçik bi bêjeya heyran gazî yarê xwe dike.

Heyran¹
 Heyran! Îşev meçe, li hire be,
 Wê bê pêşîya heyranê min nijda şemer û 'ereb e,
 Wê te bikujin, xelkê bêjin, Eşmelana reben biye serê loman û sebeba
 Li ser serê min hat heyran, mêhvanê pêşmexribê.
 Heyran Xwedê xerab bike Keşanê!
 Xaniyê Mîr Ehmedê min raserî kolanê
 Mîn ê divê ez ê şeva nivê şevê herim tewafa xal û nişanê gerdenê
 Devê min şemitî, ketî bi ser lefika kitana Eşmelanê.
 Heyran tu xirab î
 Tu li derê mala babê min rûdinî, qet ranabî;
 Ti we bikî, ez ê bêjim bab û brayên xwe
 Ev sêwiyê heyrana ji min venabî.
 Heyran di go keçikê ez xirab im,
 Ez li ber derê mala babê te rûdinim, qet ranabim.
 Ti nebêjî bab û birayên xwe
 Ti bêjî xunkarê dîne îslamê ez ji te venabim.

1 Ev heyraneke Botanê ye; serekêjêliyan bi xwe ji me re gotiye. (1941: *Hawar*. J. 33).

Heyranok cûreyeke stranan e ku tê de mijarên weke evîn, dînbûna di rêya Xwedê de, gilî û gazindên ji ber evînê, xerîbî, 'evdalbûn, poşmanbûn, xapandin, xwe gorî kirin û hwd. cî digirin (Farqînî, 2004: 809). Rast e ku mijara heyranokan evîn û evîndarî ye û temaya evînê tê de serdest in lê ev evîn, evîneke beşerî ye û evîna îlahî tê de tune. Loma jî em nikarin bibêjin, mijarên dîndariyê, an jî mijarên dînbûna di rêya Xwedê de mijarên heyranokan in.

Rêkêş Amîdî heyranok bi gelek hêlan ve daye nasîn: Heyranok beşek ji strana Kurdî ya resen, pêkhatî ye. Tê de çend risteyên hozanan, sivik û tamxweş; bi kêş û vekêş hene. Straneke kurt, bi selîqe ye. Hemû bendên wê li ser evînê ne. Ji ber ku kur û keç davêjne berhev, tama evînê jê difûre û loma tama wê bi salan wekî xwe dimîne. Di vehanîna heyranokê de bêtir para keça Kurd heye. Li heyranokan jî diyar e ku keça Kurd xwediyê hesteke nazik, dilekî vekirî û evîneke paqij e. Digel vê kurê Kurd jî heyranok gotine, keç û kuran heyranok bi saliqeyên sivik û xweş avêtine berhev, ev heyranok hatine jiberkirin. Ji layê evîndaran ve destbidest gihandine. Lê mixabin gelekên wan windabûne. Heyranok, stranên lîrik, her risteyekê hemî dimen, wêneyên rengîn, nexşên nû û rengîn, hest û sozan bi rengê berçav dike. Girêdana soz û peyman, dilsozî û rastgoşî derdixe pêş. Heyranok rengê strana Kurdî ya folklorî ye. Pirsoz û wefadarî, hezkirinekepaqij, digel xem û xweşiyê peyda dibe û xwe bi tîtal û rewşên bilind û paqij ve digel evîneke dijwar û dûr û tamsarve girêdide. Selîqe heyranokan gelekî sivik in, ango em dikarin bibêjin bi awazeke taybet tene gotin. Ger hest li ser xemeke pirêş û azar bin, awaz dê melûl be. Carinan jî evîndar bi awayekî xweşdivê, pesn û methkariyê ji berdilkê xwe re dibêjin. Vêga awaz diguhere, bi awazekî sivik, dilter tê gotin. Ji ber ku tîkiliya Kurdan bi neteweyên derdorê re çêbûye, peyvên biyanî jî ketine nava heyranokan. Peyvên erebî yên weke; qelem, mektûb, mehkeme, qazî, kefil, esker, mecal û hwd. û peyvên tirkî yên weke; beg, oldaş û hwd. derdikevine berçavê me. Ji ber ku herêma Badînî cîranê farisan nîne peyvên farisî di heyranokên vê berhemê de berçavê me neketin. Lê birastî ev peyvên biyanî tu xirabiya wan bi zimên re tune ye û astê heyranokê neaniyê jêr. Tu ziman tune ye ku tê de peyvên biyanî tunebin (2010: 9).

Li gorî xebata me li qadê kirî û berhemên li ber destê me, em heyranokê wiha pênasê dikin; heyranok cureyek ji helbesta gelêrî ye. Kurtehelbestên lîrik in. Vehonanên heyranokan ne diyar in loma heyranok malê gel in. Bi newayekê tene gotin. Aheng bi berma û vekêşan saz dibe. Di dema ciwaniya keç û xortan de hatine ristîn. Mijara heyranokan evîn û evîndarî ye. Temaya bingeîn a heyranokan evîn e û temayên din jî bi evînê re tîkilîdarhene. Her çiqas navê heyranokê li gorî herêman biguhere jî navê herî belav û tê zanîn dîsa heyranok e. Heyranok ne stran in lê xwediyê rîtmekê, newayekê ne. Dîsa ne cureyekî dûrîkan in. Ji hêla şiklî û naverokî ve cureyekî serbixwe ye. Heyranok ne berhemên edebiyata dengbêjiyê ne, berhemên edebiyata gelêrî ne.

3. HEYRANOK JI HÊLA ZIMAN, ŞÊWAZ Û NAVEROKÊ VE

Di helbesta gelêrî de gelek ûnsûr hene ku ziman û şêwazê ava dikin. Em dikarin van ûnsûran wiha rêz bikin; bikaranîna peyvên herêmî, biwêj û gotinên pêşyan, peyvên dubare û peyvên xurtbûnê saz dikin, terza saz kirina îmgeyan, bikaranîna hest, xeyal, motif û sembolan, çiyawazî û dewlemendiya peyvan, dinêya fikr û mecazê, bikaranîna hunerên vegotin û wateyê, ristina vekêş û bermayan, ahenga hundirîn, feraseta estetîkî, tecrubeyên civakî, dorhêla çandî, ol û baweriyên civakê. Ev ûnsur tev ziman û şêwazê diyar dikin (Artun, 2012: 69).

Di heyranokan de bi mebesta coş û kelecaneke saz bike şêwaza xitabê; ji bo civakê û yare/heyranê rexne bike, gilî û gazindên xwe jê re bêje, kêmasiyan bide berçav şêwaza hicivê têne bikaranîn. Dîsa bi mebesta bûyer di hişê mirovan de zindî bibin, bandorekê bidinê, şêwaza li hember hev axaftinê; ji bo mijarên hestiyar yên weke evîndarî, bextewarî, jiyân, bêrikirin, hezkirin û hwd. bi awayekî sade, xwerû/tisî, jidil, samimî û siruştî bêne pêşkêşkirin şêwaza lîrikê têne bikaranîn. Û ji bo yarê, heval û hogiran, dê û bavan û hwd. bi hêlên wan yên baş ve derbixe pêş şêwaza pesindayînê, bi mebesta heyberan bi rêya şayeseran vebêje şêwaza teswîrê û li hember rewşeke xirab an jî bêçaretiyê şêwaza lavayê têne bikaranîn.

Berhemên edebiyata devkî bi zimanê gel hatine honandin. Ji ber vê yekê ye bi sedan sal in wînda nebûne, gêhiştine roja me. Ev rewş di dema me de jî didome. Yê berhemên gelêrî çêdikin, zimanê gel, zimanê herêmê bikartînin, taybetiyên zimanê gel bi hêsani di berhmenên xwe de pêşkêş dikin (Kardaş, 2017: 103).

Zimanê heyranokan, zimanekî gel jê fêm dike ye. Ji ber ku heyranokbêj keç û xortên civakê ne, di nav gel de mezinbûne, di nav çanda gel de gihîştine; li gorî dorhêla çanda xwe heyranok honandine, peyvên di zimanê gel de cigirtî bi kar anîne. Ji ber vê yekê jî di heyranokan de peyvên biyanî zêde nehatine bikaranîn, hebin jî rêjeya wan gelekî kêm in. Di heyranokan de peyvên ku wateya wan ji hêla herkesî ve têne zanîn hatine tercîh kirin.

Ristarên heyranokan kesên ji gel in û heyranokên xwe bi zimanê gel honandine. Zimanê jiyana rojane bi hemû taybetmendiyên xwe ve di nav heyranokan de heye. Bi bandora vê yekê jî axaftinên rojane, derbirînên jidil, gotinên herêmî, gotinên qalibî, biwêj û gotinên pêşyan û hwd. gelek hatine bikaranîn. Loma jî zimanê heyranokan nêzî zimanê axaftina rojane ye. Ji ber ku piraniya heyranokbêjan nexwende bûne, zimanê gel yê axaftinê bikaranîne û ev ziman, zimanekî siruştî ye.

Li gorî Dundes: Her cure ûnsurên vegotinê/devkî, divê li gorî tevî (texture), metn (text) û dorhêl û şertûmercên (context) wê bêne terîf kirin. Ji van hersê tiştan bitenê bi yekî ne mumkun e ku cureyek bikaribe bê terîf kirin. Cureyek tenê bi çavdêriya van hersê tiştan pevire dikare bi awayekî têr û tekûz bê terîf kirin. Dem û wext her û

her diguhere û diperise, bi têkilî vê yekê pêdivî û şertûmercên civakê jî diguherin û diperisin. Loma jî cureyekî vegotinê li gorî taybetiyên konteksa/dorhêla ku tê de dijî û belav e, dikare bê terîf kirin. Berhemek di nava civakê de, li gorî şertûmercên civakê, dizê, mezin dibe û diperise (2014: 41). Vêga em dikarin bibêjin ku ziman û şêwaza ku di heyranokan de hatiye bikaranîn, li gorî yên heyranok honandine û yên bûne muxatabê heyranokan, ketiye şikl û rengekê.

Di heyranokan de peyv û gotinên herêmî gelek in. Ango weke helbesta klasîk zimanekî standard nayê bikaranîn. Heyranok li gorî herêmê, li gorî devoka herêmê têne honandin. Ango her heyranok ji hêla zimanî ve xasî herêma xwe ye. Heyranokbêj kesên ji gel in û li gorî dorhêla çanda xwe digihîjin. Tiştêkî siruştî ye ku peyv û gotinên herêmî, devoka herêmî di heyranokan de hebin.

Heyranoka jêr bi zimanekî herêmî hatiye honandin. Ew kesê ev heyranok ris-tiye ji herêma Badînî ye. Jixwe ev yek li heyranokê jî diyar e. Di risteya pêncem de “çavêt min kore bin” derbas dibe. Di Kurdiya standard de weke “çavên min kor bin” tê gotin. Û dîsa di risteya dawîn de “li kîve ye” derbas dibe. Ev gotin jî gotineke herêmî ye, di devoka Badînî de tê bikaranîn. Standarda vê gotinê weke “li ku ye” an “li ku derê ye”, ye. Ji ber ku ev heyranoka li herêma Badînî zaye, bi zimanê herêmê hatiye neqîşandin.

Rêka rezi ber qible ye
Tiryê rezi baleta ye
Bejna min vêvdala Xwedê
Çenda bilind e minare ye
Belê çavêt min kore bin
Bejna delalê lawkê min
Ez nizamim li kîve ye (Amîdî, 2010: 440).

Tecrube û çavdêriyên salane bi şiklê gotinên pêşiyar dikevîne qalibekî, ew tecrube û zêrevanî di nava xwe de şîret û hukmekî dihewînin. Ji ber ku bi gotinên kêr û kurt, tiştên zehf û dirêj vedibêjin, hem di jiyana rojane de hem jî di berhemên edebiyata gelêrî de têne bikaranîn. Di heyranokan de gotinên pêşiyar derdikevin pêşberî me. Heyranokbêj gotinên qalibî yên gel jê hezdike, raxbetê lê dike bi kar tînin û heta, peyv û gotinên nû jî diafirînin. Di heyranoka jêrî de gotineke pêşiyar hatiye bi kar anîn. *Du serê çê tev naçîne ser balgiyekî.*

Kuro gede min li pîkî te li pîkî
Ava gundê me dikişe heft newala, Suphangolê tev geliki
Qîzê mala bavê min dêrê wan e çiftexasê xasçirpîkî
Kuro gede qe kesî dewr i zemanê kevn da nedîtye,
Du serê çê tev biçine ser be'lgîkî (Yıldırım, 2013).

Di edebiyata gelêrî de biwêj, bi mebesta helbest zindîtir be, vegotin çalaktir be têne bikaranîn. Di heyranokan de jî biwêj têne bikaranîn. Ji bilî biwêjên li her derî têne bikaranîn, biwêjên xasî wê herêmê jî têne bikaranîn.

Lava û nifir di ristên heyranokan de bi awayekî belav derdikeve pêşberî me. Ji lavayan bêtir, nifir weke sembolekî cihê xwe heye. Evîndaran, dema berhemberî eşqa wan pûç derketiye, li hemberî niheqî, bêçaretî, xiyanet û bêsoziyê hestên xwe bi nifiran anîne ziman.

Em cînarê derbider in
Em di bejnê da berhember in
Heçyê orta me herduka da pîs xeberde
Ew ne ometa pêxember in (Özbek, 2013).

Dîsa heyranokbêjan ji bo derbirinan ji hêla wateyê ve xurtir bikin, bondora wê zêdetir bikin û herheyîna kirinekê nîşan bidin ji dubareyan îstîfade kirine. Di heyranokan de, hem di heman risteyê de, hem jîdi heman bendê de, dubarekirina peyvên hevdeng, hemwate û diywate hatine bikaranîn. Di vê heyranoka jêr de gelek bêje û pêvek hatine dubarekirin. Peyvên *ez* û pêvekên *me* û *ê* di hemû risteyan de hatine dubare kirin. Bi vî awayî wate û aheng xurtir bûye.

Kuro gede ez girara dewteze me
Ez ê tijî pûnga Axlece me
Ez ê ji xelkê ra sed im sedisî me
Ez ê ji delalyê dilê xu ra bêpol û bêpere me (Koşmaz, 2013).

Di heyranokan de hunerên edebî jî di gelek cihan de hatine bikaranîn. Di vê heyranoka jêr de gelek cure hunerên edebî hatine bikaranîn. Di risteya duyem de sê peyvên nêzî hev hatine bikaranîn. Bi bikaranîna peyvên gurz, çîmen û zevîyê hunera tenasubê hatiye sazkirin. Di risteya sêyem û ya dawiyê de peyvên diywate hatine bikaranîn, ango bi peyvên par û îsal hunera tezatê hatiye sazkirin. Dîsa peyva dil du cara di heman risteyêde hatiye dubare kirin. Li vir hunera tekrîrê heye. Û di risteya dawîn de manendin heye. Têkçûna evîne bi daçeka mîna şibandiye wergerana dîzikadenê.²

Kuro gede pezê te hejîya
Avêt gurz i çîmena, dor zevîya
Gede par vî çaxî dilê min te dil bû
Îsal vî çaxî bîna dîza denê wergerîya (Sayin, 2015).

2 dîzika rîs tê de tê boyaxkirin.

Heyranokên bikêşû yên bêkêş hene. Li gorî xebata me li qadê kirî piraniya heyranokan bêkêş in ango kêşa piraniya heyranokan serbest e. Lê herçi qas di heyranokan de kêş tune be jî, ji bilî çend rewşên awarte, di piraniya wan de hejmara kiteyên risteyan nêzî hev in. Û li gorî vekolînên me di heyranokan de kêşa arûzê qet nehatiye bikaranîn. Heyranoka jêrîn li gorî kêşeya kiteyî hatiye ristin. Her çar riste jî ji heşt kiteyan pêk tên.

Kuro gede Kurhesinî
Tu hem gul î hem sosin î
Dinya ‘alem bibêje jî,
Tu serdilka dilê min î (Yıldırımçakar, 2013).

Behremendiya heyranokbêjan, dorhêlên heyranok têne gotin, şikl û terzên vegotina heyranokan, guhdarvanên heyranokan, ziman û şêwaza heyranokan tayîn kirine. Heyranok li gorî asta dorhêla çandî hatine honandin. Di ziman û şêwaza heyranokan de peyvên di zimanê rojane de têne bikaranîn, yên weke; biwêj, gotinên pêşiyar, peyvên dubare, peyvên xurtbûnê sazîkin, taybetiyên şiklên kevneşop, hunerên edebî û terzên vegotinê hene.

4. ENCAM

Me di vê xebata xwe de li herêma Wanê heyranok berhevkerin, derbasî serkaxizê kirin. Paşê me lêgerîneke lîteratûrî kir û pirtûk, berhevkarî, gotar û agahiyên berî niha li ser heyranokan hatine kirin kom kirin. Piştî vê me li gorî van heyranokên me li qadê berhevkerî û çavkaniyên li ber dest, heyranok dane nasîn û ji hêla ziman, şêwaz û naverokêve heyranok analîz kirin. Piştî vê vekolîna xwe em gihîştin van encamên jêrîn:

Dorhêla çanda devkî ya Kurdan gelek dewlemend e. Heyranok jî berhemên vê çandê ne, di vê dorhêla çandê de dizên, mezin dibin û ji nifşan bo nifşan vediguhêzin. Hat dîtî ku ev çand ji hêla heyranokan ve jî gelek dewlemend e û heyranok hêjayî gelek lêkolînan e.

Ji bo vê cureyê navên curbicur hene û ev nav li gorî herêman diguherin. Têgehên weke “heyranok”, “miqam”, “lawjê keçik û kurikan”, “kilamên qîz û xortan”, “qaydê qîzikan” têne bikaranîn. Xebatên heta niha hatine kirin jî bi navê “heyranok” hatine kirin. Bi dêna me heyranok li gorî diyarkirina cureyê têgeheke di cî de ye.

Dema em ji hêla teşeyî û ruxsarî ve li heyranokan binêrin, derdikeve meydana ku heyranok kurtehelbest in. Heyranok li gorî pîvana xwe yên bikêş û yên bêkêş hene lê piraniya heyranokan bi awayekî serbest hatine honandin. Dîsa li gorî lêkolînên me hat dîtî ku di heyranokan de kêşa arûzê nehatiye bikaranîn. Ristarê heyranokan

ne diyar in, ango mexlas tune ye, anonîm in. Ne malê tekakesekî ye, berhemeke kolektîf e. Belê cara yekem kesekî ew heyranok honandine lê bi demê re di nav gel de berbelav bûye, koç kiriye, ji kesan bo kesan, ji deveran bo deveran veguhêziye, bûye malê gel. Ji ber van sedeman, heyranok berhemeke helbesta gelêrî ye.

Derkete holê ku mijara heyranokan evîn û evîndarî ye. Evîn, mijara bingehîn e û mijarên weke hezkirin, bêrikirin, xerîbî, êş û kulên ji ber eşq û firqetê, gilî û gazind û hwd. ji bi awayekî bi evînê re têkilîdar derdikevin pêş. Û dîsa me tespît kir ku di heyranokan de evîn, ne evîna îlahî ye, ya beşerî ye.

Zimanê heyranokan, zimanekî gel jê fêm dike ye. Ji ber ku heyranokbêjan li gorî dorhêla çanda xwe heyranok honandine, peyvên ji zimanê gel bi kar anîne. Zimanê jiyana rojane bi hemû taybetmendiyên xwe ve di nav heyranokan de bi kar anîne. Ji ber vê yekê ji axaftinên rojane, gotinên herêmî, biwêj û gotinên pêşiyar û hwd. hatine bikaranîn. Hat dît ku zimanê heyranokan nêzî zimanê axaftina rojane ye, zimanekî sade û hêsan hatiye bikaranîn. Me tesbît kir ku di nav ristên heyranokan de gelek caran lava, nifir, peyvên dubare, hunerên edebî hatine bikaranîn.

Piştî vê xebata xwe, me dît ku li ser keresteyên edebiyat Kurdî ya gelêrî xusûsen jî li ser heyranokan bi têra xwe xebatên zanistî nehatine kirin. Dîsa em dikarin bibêjin hêj gelek dever hene ku ji van xebatên sehayî yên akademîk bêpar mane. Loma jî weke pêşniyar; divê zanyar û lêkolêrên vê sehayê giringiyê bidin vê biwarê û van kêmasiyan berteref bikin.

5. ÇAVKANÎ

5.1. Çavkaniyên Nivîskî

- Allison, C. (2010). Oral Literature of Iranian Languages. (33-69). Kreyenbroek P. G. û Marzolph U. (ed.). New York: Weşanxaneya Columbia University.
- Amîdî, R. (2010). *Heyranokê Kurdî*. Hewlêr: Weşanxaneya Spîrez.
- Artun, E. (2012). *Türk Halk Edebiyatına Giri*. Adana: Karahan Yayınları.
- Bedirxan, C. A. (2012). "Ferhengok". Hawar. J. 30. Diyarbakır: Weşanxaneya Belkî.
- Botanî, B. (1995). *Heyranok; Gilî û Gazindên Evînê*. Stocholm: Weşanxaneya Apec.
- Cêfer, H. (1989). *Heyranok Ji Keleşorê Kurdî*. Hewlêr: Weşanxaneya Roşenbirî Lavan.
- Dorson, R. (2016). *Folklor û Teoriyên Folklorê Yên Îroyîn*. Necat Keskin (wer.). İstanbul: Weşanxaneya Avesta.
- Dundes, A. (2014). *Halk biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar-I*. (16-18). Oğuz, M. Ö. Ü Gürçayır Teke, S. (ed.). Ankara: Geleneksel Yayınları.
- Farqînî, Z. (2004). *Ferhenga Kurdî-Tirkî*. İstanbul: Weşanxaneya Enstitûya Kurdî ya Stenbolê.

- Hamelink, W. (2013). *The Sung Home Narrative, Morality, and the Kurdish Nation*. (Teza Doktorayê ya Neweşandî). Zanîngeha Leiden Enstîtûya Antroplojiya Çandî û Pêşketina Civaknasiyê.
- Kaplan, Y. (2015a). *Kaniya Stranan*. İstanbul: Weşanxaneyê Nûbihar.
- Kaplan, Y. (2015b). “Strana Kurdî (Kurmançî): Devera Hekaryan wekî Nimûne”. Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, j. 2.
- Kardaş, C. (2017). *Âşğın Sazı Dengbêjin Sesi (Dengbêjlik Geleneği ve Âşıklıküzerine Karşılaştırmalı Bir İnceleme)*. Ankara: Eğiten Kitap Yayıncılık.
- Kutlar, M. (2010). “Aşkla Örülmüş Dörtlükler, Heyranok”, Qijika Reş. j. 2.
- Sadinî, M. X. (2011). *Heyranokên Kurmançî*. İstanbul: Weşanxaneyê Nûbihar.
- Surûş, E. (2016). *Gilî û Gazindên Evîndaran, Ji Kelepora Kurmancên Îranê*. İstanbul: Weşanxaneyê Nûbihar.
- Turgut, L. (2010). *Mündliche Literatur der Kurden In den Regionen Botan und Hekarî*. Köln: Weşanên Instîtûta Kurdî.
- Yıldırımçakar, M. (2012). “Çarînen ku bi Evîne Hatine Honandin: Heyranok”. Nûpelda. j. 11.
- Yıldırımçakar, M. (2015). “Heyranok; di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de”. Folklor Kurdan. j. 2.
- Zero, E. E. (1987). *Strana Lîrikî Heyranok*. Bexda: Weşanxaneyê Roşenbîrî Lavan.

5.2. Çavkaniyên Devkî

1. Koşmaz, K. (Nexwenda) 14ê Gulana 2013an, Mijara Hevpeyvînê “Berhevkariya Heyranokan”, Wan/Qelqelî.
2. Özbek, N. (Nexwenda) 22yê Pûşpera 2013an, Mijara Hevpeyvînê “Berhevkariya Heyranokan”, Wan/Payizava.
3. Yıldırımçakar, H. (Nexwenda) 18ê Gulana 2013an, Mijara Hevpeyvînê “Berhevkariya Heyranokan”, Wan/Qelqelî.
4. Yıldırım, Ş. (Nexwenda) 19ê Gulana 2013an, Mijara Hevpeyvînê “Berhevkariya Heyranokan”, Wan/Qelqelî.
5. Çalış, A. (Nexwenda) 20ê Gulana 2013an, Mijara Hevpeyvînê “Berhevkariya Heyranokan”, Wan/Qelqelî.
6. Sayin, H. (Nexwenda) 8ê Avrêla 2015an, Mijara Hevpeyvînê “Berhevkariya Heyranokan”, Wan/Bêgirî.

EXTENDED ABSTRACT

Folklore is the knowledge of public, also the science which deals with “the knowledge of public”. Folk poetry is a sub-section of folk literature and heyranok is included in it as

a type. In Kurdish Folk Literature, Heyranok worths to be studied and analyzed with its language, form and context.

This is a field work. We collected heyranoks from Van districts from various places and people face to face and wrote them down. Together with these heyranoks that we have collected, we used many thesis, books and articles which are about heyranoks. This work tries to introduce the term heyranok and analyze them.

We introduced heyranok first and then indentified the words used for heyranoks in different regions. And then heyranoks were analyzed in a scienific way according to methods of cultural studies, folklore and literature in accordance with language, style and context.

Finally we found out that heyranok is a type of folk poetry. Heyranks are lyric short poems. It is not certain who writes the heyranoks so they are anonymous. They are read with melody and written with rhyme and end rhyme. They are written for the young girls and boys. Their topic is love. The main theme of Heyranoks is love and the other topics are connected to love. Though the name of heyranoks changes according to the regions, the names most used is heyranok. Heyranoks are not songs but they have a rhythm and melody. They are also not a type of *dûrik*. They are independent in terms of context and form. Heyranoks don't belong to Dengbêj literature, they belong to folk literature.

There are various names for Heyranoks and they change from region to region. Terms such as "heyranok", "miqan", "lawjê keçik û kurikan", "kilamên qîz û xortan", "qaydê qîzikan" are used. So far the name heyranok is used in the works. According to us heyranok is a suitable word to use for this type.

As Alan Dundes says, all oral types should be identified according to their texture, text and context. So, it is not possible to identify any type without these three things. A type can be completely identified by observing these three things. Time changes and improves and so the context and needs of society change and improve. So, an oral type can be identified according to the features of the context that it lives and spreads. A work appears, grows and improves in the society and according to the conditions of society. Now we can tell that the language and style used in heyranoks are formed according to the ones who builds heyranoks and who are the respondent.

The language of the heyranoks are understood by public. Because the ones who say heyranok built them according to their culture of the region, they used the words that are used in the public. They used the daily language with all its characteristics in the heyranoks. So, they used daily talks, regional words, idioms and proverbs etc. We found out that the language of heyranoks is close to daily language, it is a simple and easy language. And most times appeal, curse, handyadyoin, and literary art is used in the verses of heyranoks.

There are heyranoks with meter and without meter but most of them are built free. And we also found out that *arûz* prosody is used in heyranoks.

WERGEREK / A TRANSLATION

Binyada Ergatîvîteyê di Kurdî de*

Theodora BYNON**

Ji Îngilîzî: Resul Geyik

Baş tê zanîn ku dema pêvajoya dîroka zimanan tê nirxandin, hinek zimanan, ku giş jî endamên şaxa malbata Îndo-Îranî ya zimên bûn, binyada ergatîvîteyê bi pêş xistin. Lewma, di hinek demên lêkeran de, rêzimana wan bi kirdeya lêkerek negergûhêz û kirdeya locîkîya (logical subject) lêkerek gergûhêz re bi awayekî fermî û wekî hev hatin nirxandin, agenta (an jî kirdeya lojîkî) ya duyemîn bi *nîşankerayeke morfolojîk a cuda re hate bikaranîn.¹ Niha digel ku ergatîvîti di gelek zimanan de wekî têgeheke senkronîk hatiye xebitîn jî, derfetên vekolîna nêrîna diyakronîk, ji ber kêmbûna belgeyên dîrokî, di gelek rewşan de sînorkirî ye. Herwi-

* Orjîna vê gotarê bi Îngilîzî ye û di sala 1979an de ji aliyê Theodora Bynon ve bi sernavê "The Ergative Construction in Kurdish" li Zanîngeha Londonê di kovara *Bulletin of the School of Oriental and African Studies* de (Cambridge University Press, j. 42) hatiye weşandin.

** Pîspor, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, Turkiye/
Specialist, Mardin Artuklu University, Living Languages Institute, Kurdish Language and Culture Department, Mardin, Turkey.
e-mail: resulteacher@gmail.com

¹ Li Baskê, zimanekî ergatîvî yê tîpîk, kirdeya lêkerek negergûhêz, wekî biresera lêkerek gergûhêz û wekî rewşa ergatîvî" ya duyemîn di hêmanê halê "xwerû" de ne. Lewma, "zilameke" gizonî di reşa "xwerû" de ne (tu paşgir tune) di her du gizonan de wekî ethorî d-a "zilamek hatiye" û aita-k gizon ikusi d-u "bav zilamek dîtîye" aita-k "bav" e û di ya dawîyê de ev ergatîvî yan jî rewşa "pêkanîne" (agentive case) (paşgira -k yê girtîye). Di ser re, pêşgira d-yê di rewşa xwerû ya aitayê de kirdeya dîrekt û paşgira -tyê kirdeya "ez"ê nîşan dîke. Li Wagnerê (1978), 38an binêre. Bi he-man şeklî, di Gurcî de, iremî "xezal" di morfolojîyê de wekî iremî igo tgesi "xezal di nav dehlê de bû" û monadire-m mokla iremî "nêçirvan xezal kuşt", kirde (acent) an jî kirdeya lojik xwedîyê nîşankera -myê ye: Li Schmîdt (1973), 109an binêrin. Ji bo listeya referansan r. 224an binêre.

ha, zimanên Îndo-Îranî îstîsnayên balkêş çê dikin. Ji ber hebûna pexşanên girêdayî yên zimanên pir nêzî hev ku derdora sê hezar salan di nav xwe de di hewînin, ev şansa çavderîya pêşxistina binyadê û daketina wê ya ku dawiyê (subsequent decline) derketiye holê dide me. Ev gotara dê ji xeynî şopandina vê pêvajoyê tiştekî din neke, yanî dê li ser rêya wendabûna binyada ergatîvîteyê ku ji herêmeke diyar aa Îrana rojava wenda bûye bisekine. Ev, argûmanên xwe li ser hîpoteza berdehamîya erdnigariya zaravayên Kurdî ku rêzimanê wan hemû cureyên ihtîmalên ergatîvîtiya temamî ji bakur ber bi hemû sistemên akûzatif ên li başûr ku merheleyên li pey hev a pêvajoya diyakronîk nîşan dide, dispêre. Eger ev fikir bê qebûlkin, divê ev bi rêzkirina qalibên senkronîk ên zaravayên temsîlkar ji herêmên bakur, navend û başûrî, ji bo ghiştina resmê tevahî yê rêzebûyerên dîrokî ku li başûr bûne sedema wendabûna ergatîvîteyê û ji bo teverkirina (îzolekirina) mekanîzmayên ku encamên jinûveçêkirinê di hewînin pêkan be. Di dîrokê de, pîrsgirêkên wek ev binyad tam çawa çê bûye û çima di malbata Îndo-Ewropî de derketiye, xuya ye ku di vê xebatê de, dê li ser sînorkirina Îndo-Îranî neyê sekinandin.²

Zaravayên navenda Kurdistanê dikare hema hema di hêlîpana (paralel) Mûsilê de wekî grûpeke bakur û başûr ku xêzika ku her duyan ji Zapa mezin û avrêya (tributary) çemê Dîcleyê li Iraqê ye, bê dabeşkirin. Grupa bakurî di nirxandina me de dê wekî zaravayên Amedîye û Şengalê (Blau, 1975) û wek versiyoneke normal a Kurmancî (Bedirxan û Lescot, 1970); ya başûr jî wekî zaravayên Mukrî (Mann, 1906-9) û Silêmanîye (MacKenzie, 1961) bèn temsilkirin. Ji bona hevokên Silêmanîyeyê, ez deyndarê axêferêke xwezimanî ya wî zimanî, birêz W. O. Amin ku niha li ser teswîra rêzimanê xwe dixebite. Jê pê ve, min piştî xwe da xebata MacKenzie (1961)³ ku li ser zaravayên Iraqê xwedî agahiyên berfireh û dewlemend e. Ev sûret di her şeklî de çavkaniyên min in.

Em ê berê li ser nimûneyên sentaktîk ên eleqedar ji zaravayên bakurî bisekinin⁴. Li vir, hem navdêr hem jî cînavk li gorî rewşê tîn tewandin. Ji bilî dengdayînê (vocative) [ku li vir tu eleqa me pê ve tune], du rewşên me hene, ya dîrek û ya oblik, ev her du bi saya paşgiran yan jî bi saya hinek cînavkan bi formên lêzêdekirinê ji hev *vediketîn. Ergatîvîte wekî rewşa ku di zimanên Îndo-Îranî de jî heye, girêdayî

2 Ji bo nirxandineke herêmî, tîpolojîk û nêrînên dîrokî li ser ergatîvîteyê li tevahîya dinyayê û bibliyografyayê berfireh, li Wagner (1978)an binêre; ji bo ergatîvîtiya Îndo-Îraniyan b.m. li Schmit binêrin (1973), 116 notên 36,37an binêrin; ji bo Hindî li Allenê binêrin (1950); ji bo hîpotezên derheqê ergatîvîtiya Proto-Îndo-Ewropî, li Schmidt binêrin (1977).

3 Ez di heman demê de deyndarê Prof. D.N.MacKenzie me ji bo rexne û şîroveyên wî li ser versiyona ewil ya vê gotarê.

4 Bedirxan û Lescot (1970), 176 f, 93 f, ; cf. Balu (1975), 48, 71; MacKenzie (1961), 106 f., 155., 193 f.

demên borî yên lêkerên gerguhêz in. Demên borî paradîgmayên strukturên besît û neyekser (periphrastic) dihewîne. Ya duyemîn, ku ji aliyê forma partisip ya lêkera bingehtin û ya alîkar çê dibe, ew ê li vir neyê nirxandin, ji ber ku ti eleqa wan bi mijara ku tê nîqaşkirin re tune. Demên borî yên besît bi saya pêşgirên aspektî (aspectual) û ravekên (modals) koka borî ya lêkerê çê dibin. Demên fireh jî di forma koka fireh de bi heman awayî çê dibin, digel ew ne xwediyê struktura ergatîvîyê ne jî. Forma lêkerê, çi dema fireh, çi dema borî be, sê hêmanan di nav xwe de dihewîne: pêşgir, koka lêkerê û nîşana hejmara şexsan ya paşgirê (“ê dawî”). Setên nîşanên şexs û hejmaran yên ku di paradîgmayên dema fireh û borî de cî digirin bi awayekî fermî di kesa sêyemîn-yeqjimarê de diguhere, demên fireh li vir nîşankerên aşîkar in – demên borî sifir in. Lewma di Kurmancî de:

Kesê yekem yekjimar	kesê sêyem yekjimar
Dema fireh (ngHz) ez di-kev-im	ew di-kev-e
(ghz) ez di-bîn-im	ew di-bîn-e
Borî (ngHz) ez ket-im	ew ket
(ghz) te ez dît-im (erg)	min ew dît (erg)

Digel cudahiya morfolojîk di kesekî de xuya bike jî, em ê tradîsyona rêzîmannûsan bişopînin û nîşankera kes-û-hejmaran wekî du koman bi nav bikin; yên ku bi koma fireh re tîk bikaranîn yanî koma A û yên ku bi koma koka borî re tîk bikaranîn yanî Koma Byê ye. Dema fireh lewma bi formula pêşgira di+koka fireh + koma Ayê, preterî (dema borî) tunebûna pêşgiran + koka borî + koma Byê. Di mînanan de, dê lêker ji hev veneqetin, lê formula guncan dê li pêşîya her sernavê de be, ji bo ku tehrîfên (gloss) ku pêk bînin bi agahiyên hevokî re sinorkirî bimînin. Dema fireh dikare wekî temsîla hemû dem û paradîgmayên raveyan yên girêdayî koka borî ne bê qebûlîkirin (kfrh= koka fireh, borî=koka borî, rwşyksr= rewşa yekser, rwş-obl= rewşa oblik).

Lêkera negerguhêz di dema fireh de (di+kfrh+A)

(1) <i>Hesp</i>	<i>dikeve</i>
rwşyekser	kesê 3yêmlêker - yekjimar

(2) <i>Hesp</i>	<i>dikevin</i>
Rwşyksr	K3-lêker-pirjimar

Lêkera negerguhêz di dema borî de (sifir + borî + B)

(3) <i>Mirov</i>	<i>hat</i>
Rwşyksr	K3-lêker - yekjimar

- | | | |
|-----|--------------|----------------|
| (4) | <i>Mirov</i> | <i>hatin</i> |
| | Rwşyksr | K3-lêker prjmr |

Lêkera gerguhêz di dema fireh de

- | | | | |
|-----|-------------|---------------|---------------|
| (5) | <i>Hesp</i> | <i>mirovî</i> | <i>dibîne</i> |
| | Rwşyksr | obl | K3-yjmr |

- | | | | |
|-----|-------------|----------------|---------------|
| (6) | <i>Hesp</i> | <i>mirovan</i> | <i>dibîne</i> |
| | Rwşyksr | obl | K3-yjmr |

Lêkera gerguhêz di dema borî de (sifir + borî + B)

- | | | | |
|-----|--------------|-------------|------------|
| (7) | <i>Şivên</i> | <i>hesp</i> | <i>dît</i> |
| | Obl | rwşyksr | K3-ykjmr |

- | | | | |
|-----|--------------|-------------|--------------|
| (8) | <i>Şivên</i> | <i>hesp</i> | <i>dîtin</i> |
| | Obl | rwyksr | K3-prjmr |

- | | | | |
|-----|----------------|-------------|------------|
| (9) | <i>Şivanan</i> | <i>hesp</i> | <i>dît</i> |
| | Obl | rwyksr | K3-ykjmr |

- | | | | |
|------|----------------|-------------|--------------|
| (10) | <i>Şivanan</i> | <i>hesp</i> | <i>dîtin</i> |
| | Obl | rwşykr | K3-prjmr |

Dê bê dîtin ku raveka navdêrî (noun phrase) di her çar mînakên ewil de, di rewşa yekser de ye (rewşa navdêrî ya ku nehatiye nîşandayîn, pêşgir di rewşa yekjimarî û pirjimarîyê de tune) û hem di dema fireh de û hem jî di dema borî de lêker û dem di hevahengîyê de ne. Hevoka (5) û (6) di hevahengîya (1) û (4)an de ne, ji bilî hebûna rewşa oblîk ku di raveka navdêrî de wekî rewşa yekser tevdigere. Herwiha, digel ku kirdeya lojîkî di rewşa yekserde ye û ahengîya lêkerê nîşan bidin jî, di hevokên (7) û (10)an de kirdeya lojîkî di rewşa oblîkê de ne. Piranî li hawirdora dîrokî, hevokên wekî (7) û (10)an bi awayekî kevneşopî wekî tebatî (pasîf) tînen şîrovekirin, tê îddiakirin ku lêkerên demên borî mecbûrî forma tebatîyê digire (das transitiv Präteritum ist “passivisch”: Morgenstierne 1958, 172). Ev analiz, bi hinek gumanî⁵ ye*, ya ku di nav analîzên zaravayên Kurmancî de hatine nirxandin de hatiye qebûl kirin (MacKenzie, 1961, 193; Blau, 1975, 71 f). Ti guman tune-

5 MacKenzie (1961), 193 nîşan dide ku lêkerên gerguhêz yê demên borî wekî lêkerên negerguhêz bi heman awayî tînen kişandin.

ye ku ew li perçeyên hatine çavdêrikirin tê. Lewma, bi gelemperî, bi şibandina forma tebatîyan, tiştê ku ji nêrîna morfolojîyê hatiye nîşankirin kirde (agent) ye, digel ku cî-guhartin (goal) nedîyar e û ev rewşa ahenga lêkerê ji bona wekî kirdeya rêzimanê (yan jî rûxarê) bê hesibandin dîyar dike.⁶ Herwiha, rewşa girêdayî ya diyarker û ahenga lêkeran di mijara tebatîyê de îzna analîza hevokên (7) û (10)an dide û krîterên din ku eleqedarê hemberî vê şîroveyê ne. Ya ewil, rastîya ku agent di warê morfolojîyê de nîşanker e û tenê bi tebatîyan re ne sînorkirî ye, lê ev rewş karakterîstîkek ji binyadên ergatîvîyê ye – agent bi awayekî gelemperî nîşankera morfolojîya vekirî dihewîne. Hinek ziman, ji bo vê fonksiyonê halekî taybet in, digel bikaranînen halên wekî rewşa vir fonksiyonên sentaktîk ên din tên bikaranîn. Ya duyemîn û ya girîngtir, hevokên (7) û (10)an ji pêwendîya sîntektîk ku li hemberî binyada tebatî maye û lewma krîterên ku hertim wekî pênaseya forma tebatîyê pêk tîne dihate qebûlkirin bi cih nayîne⁷. Ji ber vê, kesek ku dema hêmanên leksîkî (peyvî) û cudahiyan biserûber (regular differences) ya binyada sentaktîk – di zimanê hatiye dayîn de - nîşan dide tunebe, dê nikaribe hevoka navborî wekî binyada tebatî qebûl bike. Li ser xwezaya kategorîya tebatîyê, du nêrînen bingehîn derdihewin holê. Yek ji wan dibe ku pêwendîya hevokên lebatî û tebatîyê nîşan bidin ku ji aliyê paşguhertina fonksiyonên sentaktîk de, biresera hevoka lebatî “dibe” kirde, yan temaya rêzimanî di hevoka tebatî de ku li vir kirdeya hevoka lebatîyê “dibe” agent (bikêr), an ev dikare wekî pasîfizîsyona çewisandina agentê (suppression of agent) bê şîrovekirin. Yanî ev negergûhêzkirina lêkerek gergûhêz e ji ber ku taybetmendîyeke giştî ya tebatîyan e ku pêwîstiya raveka navdêrî dike ku divê li her hevokê hebe û hertim cî-guhartin an jî objeya locîkê (logic object) digire û ti car nabe agent. Her kîjan pênaseya vê kategorîyê bê qebûlkirin, qaliba tebatîyê ji dijberîya formal ya biserûber derdikeve ku ev jî di navbera “ew*” û forma wê ya lebatî de ye û ev her du form jî di kategorîya nîşankirî de her gav tebatî ne.

Heya niha, di nav zaravayên ku hatine nîqaşkirin, forma sentektîk tenê ku di hevokên (7) û (10) an de pêwendîyeke biserûber nîşan dide bi jêbirina agentê ji forma ku herdem wekî hevoka bê agent tê dikare bê çêkirin (lêkera bingehîn dibe

6 Loma, di hevokên lebatî (aktîf) de *puer puellam amat*: Kurik ji keçikê hez dike, kirde di rewşa herî kêm a nîşankirî de ye, digel hevokên tebatî yên beramber zêdetir hatine nîşankirin. Puella a puerro amatur: Keçik ji aliyê kurik ve tê hezkirin. Îzomorfizma tebatîya ya îddiakirî û binyadên ergatîve (Schmidt 1973),111) di vê hêlê de bi perçe ye, ji ber ku gelek argumanên sîntektîk ên kanihker (îknaker) ji bo kirdedarîya ergatîvîyê betir a tebatîyê hene; ji bo testên sîntektîk li ser kirdedarîyê li Andersonê (1976) binêrin. Em ê di vê gotarê de girêdayî nêrîna kevneşopî ya ku dibêje ravekên navdêrî ahenga lêkerê dîyar dike bimînin.


7 Ji bo lênihêrîna lezginî, ji Burgmann ber bi Chomsky ve, li Schmidt binêrin (1963), 2 ff

* Qesda nivîskar hêmana bireserê ye. Nîşeya wergêrî.


rader) û lêzêdekirina lêkera alîkarek ku wekî nîşaneyê tebatîyê bi kar tê (Bedir Khan û Lescot, 1970, 173; Blau, 1975, 72; MacKenzie, 1961, 195) b.m. *ew hat dîtîn*⁸. Nîşaneyê morfolojîk a tebatîyê tiştê ji hevokên (7) û (10)an kêma e. Forma van lêkeran pêşgir + koka lêkerê + nîşaneyê şexs - û - hejmarê dihevine da ku ew bi hevokên (5) û (6)an re bibin hevaheng. Di dawiyê de, li gorî yekgirtina mijarê (theme-rheme), hevokên ergatîvî di zimanên akûzatifî de, wekî hevokên lebatî û tebatî xwediyê heman binyada tematîk in ku di van zimanan de jî agent mijar/tema (topic/theme) bixwe ye. Bi mijarê qesda me, hêmanên hevok-serekî (sentence-initial constituent) ne ku agahiyên nû li vir bê hinartin, bê nêrîna ger ku ev kirdeya rêzimana ruxsarî (surface grammatical subject) be yan na (li Lehmann, 1976an binêre). Lewma, ji aliyê binyada tematîk ve, binyada ergatîvîyê ya demên borî di zimanên Îranî de bi tevahî paralelî rewşa lebatî ya demên firehî yê zimanên akuzatif in (cf., bo Paştû, Tegey, 1978, 24). Ji ber van sedeman gişan, em bawer in ku hevokên 8/9 û (10) an divê wekî ergatîvî, lê ne wekî tebatî bèn nîrxandin.

Cureyên hevokên eleqedar ên formên sîntektîk di zaravayên bakurî de dikare bi alîkarîya formula jêr bê temsîlkirin, ku li vir her cure cotên kevanekê bi xwe re analîza hêmana têgihanê dide (immediate constituent analysis). Nîşanên ji bo kategorîyan hatine bikaranîn ev in: H (hevok), RN (Raveka Navdêrî), L (Lêker), daç (Daçek) koşebend hêmanên beramberiyê û tîr jî girêdana ahengiyê nîşan dide.


Lêkerên negergûhêz di demên fireh û borî de:



Lêkerên gergûhêz di dema fireh de:



Lêkerên gergûhêz di dema borî de:



8 Di Kurmancî de, wekî ku di hin zimanên din de heman rewş e, ergatîvî û tebatîya (bê agent) bi hev re tîr bikaranîn û lewma lihevnekirina sîstematîk ya her duyan tune ye (Lis Schmidt binêrin (1973), 111).

Bi kurtasî, di zaravayên bakurî de, mirov dikare rewşa demên fireh bi zimanên wekî Latinî û Îngilîzî ku akuzatif in bide ber hev, yanî hevokên gergûhêz di warê binyadê de paralelî yên negergûhêz in, ji bilî hebûna raveka navdêrî ya ekstra ku rola biresera locikî pêk tîne. Di demên borî de, ji aliyê din, forma sîntektîk ya hevokên gergûhêz bi awayekî tîpîk ergatîv in ku raveka navdêrî êdî ne agent e, lê cî-guhertin cihê agentê digire û rola wê raveka navdêrî ya ekstra di cihê pozîsyona herî çepê de dilîze.⁹

Heger niha em bala xwe bidin zaravayên Başûrî, em dibînin ku bikaranîna lêkerên gergûhêz li tevahîya herêmê ne wekî hev in. Ji ber ku heman binyada ergatîvîyê ku heya niha em pê mijûl bûn li piraniya Bakur tê xuyakirin, lê li Başûr, em formeke ku bi tevahî ji sîstema akuzatîfî pêk hatiye dibînin. De ka em rewşa zaravayê Başûrî, Silêmanîyê binirxînin. Dijberî tiştê ku me di Kurmancî de dît, ne navdêr ne jî cihnav halê rewşê natewîne, fonksiyona sîntektîk a raveka navdêrî tenê (yanî, ravekên navdêrî nayên pêşîya daçekan) têne tespîtîkirin. Rêza peyvan ya normal û nenîşankirî ji bo hevokên gergûhêz agent (dikarin bibin kirdeya ruxsarî jî) in û li pey goalê (di heman demê de biresera ruxsarî ne) ve tîne ew jî li pey lêkerê tê. Lêker xwedîyê koka fireh û borî ye û du komên (A û B) nîşana şexs-û-hejmarê hem di forma fonolojîk de û hem jî di belavkirina (distribution) sentaktîk de hevahengê hev ê di Kurmancî de ne. Berevajîyê Kurmancî, herwiha, Silêmanîye xwedîyê koma sêyemîn a nîşana şexs û hejmarê ye ku ev jî ji koka lêkera bi nîşan û cihnavên şexsî hatine zeliqandin bi tevahî cuda ne. Ev koma sêyemîn a şexs-hejmaran di forma yeqjimarîyê de $-(i)m$, $-(i)$, $-i/y$, di pirjimarîyê de, $-mân$, $-tân$, $yân$ e, û em ê van wekî koma C yê bi nav bikin.

De ka em yeksanên her deh hevokên Kurmancî ku hatin analîz kirin binirxînin.

Lêkera negergûhêz di dema fireh de (a + fireh + A)

(1') *aspaka akawêt* "the horse falls"

K3 ykj

(2') *aspakân akawin* "the horses fall"

K3 pjmr

Lêkera gergûhêz di preterîtê de (dema borî) (sifir + borî + B)

9 Ev analîz hevokên mînîmal bi lêkereke gergûhêz û tenê bi ravekeke navdêrî dê di dema fireh de agentê û di dema borî de wekî goalê bê nixandîna pêwîst didêre. Ev xal nikare bê testîkirin ji ber kêmasîya agahîyên eleqedar. Lê herwiha, her du ravekên navdêrî yên hevokeke gergûhêz nikarin tune bin.

(3') pyâkawa hât
K3 ykj "the man came"

(4') pyâkawa hâtin"
K3 pjmr "the man came"

Lêkera gergûhêz di dema fireh de (a + fireh +A)

(5') aspaka pyâwaka abînêt
K3 yjmr "the horses see the man"

(6') aspaka pyâwakan abînêt
K3 pjmr "the horses see the men"

Lêkera negergûhêz di preteritê de (...-C + sifir + borî)

(7') Şwânaka aspaka-y bînî
K3 yjmr "the shepherd saw the horse"

(8') Şwânaka aspakân-î bînî
K3 yjmr "the shepherd saw the horses"

(9') Şwânakân aspakakyân bînî
K3 pjmr "the shepherds saw the horse"


(10') Şwânakân aspakân-yan bînî
K3 pjmr "the shepherds saw the horses"

Dê bê dîtin ku di her çar cureyên hevokan de, dixwazî lêker gergûhêz be yan negergûhêz be, şexs û hejmara kirdeyê di hevokê de bi nîşaneyê şexs-hejmarê re biserûber dúbare dike. Ji ber sîntetîkbûnê, li gorî ahenga hevokê birêkûpêkbûna sîstematîk bi tevahî heye. Tiştê ku ne birêkûpêk e, rêya ahengî ye ku bi awayekî morfolojîk tê nîşankirin. Ji ber belavkirina komên A û Byê di rewşa lêkerên ne gergûhêz di hemû deman û lêkerên gergûhêz di dema fireh de, wekî rewşa Kurmancî ne. Di borîya lêkerên gergûhêzî de, em nîşaneyên şexs-hejmarê tenê di koma C de dibînin û ev di ser re ji koma A û Byê pozîsyoneke din werdigirin ku ev di rewşa normal de, ji dêvla bireserê girêdayî koka lêkerê ne. Ev rewş tenê dema ku biresera vekirî (overt direct object) û tu hêmanên din yê guncan ku di eslê xwe de xwe bi koka lêkerê ve dikin û pê ve tîr girêdan tune ne derdikeve holê (Li Edmonds 1955, MacKenzie 1961, 109). Digel vê bêpergalîyê, heger em pênaseya ahengîya dubarekirina taybetmendîya şexs-hejmara kirdeyê di hevokê de ji aliyê nîşana morfolojîk qebûl bikin, divê em ji aliyê ahenga pêwendîyê ve Silêmanîyê

wekî zimanekî akûzatif qebûl bikin û ev digel ku sembola morfolojîk a ahengîyê ku di hevokên gergûhêz de di borîya gergûhêzî de hatine bicîkirin, ne bi fermî û pozîsyonî, paralelî yên ku di demên negergûhêzî û dema fireh a gergûhêzî de ne.


Mîrov dikare forma sentaktîk a hevokên Silêmanîyê wekî formûla jêr kurte bike, ku ev jî yeksanên Kurmancî ne ku me berê behsa wan kiribû. Tenê tiştê eleqedar ku li vir hatiye zêdekirin navdêra Silêmanîyeyê ye ku li pey wê dîyarker (determiner), di halê dîyar an jî nedîyar de (dîy.) ye.

Lêkera negergûhêz di demên fireh û borî de:




Agent û
kirdeya rûxarî

Lêkera gergûhêz di demên fireh de:



Agent û goal û
kirdeya rûxarî kirdeya rûxarî

Lêkera gergûhêz di demên borî de



Agent û goal û
kirdeya rûxarî kirdeya rûxarî

Eger em formûlên sintektîk yê Silêmanîyê bidin ber Kurmancî yê ku di rûpela 215an de hatibûn dayîn, em dibînin ku her du jî di dema fireh de, di lêkerên gergûhêz û negergûhêz de wekî hev in. Ji bo lêkerên dema borî ne tenê forma sintektîk lê binyadên avakar (constituent structures) ji hev zehf cuda ne. Digel ku di Kurmancî de, ahenga şexs-û-hejmarê (endama koma Byê) avakarê hêmana lêkerê ye, lê li Silêmanîyeyê, hêman girêdayî hevokê ye (endamê koma Cyê ye). Cudahiya

navbera her du zaravayan di statuya sîntektîkiya şexs-û-hejmarê de tê bikaranîn. Ji bo vê, nîşanên koma Cyê li Silêmanîyeyê cihnav in, û wekî ravekên navdêrî xwedîyê heman statuya sîntektîk in. Ji bo îspatkirina vê îddîayê, de ka em li binyada hevokên pronomînal di her du zaravayan de binêrin. Mînakên (11) heya (20) rewşa lêkerên gerguhêz di Kurmancî de nîşan didin (Bedirxan û Lescot, 1970, 94, 176):

- (11) *Ez mirovî dibînim*
Ez-xwe. mirovî-tew Ks 1 yjmr - A
- (12) *Ez mirovan dibînim*
Ez-xwe. mirovî-tew Ks prjmr -A
- (13) *min mirov kuşt*
Ez- tew mirovî- xwe. Ks3 prjmr -B
- (14) *min mirov kuştin*
Ez- tew mirovî- xwe. ks 3 prjmr - B
- (15) *ez we dibînim*
Ez-xwe. hûn-tew ks 1 ykjmr - A
- (16) *min hon dîtin*
Ez- tew hûn- xwe. Ks 2 prjmr -B
- (17) *hon min dibînin*
Hûn-xwe. ez-tew ks 2 prjmr -A
- (18) *we ez dîtîm*
Hûn -xwe ez-tew ks 1 ykjmr - B
- (19) *ew wî dibîne*
Ew-xwe. ew-tew Ks 3 prjmr - A
- (20) *wî ew dît*
Ew-xwe. ew-tew Ks 3 ykjmr - B

Dê bê dîtîna ku binyada van hevokên pronomînal bi tevahî di hevokên (5 û 10) an de ku kirde û bireser bi tevahî ji raveka navdêrî pêk tê hatine çêkirin (yanî ra-

veka ku yan xwedî navdêrek yan jî ya ku dihewîne) û bicîkirina bireserê bi cînava şexsî di her rewşî de li gorî rewşa rast e. Hevokên beramber li Silêmanî wiha ne:

(11') min pyâwaka abînim
Ks 1 ykjm̄r A

(12') min pyâwakân abînim
Ks 1 ykjm̄r A

(13') min pyâwaka-m kuşt
Ks 1 ykjm̄r C

(14') min pyâwakân-im kuşt
Ks 1 ykjm̄r C

(15'a) min êwa abînim }
Ks 1 ykjm̄rA } I see you (prjmr)

(15'b) a-tân-bîn-im
Ks 1 ykjm̄r A

(16'a) min êwa-m bînî
Ks 1 ykjm̄r A

(16'b) bînî-m-in
Ks 2 prjmr B

(7'a) êwa min abinin
Ks 2 prjmr A

(17'b) a-m-bîn-in
Daç. Ks 1 ykjm̄r C

(18'a) êwa min-tân bînî
Ks 2 prjmr C

(18'b) bînî-tân-im
Ks 2 prjmr C

- (19'a) aw aw abînêt
Ks 3 prjmr A
- (19'b) a-y-bîn-êt
Daç. Ks 3 ykjm A
- (20'a') aw aw-î bînî
Ks 3 ykjm C
- (20'b) bînî-y
Ks 3 ykjm B

Di van mînakên Silêmanîyeyê de, dê bê dîtîna ku dema hem kirde hem jî bireser pronomînal bin (hevokên 15 û 20), ji bo îfadekirina heman wateyê du rê hene, ya ewil (15'a û 20'a) bikaranîna cînavên şexsî, ya din jî (15'b û 20'b) tenê girêdayî nîşankerên şexs-û-hejmarê ye. Di binyadên ewil de, cînav wekî raveka navdêrî ya bi temamî rolek digire û di vê formê de ti pirsgirêk tune. Di ya duyem de, dê bê dîtîna ku, hemû komên nîşankerên şexs-û-hejmarê (A, B û C) hatine bikaranîn, lê bi belavkirineke baş hatiye pênasekirin: Koma Ayê xwediyê fonksiyona kirdeya locîkî ye û bi demên firehî re sînokirî ne, koma Byê bi tevahî xwediyê fonksiyona kirdeya locîkî ye û girêdayî demên borî ne. Koma Cyê hem wekî kirdeya locîkî hem jî wekî biresera locîkî ya ku girêdayî dema hevokê ye, tê bikaranîn.

Dema ku mirov li vê forma kompleks ji aliyê rêza morfê (morph sequence) binêre, dê bê dîtîna ku endamên koma Cyê bi piranî pêşîya koma A û Byê tên. Di ser re, ew morfa ewil ya kompleksa lêkerî (verbal complex) bê girîngiya statuya wê dişopînin (daçek dema fireh, koka lêkerê dema borî). Bikaranîna wan ya di hevokên kompleks yên lêkerî de bi tevahî hevahengê bikaranîna yên hevokê bi raveka navdêrî (hevokên 7' û 10') re yan jî bi cînavên şexsî (hevokên 18' û 20') re wekî hev in ku li vir ew her tim xwe li hêmanên ewil (first constituent), lê ne kirdeya locîkî ve gire dide. Ev taybetmendiyên endamên koma Cyê, bi rastîya ku ti car di hevokekê yan jî di qalibekî de nayên bikaranîn, rewşa xwêzaya klîtîk (clitic nature) nîşan dide. Ji aliyê din ve fonksiyonên sentaktîk vana wekî cînav pênase dike, ji bilî bikaranîna biresera dîrek û îndîrek ya lêkerên gerguhêz di dema fireh de û wekî agenta dema borî, ew raveka navdêrî bi girêdana 'genitîvê' re ye (kitêb-yân 'pirtûka wan') û dikare bi daçekê re bê bikaranîn (lê-mân-î sandin 'wî ji me girt'): MacKenzie, 1961, 114).

Digel ku statuya pronomînal ya Koma Cyê ti car nehatibe lêkolîn jî, rastîya endamên koma Byê li Silêmanîyeyê cînavên kêma in- herwiha ev rewş bi awayekî

vekirî ji aliyê Edmondsê di destpêka 1950yan de hatiye bikaranîn¹⁰. Lê di dema borîya gerguhêz de, endamên koma Byê li Silêmanîyeyê dikare wekî ‘qedandina şexsî’ ya lêkerê bê şîrovekirin, analîzek wiha di gerguhêza dema borî de têk diçe (digel rewşa Kurmancî, helbet ne ya rewşa ergatîvîyê) ew her du jî fonksiyonên wekî hev di demên fireh de ji aliyê koma Cyê ve tîn bikaranîn, wekî mînak yên kirdeya dîrek û biresera îndîrek (raveka navdêrî ji aliyê daçekê ve tê rêvebirin). Derheqê fonksiyona dawîyê de, hevokên jêr yên bi daçeka *bo*’yê di dema fireh de û forma lêkerê ya dema borî re tê bikaranîn (Edmonds, 1955, 498, 502):

Diyariy_êk-tan bo e-hên-yn ‘we shall bring a present for you’
Dema fireh Ks’ prjmr C / daç. Anîn / dema fireh Ks 1 prjmr A

Li vir *bo* bi *tanê* tê bikaranîn (Ks 2 prjmr) û
Xwa bo-y nard-im-y(t) ‘God sent you to me’
Xwedê kesê 3yem ykjm şandin/dema borî / ks 1em ykjm

Ku li vir *bo* bandorê li ser *imê* dike (Ks 1 B). Bijartina di navbera komên B û Cyê, wekî dê bê dîtîn, tenê girêdayî dema lêkerê ye. Tenê binyada ‘genitîvê’ dikare di hemû deman de bê bikaranîn (li MacKenzie, 1961: 229an binêre).

Heya niha me delîlên statuya pronomînal ya koma B û Cyê dan ber çavan. Gelo endamên koma Ayê dikare wekî cînavan bînin polînkirin? Me dît ku belavkirina sîntektîkê (syntactic distribution) li gorî komên B û C yê sînkorkirî ye, fonksiyona wan tenê di demên fireh de bi nîşana ahenga kirdeyê bi lêkerê re ye. Me di heman demê de nîşe girt ku cudahiya formal di navbera endamên wê û yên koma Byê de di kesê sêyem ê yekjimar de ye û hemû formên din jî wekî hev in. Ji vir şûn de ti cî tune ye ku ev her du formên kesê 3em li dijî hev bin, forma Ayê li piştî koka fireh ya lêkerê de derdikeve, forma Byê piştî koka dema borî yan jî piştî endamên koma Cyê derdikeve pêşîya me. Lewma cî ji bo paşgirên ku dikarin wekî alomorfo û xerabûna komên A û Byê ber bi paradîgmeyeke ve çê bibe, ji ber hemû nîşankerên şexs-û-kesan dê bibin pronomînal. Hilbijartineke wiha dê ji bo analîza binyadên Silêmanîyeyê xwedîyê encamên girîng bin. Ji ber, heger ev rast be û em hemû nîşankerên şexs-û-hejmarê wekî cînavan qebûl bikin divê ev lêkera ‘şexsî’ ya Silêmanîyeyê tune ye qebûl bike ku ev jî di hemû zimanên Hînd-û-Ewropî de heye

10 ⁹ Li gorî formên din pêwîst e mirov hêmana-Byê (li vir sifir e) li pey hêmana-Cyê bîne. Li gorî MacKenzie (1961: r112) nîşankera agenta yekjimar ya kesê Sêyem herwiha li pey hêmana-Byê tê. Ev nirxandin hewce ye bi tevahî bê referanskirin: ‘cînavên di forma ku dikare ji hev veqete dikare wekî fonksiyona navdêrekê bê bikaranîn, lê her ku kirpandin neyê xwestin, bi piranî ev bikaranîn ji bo bikaranîna giran wekî biwêjî ne [yanî, komên me yên B û C]: Edmonds (1955), 491.

û li dêvla vê lêkerêke ‘neşexsî’ ku peykên pronomînal (pronominal satellite) bi ti awayî kirdeyê ji biresera dîrek û îndîrekt cuda nîşan nade¹¹.

Wekî alternatîf, lê devla ku em xwe li ser hevşîbiya nîşankerên formal bi bingeh bigirin, em dikarin bingeha analîza cudahiya belavkirinê di navbera her sê koman digel koma Byê bi paradîgmayên homofonîk re bê xwestin jî de pêk bînin. MacKenzie lewma koma Ayê wekî ‘bi tevahî lêkerî’ (yanî bi qedîna lêkerî) koma Byê (yanî wekî xwediyê di binbeşên wekî hev, yek jî qedîna lêkerî ya cînava din) wekî lêkerî û pronomînal û koma Cyê jî tenê wekî pronomînal şîrove dike. Heger em vê dawiyê qebûl bikin, hebûna têgeha lêkerêke şexsî, divê em formên lêkerî ya gerguhêza borî, divê em formên borîya gerguhêz bi kirdeya şexs û hejmarê de têxin forma rêza paradîmatîkê (paradigmatic alignment) û tunebûna qedîna şexsî di dema borîya gerguhêz de wekî mînaka rewşa tunebûna nîşankeriyê. Paşgira encama tuneyê divê di paradîgmaya gerguhêzî de cî bigire ku bibe allomorfa bersiva endamên koma Byê ya dema borîya gerguhêz û divê ev ahenga kirdeyê bi locîkî nîşan bide. Di analîza MacKenzieyê de, ev bi nîşankerîya ahenga kirdeya locîkî re tê bikaranîn. Digel derheqê vê analîzê de bi awayekî dîrokî ti guman tuneye û bi binyadên sintektîk yê zimanên girêdayî tevî Kurmancî re di nav têtîliyê de ye, ev bi tenê bi zemîna înternal û senkronîk nikare bê rewakirin. Ji ber ku, wekî em dibînin, ev rewşa ahenga gelemperî ya lêkerê bi biresera locîkî re tuneye.

Em dibînin ku morfa sifirê (zero morph) divê em vana wekî allomorphên nîşankerên gelemperî di dema borîya negerguhêzî de bi nîşankirina ahenga kirdeyê bi kar bînin. Herwiha, di Farsî de, ku hem zimanekî hevbend (contiguous) e û bi dîrokî jî nêz ve girêdayî hev in, qedînên dema borîya negerguhêzîyê bi analojîkî derbasî borîya gerguhêzî dibe- ev wekî pêvajoya analîza senkronîk ya wekî hev bi awayekî mentîqî tê qebûl kirin. Ev çareserî herwiha, di nav xwe de herî kêr dezavantajekê dihewîne, çima ku bo bidestxistina cîyê ahenga (locus of concord) nîşankera gelemperî derfeta nîşankera cînava kilitîk (clitic pronoun) diavejê piştguhê xwe. Di eslê xwe de, herî kêr delîleke heyî ti analîzên senkronîk ku heya niha hatine pêşnîyazkirin di rêbaza besît û rasterast de ne girêdayî binyadên morfolojîk ya rêgezên sintektîk in.

Digel kompleksbûna pêwendîya girêdana di navbera morfolojî û sentaksa Silêmanîyeyê de dikare bi nêrîneke senkronîk derkeve holê û pênasêya wê ji aliyê dîroka zimên ve têra xwe zelal e. Ji ber vê, dema avakirina sentaksa wê di rêza akusatîfî de, barê morfolojîya berê ya ergatîvîyê di nav xwe de diparêze. Rêbaza

11 Loma Wagner (1978), r. 46, tunebûna orîyantasyona lêkerê wekî taybetmednîyeye tîpîk ya zimanên ergatîvîyê dinirxîne; digel demeke dirêj e ku Silêmanîye ne zimaneke ergatîvî ye jî, ev wekî li ser vî esasî wekî ergatîvî bê qebûl kirin.

ku binyada sentaktîka mihtemel ku ava kiriye dema em morfolojîya lêkerî ya Silêmanîyeyê û ya Kurmancî bidin ber hev dikare bê dîtin. Di pênasayên me yên her du dîyalektan de me bi navên komên A û Byê nişankerên şexs-û-hejmarê ji ber parvekirina forma fonolojik û belavkirina binyadên lêkerî li ser du beşan dabêş kirin. Polînkirina wan di heman zemînê de, wekî “şibandina diyakronîk”, wekî ferqa ewil ku em dibînin di navbera zaravayên bakurî û Silêmanîyeyê de tunebûna qedînên lêkerî yên “ergatîvîyê” ye ji dema borîya gerguhêz ya Silêmanîyeyê. Divê sedema wendabûna qedînên li Silêmanîyeyê bibûya sedema avakirina sentaktîk ya ji nû ve. Bi tunebûna wan re, êdî ti girêdana lêker û bireserê nemaye da, loma jî bireserê statuya xwe ya bi kirdeya ruxsarî re winda kiriye û ev rewş niha derbasî agentê bûye. Belkî divê em li destpêka wendabûna vê guhertina binyadê di cureya hevoka herî gelemper de, li vir, di biresera locikî ya binyadê (hê jî ergatîv e), yan di yekjimarî yan jî di pirjimarîya raveka lêkerî de bigerin, da ku qedîna lêkerî di her du rewşan de bibe rewşa sifirê (li mînakên 13 û 20 binêrin). Di hevokê wiha de, lewma ti nişankera gelemperî ya ahenga lêkerê bi kirde û biresera locikî re tuneye. Divê em lêkera bê paşgir ku ji vê forma cureya hevokê ber bi hevokên din ve bi biresera şexsê ewil an jî duyem û bi biresera hemû kesên pirjimarîyê em bifikirin ku ev dibe sedema wendabûna hemû girêdanên di navbera lêker û biresera locikî de.

Du rêyên ku statuyan kirdeya ruxsarî ji biresera locikî derbasî agentê bûye dikare bê hizirkirin. Heger em analîzên senkronîk ku qedînên sifirê ji bo dema borîya gerguhêzî îddîa dike qebûl bikin, em dikarin bi rehetî piştî wendabûna qedînên “ergatîvîyê” vê rewşê wekî ahenga rastîya sifirê (zero exponency) şrove bikin û nişankera gelemperî ya ahengê di zimanên din de ku giş referansî agentê dikin, dê lewma li gorî vê dîsa bînan analîzkirin. Ev çareserî dê ji guhertina ergatîvîyê ber bi izolasyona ahenga akuzatîfîyê bê pêwîstiya geşedana mezin ya duyemîn li Silêmanîyeyê bê qeydkirin. Wekî mînak, mirov dikare lêzêdekirina kopîya pronomînal ya mecbûrî ya agentê di hevokên gerguhêz yên dema borî de bide.

Dixuye ku ev kopîya pronomînal ya agentê ji bo dîsa avakirina binyada sentaktîk amrazî ye, ji ber ku şopandina analîzên me ya allternatîf, cînava kilîtîk divê di rewşa tunebûna qedîna lêkerî ya gelemperî de, ji bo nişankirina ahenga agentê dîsa bê şrovekirin. Nirxandineke baş ji bo vê şroveyê rastîya tunebûna hevokên bê cînavên kilîtîk bi tevahî li Silêmanîyeyê ye.

Pêşîya hewldana biryardayîna çareserîyeke li dij hev, de ka em bi hurgulî li geşedana duyemîn binêrin. Em dibînin ku Silêmanîye ji Kurmancî di hebûna nişankerên şexs-û-hejmara koma Cyê de diguhêre, ku ev jî di Kurmancî de tune ne. Niha em dizanin endamên koma Cyê hem di forma fonolojik de hem jî di belavkirina sentaktîk de cînavên kilîtîk yên Îranîya kevn wekî taybetmendiya ku paradigmaya di forma nomînatîf de tunebû. Di Farsîya Navîn de, ku xwediyê

ya agentê tê dîtin, digel li vir agenta dîrekt e û ne di rewşa tewandî de ye divê bê qeydkirin. Mann (1906, 1xxxvr.) vê rewşa duyemîn ya navborî di şeklê jêrîn de hesab dike. Ew dibêje ev ji Îranîya Kevn dest pê dike ku ji wir binyada ergatîvîteyê derketiye¹³ û dibêje hevokê wiha

Sâg hal-î-girt ‘the dog took it (the ring)’

Kuçik xwe. Daç 3 ykjm̄r C girtin/ borî-sifir

divê di halê resen de bihata wateya ‘kuçik, ew (gustîl) hate girtin ji aliyê wî ve’ ku bi raveka navdêrî ye lê ji ber sedemên cuda di rewşa nomînatîvê de ye. Ev ji bo rewşa navdêrî guncavtir e, ji ber ku ev tê sere hevokê ji bo mijar û temayê. Herwiha ev ji bo ya duyem baştir e ji bo refleksa kirdeya rêzimanê ya tebatîya berê. Ji bîr nekin ku, ev analîz, ku agenta mineqêşeyê ye pêşîya hevoka normal tê û lewma ne hêmaneke wê ye, tenê pozisyona Çyê di hevokê de dîyar dike: Ji ber ku kilitîk ê, ew nikare hevok an jî raveka serî bigire, rewşa ewil ya mimkun li valahîya binyadî (slot) dikare piştî hêmana ewil bê bikaranîn.

Em niha di pozîsyonekê de ne ku hewl didin senteza geşedana dîrokî ku divê ji zaravayên cuda derketibin çê bikin. Di gruba bakurî de, înovasyona herî girîng wendabûna cînavên kilitîk in (MacKenzie, 1961, 222) û bi wan re wendabûna cînavan jî heye. Di nav hemû zaravayên Kurdî de, mirov dikare yên ku di navbera Grûba Bakurî û Silêmanîyeyê de dimînin ji aliyekî cîyekî navberî ji aliyê din jî cîyekî konserfatîf bifikire. Lewma, tekane geşedana girîng di Mukrî de dixuyê ku ev jî binyada ergatîvîya besit ya borîya gerguhêz bi binyada tematîkî hatiye nîşankirin (digel hêj ji ergatîvî ye) bi awayekî tematîkî ya agenta minaqêşê re hatiye guhartin. Li Silêmanîyeyê ev pêvajoya cî guhertinê hate asta qedandinê, ji ber ku ev ji hemû binyadên nenîşankirî ya resen kêma e û bikaranîna agentê kiriye mecbûrî da ku binyada duyemîn ya ewil nîşan dike. Binyada besit ya wendabûna tevahî bi kêmasîya kopîya ronomînal ya agentê di eslê xwe de ji bo bûna cînava kilitîk lê ne ji bo lêkerê wekî cîyê ahengê di dema borîya gerguhêz de nîqaşekê derdixe. Ji ber wendabûna rewşê, wekî refleksek bendewarîyê ya binyada nenîşankirî li Silêmanîyeyê dê bibûya rêza du ravekên navdêrî bê nîşankirina rewşê û lêkerê bê şexs-û-hejmarê. Ji bo mirov van encaman muhakeme bike, ev binyad ji bo binyadek bicî baş naxuye û kin û kurmancî ev form nema. Ji bilî wendabûna binyada nenîşankirî ya borîya gerguhêz û rewşên wekî kategoriya morfolojik, înovasyona herî girîng ku li Silêmanîyeyê wenda bûye binyada ergatîvîyê ye¹⁴. Wekî ku me

13 Ji bo vegera vê şîroveyê, Benveniste (1952) Cardona bibînin (1970)

14 N.J. Sims-Williams dibêje ku wendabûna ergatîvîyê di Kurdî de mihtemel e ku girêdayî

dît, ev ji ber wendabûna qedînên 'ergatîvîyê' di dema borîya gerguhêz de ye. Ev jî dibe sedema pêvçêrandina agent û kirdeya ruxsarî. Ji bo ku Silêmanîye di heman demê de xwedîyê mîqdareke baş ya morfolojîya lêkerê di rewşa ewil de ku ev jî hêj jî ergatîvî ye, ji nû ve çêbûna asta sintektî bû sedema têkiliyeke pir kompleks di navbera morfolojî û sentaksê de.

Di dawîyê de, naskirina kirdeya locikî bi agentê re divê di heman demê de jî şîrovekirineke nû ya cînavan, di binyadên wek hevokên (16'b), (18'b) û (20'b)yê de, wek nîşankerên şexs-û-hejmarê yên koma Byê berpîrsiyar be. Lewma, digel vê rastîyê ku ev herf, bi awayekî dîrokî qedînên lêkera ahenga ergatîvîyeyê nîşan dikin jî, şîroveya endamên koma Cyê wekî kopîyên mecbûrî yên agentê divê bi endamên koma Byê re statuya kirdeya locikî wenda bike, loma tekane rola ku dilîze ew e ku objeyê temsîl dike û ev jî hem lojîkî hem jî ruxsarî ye. Wek encam, qedînên lêkerî yên kevin (qet nebe di vê binyadê de) bûne cînavk, herweha pozîsyona xwe ya bi şêweya qertafên lêkeran parastine, lewma jî valahiya di navbera forma morfolojîk û fonksiyona sintektîk de zêde bûye.

Referans

- Allen, W. S. 1950-1. 'A study in the analysis of Hindi sentence-structure', *Acta Linguistica*, vi, 68-86.
- Allen, W. S. 1964. 'Transitivity and possession', *Language*, XL, 337-43.
- Anderson, S. R. 1976. 'On the notion of subject in ergative languages' in C. N. Li (ed.), *Subject and topic*. New York: Academic Press, 1-23.
- Bedir Khan, Emir Djeladet and Lescot, R. 1970. *Grammaire kurde (dialecte kurmandji)* (Librairie d'Amérique et d'Orient). Paris: Adrien Maisonneuve.
- Benveniste, E. 1952. 'La construction passive du parfait transitif', *BSLP* XLVII 52-62.
- Blau, Joyce. 1975. *Le kurde de 'Amadiya et de Djabal Sindjar*. Paris: Librairie C. Klincksieck.
- Cardona G. 1970. 'The Indo-Iranian construction mana (mama) krtamn' *Language* XLVI, 1-12.
- Comrie, B. 1976. *Ergativity*. Typescript.
- Edmonds, C. J. 1955. 'Prepositions and personal affixes in southern Kurdish', *BSOAS*, xvII, 3, 490-502.
- Henning, W. 1933. 'Das Verbum des Mittelpersischen der Turfanfragmente', *ZII*, ix, 158-253.
- Lehmann, W. P. 1976. 'From topic to subject in Indo-European' in C. N. Li (ed.), *Subject*

girêdana wendabûna sîstema du-rewşan (two-case system) e. Ez deyndarê wî me ji bo vê şîroveyê û yên din, ji bilî ku bala min kişandiye li ser gotarên Comrie û Tegeyî.

- and topic. New York: Academic Press, 445-6.
- MacKenzie, D. N. 1961. *Kurdish dialect studies*, I. London: Oxford University Press.
- Mann, O. 1906-9. *Die Mundart der Mukri-Kurden*. Berlin: Georg Reimer.
- Morgenstierne, G. 1958. 'Neu-iranische Sprachen' in *Handbuch der Orientalistik*, 1. Abt., Band IV, 1. Abschnitt. Leiden: E. J. Brill, 155-221.
- Schmidt, K. H. 1963. 'Zum Agens beim Passiv', *IF*, LXVIII, 1-12.
- Schmidt, K. H. 1973. 'Transitiv und Intransitiv' in G. Redard (ed.), *Indogermanische und allgemeine Sprachwissenschaft: Akten der IV. Fachtagung der Indogermanischen Gesellschaft*. Wiesbaden: Dr. Ludwig Reichert Verlag, 107-24.
- Schmidt, K. H. 1977. 'Probleme der Ergativkonstruktion', *Mitnchner Studien zur Sprachwissenschaft*, xxxvi, 97-116.
- Tegey, H. 1978. 'Ergativity in Pashto', *Pashto Quarterly*, I, 3, 3-88.
- Wagner, H. 1978. 'The typological background of the ergative construction', *Proceedings of the Royal Irish Academy*, LXXVIII, C, 3, 37-74. 14

DOKUMENTEK / A DOCUMENT

Çend Dokument ji Serdema Mîrektiya Melkîşî

A Few Documents from the Period of the Malkishi Emirate

Yusuf BALUKEN*

PUXTE:

Mîrektiya Melkîşiyî li derûdora Çarsancaqa Dêrsimê ku ji Çemişgezek, Mazgirt, Pertek û Saxmanê pêk dihat desthilatdarî kiriye. Desthilatdariya wan di sedsala XIV'an de dest bi kiriye û heta bi serdema Osmaniyan dewam kiriye. Mîrê pêşî yê vê malbatê ku çavkanî behs dikin Xalid el-Melkîşî el-Kurdî ye. Di vê nivîsarê de nivîsteka Medreseya Yelmaniye ku ji hêla nêviyê Xalid Beg Yelman Beg hatiye ava kirin; tirbên du mîrên Melkîşiyî û çend diravên ku ji hêla mîrên Melkîşiyî ve li Çemişgezekê li ser navê deshilatdarên serdemên xwe hatine çapkirin tên pêşkêşkirin. Di dawiyê de jî şecereya mîrên Melkîşiyî heta serdema Osmaniyan hatiye çêkirin.

ABSTRACT:

The Malkishi Emirate ruled around the Charsancaq region of Dersim, which consists of Chamishgazak, Mazgirt, Pertek and Saghman. They ruled from the XVI century to the Ottoman Period. The first *mir* of this family is Khalid al-Malkishi al-Kurdi as the sources mention. This article speaks about the inscription of the Yalmaniya Madrasa, which was built by the nephew of Khalid Beg, Yalman Beg; and the tombs of two *mirs* of Malkishi and some coins that were printed in Chamishgazak by the *mirs* of Malkishi in the name of the rulers of that period. Finally the family tree of the *mirs* of Malkishi until the Ottoman Period is drawn.

*Dr., Lêkolînerê Serbixwe,
Turkey/
Independent Scholar, Türkiye.
e-mail:
yusufbaluken@gmail.com

1. NAVLÊKIRINA MELKÎŞIYAN

Şerefxanê Bedlîsiyê nemir di Şerefnameya xwe de dibêje li gor gotina mîrên Çemişgezekê nesebê wan digihîje mirovekî bi navê Melkîş. Melkîş yek ji nêviyên xelifeyên Ebasiyan e. Li gor gotina hin mezinên din yê vê malbatê, nesebe Melkîşiyên digihîje mirovekî bi navê Melikşah ku ji malbata Saltuqiyên bû û ev nav di devê Kurdan de guheriyê û bûye Melkîş. Li gor Şerefxan navên mîrên Çemişgezekê jî nîşan didin ku ew zar û nêviyê Tirkên in û ev navên bi vî şeklî tu eleqeya wan bi yên ereban û Kurdan nîne. Şerefxan (1860: 162-3) paşê wiha dibêje: “*Tê gotin ku bi navê Melkîş yek ji nêviyên Melkîşê pêşî komeke mezin li derûdora xwe civand, sih û du keleh û şanzdeh navçe jî xistin bin desthilatdariya xwe. Ji vê eşîrê re eşîra Melkîşiyên digotin. Eşîreke pir mezin bû û ji sê beşan pêk dihat. Piştî ku Melkîş sih û du keleh û şanzdeh navçe bi dest xist, bi dorê kur û nêviyên wî keleh û navçeyên Çemişgezekê îdare kirin. Di serdemên awarte de jî wek serdemên Cengîz Xan, Emîr Teymurê Guregan, Şahrux Mîrza û Mîrza Qere Yusifê Tirkmen de jî ev welat ji dest wan derneket. Di serdema Sefewiyên de jî nav wan hezar xane rabûn ve qetiyên û ketin bin xizmeta siltanên Îranê.*”

Navê Melkîş bi şeklê Melkîşo ملكيشو di serdema Eyûbiyan de hatiye bikaranîn (Tewfîq, 2007: 162-3). Mîrê pêşiyê ku ji vê mîrektiyê tê zanîn Xalid el-Melkîşî el-Kurdî خالد الملكيشي الكردي ye ku bi navê Celal, Mehmûd û Ehmed sê lawên wî hebûn (Îbnu Nazirî'l-Ceyş, 1987: 76; Qelqêşendî, 1915: 288). Lêbelê li gor dokumenteke ku ji hêla Şîhabedîn el-Safedî hatiye nivîsîn piştî Husamedîn kurê Xarbende kurekî din yê Xalid el-Melkîşî bi navê علاء الدين علي بن خالد الملكيشي Alaedîn Elî kurê Xalid el-Melkîşî li Xartpêrtê revebir bû (Îbnu Nazirî'l-Ceyş, 1987: 72). Ji van malûmatan em fêhm dikin ku navê Melkîşî tu eleqeya xwe bi Melikşah tune. Navê Melkîş berê jî di nav Kurdan berbelav bû. Wekî eşîr û mîrektiyên din yên Kurdan navlêkirin li ser bavê xwe kirine.

2. DIRAVÊN YELMAN BEG

Şerefxanê Bedlîsî (1860: 162-3) mîrê pêşî yê vê malabatê wek Yelman Beg pêşkêş dike. Li gor çavkaniyên Memlûkiyan mîrê Çemişgezekê Yelman beg bi leqabên *Hakimu Çemişgezak* û *Sahibu Çemişgezak* dihat nasîn (Qelqêşendî, 1987: 227-232). Li Çemişgezek û derûdora wê bi navên *Emîr Yelman* û *Yelman Bahadır* navdar bû (Yücel, 1971: 694-5; Ferîdûn Beg, 1274/1858, 134). Di sala 1389an de di navbeyna mîrê Ezirgan Mutahharten û Qereyolûk Usmanê Aqqoyunî de qasidî kir (Esterabadî, 1928: 369). Wexta Teymur Xanê Leng dijberî Yıldırım Bayezîdê Osmanî hatibû welatê Ezirganê, mîrê Ezirganê Mutahharten bû tabiyê wî (Tîmûr) û piştê jî xutbeya roja îne li ser navê wî da xwendin û diravên ziv li ser navê da çapkirin. Di şerê dijberî hukimdarê Osmanîyan Yıldırım Bayezîd de Mutahher-

ten û Emîr Yelman alikariya Teymur kirin (Esterabadî, 1928: 456). Yelman Begê Melkîşî jî wekî Mutahharten desthilatdariya Teymur qebûl kir û diravên zîv li ser navê Teymur da çapkirin (Teoman & Olcaş, 2008: 16-8; Kalan, 2016: 615-8).

Wexta ku em dinêrin li ser van diravan navê Yelman Beg tune. Ev jî tê wateya ku Yelman Beg wek nûnerê Teymur Leng derûdora Çemişgezekê îdare kiriye. Weku Şerefxanê Bedlîsî jî behs kiriye hin mîrên Kurdan dirav li ser navê hukimdarên hevçax didan çapkirin. Ji vî diravê nimûneyên din di koleksiyonên Kamil Eron bi jimara 3023 (Öztürk & Perk, 2011: 31) û Şevkullah Bal de jî hene.¹ Piştî Yelman Beg lawê wî Şeyx Hesênê Kurd jî li ser navê hukimdarê çaxê xwe dirav daye çapkirin.

DOKUMENT I: DIRAVÊN YELMAN BEG/THE COINS OF YALMAN BEG

DIRAV/COINS I

Wêne/Photo:



Rûyê Rastê/The Right Side

Deşîfrasyon:

لا إله إلا الله محمد رسول الله

أبو بكر عمر عثمان علي

Werger:

Ji bilî Ellah tu Xweda nînin. Muhemmed qasidê Xwedê ye. Ebubekir Umer Usman Elî.

Translation:

There is no God but Allah. Muhammed is the messenger of God. Ebubekir Umer Usman Elî.

¹ <http://www.balcoins.com/index.php>, jimara envanterê 1288.

Rûyê Çepê/The Left Side

Deŕifrasyon:

سلطان محمود خان تیمور کورکان

چمشکرک ضرب

Werger:

Siltan Mehmûd Xan Teymûrê Guregan li Çemişgezêkê çap bû.

Translation:

Sultan Mahmud Khan Timur Guragan, was minted in Chamishgazak.



Rûyê Rastê/The right side

Deŕifrasyon:

لا إله إلا الله محمد رسول الله

أبو بكر عمر عثمان علي

Werger:

Ji bilî Ellah tu Xweda nînin. Muhemmed qasidê Xwedê ye. Ebubekir Umer Usman Elî.

Translation:

There is no God but Allah. Muhammed is the messenger of God. Abubakr Umar Uthman Ali.

Rûyê Çepê/The Left Side

Deŕifrasyon:

سلطان محمود خان تیمور کورکان

ضرب چمشکرک

Werger:

Siltan Mehmûd Xan Teymûrê Guregan li Çemişgezekê çap bû.

Translation:

Sultan Mahmud Khan Timur Guragan, was minted in Chamishgazak.

3. MEDRESEYA YELMANIYE

Ev medrese ji hêla Yelman Beg li Çemişgezekê di sala 804/1401ê de hatiye avakirin. Herçiqas îro bi navê “Yelmaniye Camii” tê zanîn ji di serî de wek medrese hatiye avakirin (Eser, 1995; Îlter, 1973: 91-107; Sözen, 1971: 29-47). Beriya vê medreseyê “Medreseya Seyfiyye” ku ji hêla mîrê Botan Seyfeddîn Îsa ve li Cizîra Botan hatibû avakirin kevntirîn medreseya mîrên Kurdan e. Lê ji vê medreseyê tenê mihrab û bingeh mane û niha di keleha navîn ya Cizîra Botan de ye. Piştî Medreseya Seyfiyye medreseya mîran a herî kevn Medreseya Yelman Beg e. Ev medrese heta îro li ser piyan maye û niha wek mizgeft tê bikaranîn. Nivîsteka ku li ser deriyê vê medreseyê ye bi piranî hatiye parastin. Beşên ku tenê xwendin wiha ne:²

**DOKUMENT II: NIVÎSTEKA MEDRESEYA YELMANIYE/
THE INSCRIPTION OF YALMANIYA MADRASAH**

Wêne/Photo:**Deşîfrasyon:**

أمر بعمارة المدرسة المباركة الملك العادل تاج الدين يلمان بن كيقباد بن خالد الكردي في أيام تيمور خان ما وراء النهر خلد الله دولتهما..... في شهر المحرم الحرام سنة أربع وثمانائة

2 Ev nivîstek ji hêla Erdal Eser ve bi dîroka 806 hatiye xwendin. Bnr. Erdal Eser “ A Timurid Inscription in Anatolia”, *Art Turc/Turkish Art 10 Congrès International d’art Turc Genève*, Fondation Max van Berchem, Genève 1999, rp. 305-315.

Werger:

Melik Adil Taceddîn Yelman kurê Keyqubad kurê Xalidê Kurdî di serdema Teymûr Xanê Maweraunnehr de, Xweda dewleta her duyan daîm ke, di meha Muherrema pîroz di sala 804 (Tebax/Îlon 1401) de avakirina vê medreseya mubarek ferman kir.

Translation:

Al-Malik al-Adil Taj al-Din Yalman, son of Kaiqubad of Khalid al-Kurdi in the Period of Timur Khan of Mawaraannahr, May the state of both live forever, in the month of holy Muharram in the year 804 (August/September 1401) ordered this blessed madrasa to be built.

4. ŞEYX HESEN BEGÊ KURD

Yelman Beg piştî Teymurê Leng demeke kurt di bin siya dewleta Qereqoyunîyan de mîrekiya xwe berdewam kiriye. Piştî Yelman Beg lawê wî ê mezin Pîr Huseyn ketiye şûna bavê xwe. Birayê wî Şeyx Hesên Kurd li dijî wî bi Qereqoyunîyan re li hev kir û dest da ser mîrekiya Melkîşîyan. Lê piştî hukimdarê Aqqoyunîyan Qere Yûlûk Osman (1403-1435) bajarê Çemişgezekê ji destê Şeyx Hesên Kurd derxist û da waliyê xwe Nûr Elî Beg. Şeyx Hesên Kurd jî reviya û derket ser çiyayê Munzurê. Di sala 825/1422yan de Şeyx Hesên Kurd bû tabiyê Îskenderê Qereqoyunî. Hêviya wî ew bû ku bi piştgiriya wî welatê xwe ji destê Aqqoyunîyan derxe. Lê ji vê tifaqê encamek dernehat. Piştî Şeyx Hesên Kurd berê xwe da Keleha Gêlê û çû bal Dolatşah Begê Kurdê Mirdasî. Ji ber ku navbeyna wî û Qereqoyunîyan baş bû, Dolatşah Begê Mirdasî xwedî lê derket (Tihranî, 2001: 67-71). Lê demek şûnda ev herêma kete destê Memlûkiyan. Di vê serdemê de Çemişgezek bajarekî xweşik bû. Di navenda bajarî de kelehek û li derudora bajar jî sûrek hebû. Bi vî bajarî ve 24 keleh û gelek gund girêdayî bûn. Ev bajar tevî bajarên din yê Diyarbekirê yê wek Erebgîr û Xarpêtê di sala 836an (1433) de ji hêla hukimdarê Memlûkiyan Melik Eşref Barsbay ve hat bidestxistin û bi bajarê Helebê ve hat girêdan (ez-Zahirî, 1894: 52).

Di vê serdemê de mîrê Melkîşîyan dîsa Şeyx Hesên Kurd bû. Şeyx Hesên demêke dirêj dirav li ser navê Memlûkiyan dan çap kirin. Bo nimûne Şeyx Hesên Kurd diravê jêrîn li ser navê hukimdarê Memlûkiyan Melik Zahir Çaqmaq (842-857/1438-1453), di sala 852/1449ê de li Çemişgezekê da çapkirin.³

3 <https://www.zeno.ru/showphoto.php?photo=173902>; <https://www.numisbids.com/n.php?p=lot&sid=2009&lot=412>

DOKUMENT III: DIRAVÊN ŞEYX HESEN BEGÊ KURD/THE COINS OF SHEIKH HASAN BEG KURD

Wêne/Photo:



Deşîfrasyon:

السلطان الملك الظاهر جقمق خلد ملكه

ضرب جمشكرك سنة ٨٥٢

Werger:

Siltan Melîk Zahir Çeqmeq milkê wî daîm be. Di sala 852yan de li Çemişgezekê çap bû.

Translation:

Sultan Malik Zahir Chaqmaq, may his property live forever. It was minted in the year 852 in Chamishgazak.

Rûyê Çepê/The Left Side

Deşîfrasyon:

لا إله إلا الله محمد رسول الله

أبو بكر عمر عثمان علي

Werger: Ji bilî Ellah tu Xweda nînin. Ebubekir Umer Usman Elî.

Translation: There is no God but Allah. Abubakr Umar Uthman Ali.

Şeyx Hesênê Kurd heta sala 865/1461ê li Çemişgezekê mîrektî kir. Di vê salê de wek qasidê Uzun Hesênê Aqqoyunî çû Trabzonê cem siltanê Osmaniyan Fatih Siltan Mehmed (Neşrî, 2008: 332-333). Wefata wî kengê ye em nizanin, lê piştî wî kurê wî Sohrab Beg ket şûna bavê xwe (Bedlîsî, 1860: 164). Sohrab Begê kurê Şeyx Hesênê Kurd di serdema hukimdarê Aqqoyuniyan ê navdar Uzun Hesên (1453-1478) de bi eşîreta xwe tevî artêşa Tirkmenan bû. Di sala 871/1467an de li

diji Qereqoyuniyan wek mîrê Çemişgezêkê tevî artêşa Aqqoyuniyan bû (Tihranî, 2001: 229). Di sala 1478an jî tevî artêşa Xelîl Bahadirê Aqqoyunî (1478-1479) bû (Îsfehânî, 1987: 151). Sohrab Beg qîza xwe dabû Xelîl Bahadir û bûbûn merivê hev (Dewwanî, 1335: 50-1). Piştî Sohrab Beg kurê wî Hecî Rustem Beg bû mîrê Melkîşiyân. Di serdema wî de mîrektiya Melkîşiyân tevî Osmaniyân bû (Bedlîsî, 1860: 164-6; Barbaro & Contarini, 1973: 299 û 326).

5. TIRBA FERRUXŞAD BEG

Muhammedî Beg kurê herî mezin yê Pîr Huseyn Beg û birayê Ferruxşad Beg bû. Di serdema siltanê Osmaniyân Qanunî Silêman de li Mazgirtê mîrekti dikir. Salekê mîrekti kiriye, piştê çûye rehmêtê. Çar kurên wî hebûn, lêbelê wê çaxê her çar jî hê zarok bûn. Lewra siltanê Osmanî Qanunî Silêman mîrektiya Mazgirtê da birayê wî Ferruxşad Beg. Çend sal şûnde birayên wî ji ber hesûdiyê giliyê wî li bal padişahê Osmaniyân kir û gotin malê padişah dixwe. Qanunî jî ferman derxist û Ferruxşad Beg da kuştin (Bedlîsî, 1860: 169). Tirba Ferruxşad Beg li wîlayeta Dêrsimê li navçeya Çemişgezêkê li gundê Ulukale ye (Sözen, 1973: 169). Nivîsteka vê tirbê ku nêzî bîst salî ye wînda bû, di van rojên dawî de hat dîtin.⁴



Ji der ve tirba Ferruxşad Beg

4 <http://www.arkeolojikhaber.com/haber-tuncelide-20-yildir-aranan-kayip-kitabe-tesadufen-bulundu-5119/>

DOKUMENT IV: NIVÎSTEKA TIRBA FERRUXŞAD BEG/ THE INSCRIPTION OF FARRUKHSHAD BEG TOMB

Wêne/Photo:



Deşifrasyon:

(.....)

هذا مرقد الأمير المكرم صاحب الطبل والعلم الأمير فرخشاد بيك
بن الأمير المرحوم المغفور حسين بيك بن الأمير حاج رستم بيك
طاب ثراهم وجعل الجنة مثواهم في شهر ذي الحجة سنة ٩٥٧

Werger:

(.....)

Ev gor ya mîrê hêja xwedyê dehul û alê Mîr Ferruxşad Beg
kurê mîrê rehmetî û xefirandî Huseyn Beg kurê Mîr Hecî Rustem Beg
Axa wan pîroz be û şunwarê wan bihuşt be. Di meha Zilhicce di sala 957ê de
(1551).

Translation:

(.....)

This tomb belongs to the owner of the state and flag, Mir Farrukhshad Beg,
son of the late and forgiven Huseyn Beg of Mir Haji Rustem Beg.
May their soil be holy and their place be heaven. In the month Zilhicce and the
year 957 (1551).

6. TIRBA KU NÎSBETÎ UZUN HESEN DIBE

Li Çemişgezekê tirbeke din heye ku nisbetê Uzun Hesenê Aqqoyunî bûyê. Li gor nivîsteka ku li ser deriyê vê tirbê ye, tirb ji hêla du birayên ji malbata Melkîşiyî ve hatiye avakirin. Bavê wan Muhemmedî Beg û kalê wan Behlûl Beg di Şerefnameyê de derbas dibin (Bedlîsî, 1860: 175). Dibe ku ev tirb ya Şeyx Hesenê Kurd be û nêviyên wî Mihmanşah û Cihanşah li ser navê kalên xwe yê kevn tirbek dabin çêkirin.



DOKUMENT V: NIVÎSTEKA TIRBA UZUN HESEN/ THE INSCRIPTION OF UZUN HASAN TOMB

Wêne/Photo:



Deşîfrasyon:

أمر بعمارة هذه روضة الشريف المرحومان المغفوران مهمان شاه بك

وجهان شاه بك ابنا محمدي بك بن بجلول بك بن حسين الملكيشي في سنة ٩٨٠

Werger:


Hêjayên rehmetî û xefirandî Mihmanşah Beg û Cihanşah Beg du kurên Muhammedî Beg kurê Behlûl Beg kurê Huseynê Melkîşî di sala 980 (1572) de avakirina vî baxê pîroz ferman kirin.

Translation:

The late and forgiven Mihmanshah Beg and Cihanshah Beg, two sons of Muhammadî Beg of Bahlul Beg of Husayin Malkishi in the year 980 (1572) ordered this holy garden to be built.

7. ŞECEREYA MÎRÊN MELKÎŞIYAN

Şecereya mîrên Melkîşiyân heta bi serdema Osmaniyan weha ye:



ÇAVKANÎ

Barbaro, G. & Contarini A. (1973), *I Viaggi in Persia degli ambasciatori veneti Barbaro e Contarini Istituto poligrafico dello Stato*, Libreria, pp. 299-326.

Bedlîsî, Ş. (1860), *Şerefname*, (c. I.), V. Veliaminof Zernof (weş), St. Petersburg.

Dewwanî, C. (1335), "Arz-i Sipah-i Uzun Hesen", weş. Îrec Efqar, *Kovara Danişgedê-i Edebiyat Danişgehê Tehran*, sal 3, jimar 3, Ferwerdîn.

- Eser, E. (1999), “ A Timurid Inscription in Anatolia”, *Art Turc/Turkish Art 10 Congr s International d'art Turc Gen ve*, Foundation Max van Berchem, Gen ve.
- Eser, E. (1995), *Tunceli İli  emiŐgezek İl esi Yelmaniye Camii (Medrese Camii)*, (teza l sansa bilind a ne apkirii),
- Esterabad , Ez z bin ErdeŐir (1928), *Bezm   Rezm*, weŐ. Kilisli Muallim Rifat, Stenbol.
- ez-Zahir , Xersudd n Xel l bin Őah n (1894), *Zubdetu KeŐfi'l-Memalik ve Beyani't-Turuq ve'l-Mesalik*, weŐ. Paul Ravaisse, Paris.
- Isfehani , Fazlullah bin R zbihan  Xunci (1987), *Tar x-i Alem-Ara-yi Emin *, weŐ. Muhammed Ekber AŐiq, Tahran
-  bnu Naziri'l-CeyŐ, *Tesq fu't-Te'rif bi'l-MustalahiŐ-Őerif*, weŐ. Rudolf Vesely, Qahire.
- İlter, F. (1973), “DoĒu Anadolu'da Timur Devrinden Bir Yapı Yelmaniye Medresesi”, *Kovara Anadolu (Anatolia)*, jimar XVII. Ankara.
- Kalan, M. (2016), “Ankara SavaŐı  ncesi-Sonrasında Emir Timur'dan Geriye Kalan N mismatik Materyaller”, *B t n Y nleriyle  ubuk ve  evresi Sempozyumu 9-10 Ekim 2015,  ubuk-Ankara*, Temmuz, Ankara.
- NeŐri, M. M. (2008), *Cihann ma*, weŐ. Necdet  zt rk, Stenbol.
-  zt rk, H. & Perk, H. (2011), *Anadolu Beylikleri ve Sikkeleri*, Ankara.
- QelqeŐendi (1915), *Subhu'l-EŐa fi Sina'ati'l-İnŐa*, Qahire, c. VII.
- QelqeŐendi (1987), *Subhu'l-EŐa fi Sina'ati'l-İnŐa*, Yusuf Eli Tawil (weŐ.), Beyrut, c. VIII*
- S zen, M. (1973), “ emiŐgezek'in Ulukale K y ndeki Mimari Eserler”, *Sanat Tarihi YıllıĒı*, İstanbul, V.
- S zen, M. (1971), “ emiŐgezek'te T rk Eserleri ve Yelmaniye Camisi”, *Sanat Tarihi YıllıĒı*, Stenbol, c. IV.
- Teoman, G. & Erol O. (2008), “D rt Adet Nadir Sikke”, *II. Uluslararası N mismatik Sempozyumu, İstanbul: T rk N mismatik DerneĒi*, rp. 16-18, jimara dirav  1
- Tewfiq, Zırar Siddiq (2007), *el-Qabail we'z-Zeamati'l-Kurdiyyeti'l-Qibeliyyeti'l-Kurdiyye fi'l-Asri'l-Wasit*, Erbil.
- Tihrani , E. (2001), *Kitab-ı Diyarbekriyye*, wer. M rsel  zt rk, Ankara.
- Y cel, Y. (1971), “XIV-XV. Y zyıllar T rkiye Tarihi Hakkında AraŐtırmalar I: Mutahhar-ten ve Erzincan EmirliĒi”, *kovara Belleten*, jimar XXXV/140 sal 1971, rp. 694-695; Ferid n Beg, *Mecm 'a-i MunŐeatiŐ-Selat n*, Stenbol 1274/1858.
- <https://www.zeno.ru/showphoto.php?photo=173902>; <https://www.numisbids.com/n.php?p=lot&sid=2009&lot=412>
- <http://www.arkeolojikhaber.com/haber-tuncelide-20-yildir-aranan-kayip-kitabeta-sadufen-bulundu-5119/>
- <http://www.balcoins.com/index.php>, jimara envanter  1288.

DERBAREYÊ KOVARA NÛBIHAR AKADEMIYÊ DE

Kovara Nûbihar Akademî kovareke bihekem, akademîk û navneteweyî ye ku dê weşana gotarên kêrhatî yên di qada Kurdolojiyê de bike. Kovara Nûbihar Akademî, bi rêbazeke akademîk dê cih bide her cure nivîsên zanistî û bi nêrîneke multidisiplînerî dê nivîsên li ser zanistên ziman, edebiyat, çand, huner, aborî, civakî, olî û hwd. di nava xwe de bihewîne. Di kovarê de dê nivîsên mîna gotar, werger, tîpguhêzî, danasîna sempozyum, pirtûk û tezan biweşin. Gotarên ku ji bo weşandinê bîn şandin dê bi sistema “hekemtiya kor” ku dê ji hêla hekemên pispor ên ku navên wan dê bîn weşartin ve bîn nixandî. Kovara Nûbihar Akademî dê di demsalên bihar û payîzê de salê du caran bê weşandin. Zimanê weşanê Kurdî (bi hemû zaravayên xwe ve) û Îngilizî ye.

Nirxandina Gotaran

1. Lêkolîna ewilîn ji aliyê lijneya weşanê / edîtoriyê ve tê kirin. Gotarên ku ji aliyê ruxsarî û naverokî ve ne li gorî rêzîknameyê hatibin nivîsandin, bi armanca ku bîn rastkirin li nivîskaran tîn vegerandin. Piştî vê merheleyê gotarên ku guncaw in (dema werger bin digel orjînalên wan) ji sê hekeman re tîn şandin. Biryara weşandina gotarên ku ji kovarê re tîn şandin li gorî nixandînen van hekeman tê dayîn. Eger bi kêmasî du rapor erênî bin, wê demê gotar tê weşandin. Dema ku hekeman sererastkirin xwestin û pêşniyazên xwe vegotin, gotar demildest ji nivîskaran re tê şandin û ji wan li gor nêrînen hekeman daxwaza pêşxistin û guherandina gotaran tê kirin. Gotarên ku ji bo sererastkirinê ji hekeman re tîn şandin divê herî dereng di nava mehekê de dîsa ji kovarê re bîn şandin. Heger di dema sînorkirî de guherîn û sererastkirin nehatibin çêkirin û şandin, biryardayîna weşanê wê demê di destê lijneyê de ye. Di rewşa nelihevkirina di navbera hekem û nivîskaran de, biryara weşandina gotarê ya lijneya weşanê (edîtoriyê) ye. Gotarên sererastkirî di halên pêwîst de ji aliyê hekeman ve dîsa tîn kontrolkirin.

2. Nameya ji bo pejirandin yan nepejirandina gotarê tevî raporên hekeman ji nivîskaran re tîn şandin. Ev bi rîya postê, yan mailên elektronîk dibe. Ji dema teslîmkirina nivîsê bigire heya derketina du jimarên kovarê ku gotar nehatibe weşandin, derbarê vê yekê de dê bo nivîskaran agahî bê dayîn. Gotarên ku hatine şandin biweşe jî neweşe jî li nivîskarê wê nayên vegerandin.

3. Berpirsê naveroka gotaran nivîskar bi xwe ye. Gotarên ku ji bo weşanê tîn pejirandin, heqê weşana wan yê kovarê ye.

4. Bi şertê ku navê kovarê bê gotin, gotar û xebatên dîtbarî yên di kovarê de weşiyane dikarin bîn wergirtin.

Esasên Rastnivîs û Weşana Kovara Nûbihar Akademiyê

1. Divê nivîsên ku bîne şandin berê li cihekî dî nehatibin weşandin, an jî ji bo weşanê divê di asta nîrxandinê de nebin. Heger gotar berê di kongreyek, sempozyûmek an jî civînekê de hatibe pêşkêşkirin, bi şertê eşkerekirina dem û cihê wê û guncawdîtina lijneya weşanê dikare bê weşandin. Di vê babetê de hemû berpirsiyarî ya nivîskar e.

2. Divê gotar bi tevahiya metnê, serbend, nişê û referansên xwe ve tenê di rûyekî rûpelekî A4ê de bi karakterê Times New Roman û 12 pûntoyê bin û valahiya di navbera rêzan de 1, 5 înk be. Valahiya kêlekên rûpelan divê ji bo çep û rastê 4, 5; ji bo jor û jêrê jî 3 santîmetre be. Wekî dî divê li koşeya rastê ya di binê rûpelê de jî jimara rûpelê bê nivîsandin. Gotar bi nişê û referansên xwe ve divê ji 30 rûpelî derbas nebe û heger hebe digel tablo, şikil û xêzan bê teslîmkirin. Divê ji bo şikil, wêne, grafîk û xêzan jimar bîne dayîn û dema cihê wê hat jimareyên wan bîn diyarkirin û sernavên wan li jêrê wan, heger ku ji cihekî din hatibe neqîlkin divê jêderka wan bê nivîsandin. Divê jêderk û referans di nava gotarê de (li gorî sîstema APAyê) bîn nivîsandin. Agahiyên berfireh ên jêderkan dê di dawîya gotarê de bê nivîsandin û heger rewşeke awarte hebe dikare di jêrenotê de jî bê nişandan.

3. Divê gotar ji bo ku karê rûpelsazî û çapê bi awayekî zûtir bê meşandin di dosyeya Microsoft Wordê de bîn nivîsandin û ji e-maila kovara Nûbihar Akademiyê re bîn şandin. Gotarên ku bi destan hatine nivîsîn dê neyên nîrxandin.

4. Di gotarên ku dê bîne şandin de divê ev rêz bê şopandin: Sernavê gotarê, navê nivîskar, puxte (abstract), deqê gotarê, referans û kurte (Extended Abstract)

Sernav divê bi her du zimanan (Kurdî-Îngilîzî yan jî Îngilîzî-Kurdî) bê nivîsandin. Divê sernav ji 14 kelîmeyan ne zêdetir be û herfên pêşî yên kelîmeyên girdek bin.

Li binê sernavê divê navê nivîskar an jî nivîskaran cî bigre. Di jêrenotê de divê unvana akademîk, sazî, fakulte, beş, binbeş û navnişana elektronîk bîne dayîn.

Divê bi her du zimanan puxte bîne nivîsandin. Puxteya yekem bi zimanê ku gotar pê hatiye nivîsîn, puxteya duyem jî bi zimanê duyem dê bê nivîsandin. Puxteyên Kurdî di gotarên Kurdî de, dê bi diyalekta ku gotar pê hatiye nivîsandin û di gotarên Îngilîzî de dê bi diyalekteke ku nivîskar tercîh bike bîne nivîsandin. Puxte divê ji 120 kelîmeyan ne zêdetir be. Piştî her puxteyekê divê peyvên bîngêhî yên gotarê bîne nivîsandin.

Divê di deqê gotarê de teqez beşên Destpêk (Introduction) Encam (Conclusion) û Jêderan (References) bîne nivîsandin. Eger pêwîstî hebe divê beşên wekî Rêbaz (Method), Nişane (Results), Gengeşe (Discussion) jî hebin.

Kurte (Extended Abstract) di gotarên Kurdî tenê de bi Îngilîzî tê nivîsandin. Kurte divê ji 500 kelîmeyî ne kêmtir û ji 750 kelîmeyî ne zêdetir be. Divê kurte hemû hizr û ramanên gotarê di nava xwe de bihewîne. Kurte, bi şiklê paragrafan tê nivîsandin û tê de sernavên navxweyî (destpêk, rêbaz û hwd.) û jêgîrên wekxwe cih nagirin.

5. Nivîskar bi xwe ji rastî û nerastiya jêderkan berpirsiyar e. Jêderk mîna ku li jorê ji hatiye eşkerekirin divê di nava gotarê de bîn nivîsandin, heger nişe hebin divê di hundirê gotarê de bîn nimrekirin û li jêra gotarê li gor nimreya xwe bîn nivîsandin.

6. Di nameya serîlêdanê de divê bê ifadekirin ku gotar resen e û ji hêla nivîskar an ji nivîskaran ve hatiye xwendin, pesendkirin û bi tu awayî û tu cihî de nehatiye weşandin.

SERERASTKIRINA GOTARAN

Li nava welat û li dîyasporayê gelek pispor, akademîsyen û lêkolerên Kurd hene ku di qadên curbicur ên zanistên mirovayeti de xwe pêgihandine û di warên zanistî de kar dikin. Lê gelek ji van pisporan, ji ber mercên ku tê de pêgihîştine, nikarin gotarên xwe yên zanistî bi Kurdî binivîsin. Kovara Nûbihar Akademiyê bangewazî li kesên bi vî rengî dike ku ev kes gava yekem bavêjin û gotarên xwe bi Kurdî binivîsin. Dema ku gotarek bi Kurdî bê nivîsandin û ji bo sererastkirinê ji Nûbihar Akademiyê re bê şandin, ew gotar dê ji aliyê pisporan ve bê sererastkirin. Gotarên ku bîn şandin dê ji du aliyên ve bîn kontrolkirin û sererastkirin:

1. Sererastkirina Normal

Sererastkirina normal, ji aliyê rênivîsê ve tê kirin. Ev cure sererastkirin ji bo kesên ku Kurdiya wan a nivîskî û zanistî baş e, lê rênivîsa wan kêm e tê kirin.

2. Sererastkirina Pêşketî

Sererastkirina pêşketî, ji aliyê wate û jinûvesazkirina hevokan ve tê kirin. Ev cure sererastkirin ji bo kesên ku axaftina wan baş e, dikarin hizr û ramanên xwe derbasî nivîsê bikin, lê ji aliyê termînolojî û gramera Kurdî ve kêm in tê kirin.

Têbînî: Piştî ku karê sererastkirina gotarê qediya, êdî gotar ji hekeman re dê bê şandin. Xizmeta sererastkirina gotaran ji bo zaraveyên Kurmancî û Dimilî ye.

Ji bo sererastkirinê gotarên xwe bişînin vê mailê: nubiharakademi@gmail.com

ABOUT NÛBIHAR AKADEMÎ JOURNAL

Nûbihar Akademî is an international peer-reviewed academic journal that will be publishing articles in the field of Kurdology. *Nûbihar Akademî* journal covers with an academic style all kinds of scientific articles and accommodates with a multi-disciplinary approach writings in the fields of linguistics, literature, culture, art, economy, sociology, religion, etc. Works such as articles, translations, transcriptions, symposium papers, books and theses will be published in the journal. The articles that are submitted to be published will be evaluated by expert peer-reviewers whose names will not be disclosed. Nûbihar Akademî is published biannually in spring and autumn. Publication languages are both Kurdish (all dialects) and English.

Review Procedure for Articles

1. The first evaluation of the articles is done by the publication board. The articles that are not in line with regulations of the journal in terms of form and content are sent back to their authors to be corrected. In the next phase, the articles that are suitable (with original versions if they are translated from another language) are sent to three reviewers. The decision to publish the articles submitted to the journal is made according to critique of these reviewers. If at least two (out of three) referees decide that your manuscript can be published, then your study will be published (after a revision based on the suggestions). If the reviewers ask for corrections and make suggestions, the articles are immediately sent to their authors and are asked to make improvements and corrections to the articles according to suggestions of the reviewers. The articles sent for corrections must be resent to the journal at latest within a month. If requested corrections are not made and the articles are not resent to the journal before the deadline, the publication board has the authority (this time) to decide whether to publish the articles or not. In case of disagreement between the reviewers and the authors, the decision to publish the articles is taken by the publication board. The articles that have been corrected can be re-evaluated by the reviewers if necessary.

2. A letter about whether their articles are accepted or rejected along with copies of referee reports is sent to authors. This could be done via post or e-mail. Authors will be informed about the articles not published in the first two issues of the journal from the delivery date. Whether published or not, the submitted articles are never returned to authors.

3. Responsibility of opinions in the articles belongs to their authors. Publication rights of the articles approved to be published belong to the journal.

4. Articles and figures in the journal can be quoted on condition that the name of the journal is mentioned.

Writing and Publishing Guidelines of Nûbihar Akademi Journal

1. The articles submitted for publication must not have been published somewhere else before or be in reviewing process. If an article has been presented in a congress, symposium or another meeting, it can be published upon approval of the board of publication and on condition that the date and place of the presentation are stated. The responsibility in this respect belongs exclusively to the author.

2. Articles including whole text, indented paragraphs, notes and references must be written only on one face of an A4 paper with 12 font size in Times New Roman writing characters and with 1.5 line of writing space; 4.5 cm space on both sides of paper and 3 cm space on the top and bottom of paper. The article must bear page numbers on right bottom corner. Articles must not be more than 30 pages, including notes and references, and must be delivered with tables, figures and drawings if any. Figures, photographs, graphics and drawings must be numbered and in the text when it is necessary the numbers must be mentioned and their titles must be written on the below. If they are quoted from a different source, then their source must be stated. The source and references must be given within the text (according to APA 6th Edition style). Referencing information must be provided in detail at the end of article and if necessary references can be given in footnote.

3. Articles must be written in a Microsoft Word file for faster page-setting and publication, and sent to Nûbihar Akademi Journal e-mail address. Handwritten articles will not be reviewed.

4. Articles must be submitted in the following order: Title (capital letters), name of author or authors, abstract, the full text, references and (Extended abstract).

The titles of the articles need to be written in both languages (Kurdish-English or English-Kurdish). Titles cannot be written with more than 14 words. The first letter of each word in the title should be capital.

Under the title, names of authors will be presented and in the footnote their academic appellation, their affiliation, department, research area, and e-mail addresses will be indicated.

Abstracts must be written in both Kurdish and English. The first abstract will be provided in the language the article is written in and the second abstract will be in the second language. In Kurdish articles the Kurdish abstract needs to be provided in the dialect the article is written in, while in English articles the abstract can be written in any dialect the authors prefer. Abstracts must be written with less than 120 words. Key words should be defined below every abstract.

The articles must absolutely have “Introduction” and “Conclusion” parts. Meanwhile, the “referances” part must be placed, as well. References need to comply with the APA style instructions. In case of need, additionally parts such as “method”, “results” and “discussion” can be included.

Only in Kurdish articles, “(Extended abstract)”. part will be written in English. “Extended Summary” must be written in the range of 500 to 750 words and should not include subsections (e. g. Introduction, Method) and should reflect the basic ideas in the article in paragraphs. Quotation should not be included in the summary.

5. The author is responsible for the accurateness of references. As mentioned above, references must be given within the text. If there are any notes, they should be numbered within the text and placed at the bottom of the text by order of numbers.

6. It must be stated in the application letter that (a) the article is original, (b) it has been read and approved by author(s) and (c) it has not been published as a whole in any publication before.

Editing Articles (Proofreading)

In the homeland and diaspora, there are many Kurdish researchers, experts and academics who have developed themselves in various scientific fields. However, lots of them cannot write their scientific articles in Kurdish because of the conditions and circumstances which they have lived in. Nûbihar Akademi Journal invites them to take the initiative for writing their articles in Kurdish. Articles which have been written in Kurdish and sent to Nûbihar Akademi Journal will be examined, reviewed and edited by our experts. The submitted articles will be checked and edited in two aspects:

1. Normal Editing

Normal editing is a kind of making corrections in spelling. This sort of proofreading is for the authors whose Kurdish knowledge is good enough and acceptable academically but not in spelling.

2. Advanced Editing

Advanced editing is reconstituting sentences semantically. This kind of proofreading is for the authors whose speaking skill in Kurdish is good enough to transfer their thoughts into writing but their terminological and grammatical ability in the language is not adequate.

Note: After editing of articles is completed, the articles will be forwarded to referees. Proofreading works will be done only in Kurmanji and Zazaki dialects. Proofreading and editing articles is a paid work.

- To have your articles proofread by our referees, please send them to the following e-mail; nubiharakademi@gmail.com